T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ PROGRAMI

Ercan ABİ

# MUSA ANTER: HAYATI, ESERLERİ VE ETKİSİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2025

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ
BERNAMEYA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Ercan ABİ

# MUSA ANTER: JÎYAN, BERHEM Û BANDORA WÎ

TEZA LÎSANSA BILIND

ŞÊWIRMEND
Doç. Dr. Ayhan TEK

MÛŞ-2025

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ PROGRAMI**

**Ercan ABİ**

# MUSA ANTER: HAYATI, ESERLERİ VE ETKİSİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ JÜRİ ÜYELERİ**

**Tez Danışmanı : Doç. Dr. Ayhan TEK**

**Jüri Üyesi : Prof. Dr. Seyit Battal UĞURLU**

**Jüri Üyesi : Doç. Dr. Mehmet Emin PURÇAK**

**MUŞ-2025**

**NAVEROK**


**NAVEROK ... I**

**ÖZET ... IV**

**KURTE ... V**

**ABSTRACT ... VI**

**PÊŞGOTIN ... VII**

**LÎSTEYA TABLOYAN ... IX**

**DESTPÊK ... 1**

**BEŞA YEKEM**

**MUSA ANTER**

**1.1. JÎYANA MUSA ANTER (APÊ MUSA) ... 6**

**1.2. MALBATA MUSA ANTER ... 11**

**1.3. JÎYANA MUSA ANTER YA POLÎTÎK ... 13**

**1.4. ROJNAMEGERÎYA MUSA ANTER ... 15**

**1.5. NIVÎSKARÎYA MUSA ANTER ... 17**

**1.6. JÎYANA MUSA ANTER YA EDEBÎ ... 20**

**1.7. DI JÎYANA MUSA ANTER DE BÛYERÊN GIRÎNG ... 22**

1.7.1. Bûyerên ji Dema Dewleta Osmanî û Heta Sala 1938an ... 24

1.7.2. Bûyera 49an ... 29

1.7.3. Bûyera 23yan ... 32

**1.8. KUŞTINA MUSA ANTER ... 33**

**BEŞA DUYEM**

**BERHEMÊN WÎ**

**2.1. QIMIL - KIMIL ... 39**

**2.2. BIRÎNA REŞ-KARA YARA ... 41**

**2.3. FERHENGA KHURDÎ Û TIRKÎ (KÜRTÇE VE TÜRKÇE SÖZLÜĞÜ) ... 45**

**2.4. HATIRALARIM (BÎRANÊN MIN) ... 48**

**2.5. VAKAYINAME ... 50**

**2.6. FIRAT MARMARAYA AKAR/ ÜLKE VE GÜNDEM YAZILARI ... 52**

**2.7. ÇINARA MIN ... 54**

**2.8. PIRTÛKÊN MUSA ANTER YÊN KU ME BI DEST NEXISTÎNE ... 55**

2.8.1. Yarasalar (Bêçemkan) ... 56

2.8.2. Gramatîko Zimanê Khurdî (Kürt dil bilgisi) .... 57
2.8.3. 38 Nolu Hücre (Kunca 38an) .... 57
2.8.4. Wê Şevê Reş Bû .... 58
**2.9. MUSA ANTER Û ÇAPEMENÎ .... 59**
2.9.1. Dicle Kaynağı 1948 (Rojname) .... 60
2.9.2. Şark Mecmuası 1950 (Kovar) .... 63
2.9.3. Şark Postası 1952 (Rojname) .... 64
2.9.4. İleri Yurt 1958 (Rojname) .... 65
2.9.5. Mezopotamya 1959 (Kovar) .... 67
2.9.6. Barış Dünyası 1962 (Kovar) .... 68
2.9.7. Dicle-Fırat 1962-1963 (Rojname) .... 70
2.9.8. Deng (Doğunun Sesi) 1963 Kovar .... 73
2.9.9. Doğu Dergisi (Kovar) 1969 .... 75
2.9.10. Tewlo (Kovar)1992 .... 76
2.9.11. Yeni Ülke (Rojname) 1990, Welat (Rojname) 1992, Rewşen (Kovar) 1992, Özgür Gündem (Rojname) 1992 .... 76
**BEŞA SÊYEM**
**BANDORA MUSA ANTER**
**3.1. BANDORA MUSA ANTER YA POLÎTÎK .... 79**
**3.2. BANDORA MUSA ANTER YA LI SER EDEBÎYATA KURDÎ .... 80**
**3.3. BANDORA MUSA ANTER YA LI SER CIVAKÊ .... 83**
**3.4. BANDORA KESÊN KU LI MUSA ANTER KIRINE .... 88**
**BEŞA ÇAREMÎN**
**ANKET**
**4.1. AMADEKIRINA ANKETÊ Û GIRÎNGÎYA WÊ .... 91**
**4.2. RÊ Û RÊBAZÊN BERSIVÊN PIRSÊN ANKETÊ .... 92**
**4.3. PIRS Û ANALÎZA BERSIVÊN PIRSÊN ANKETÊ .... 92**
4.3.1. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Yekemîn .... 92
4.3.2. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Duyemîn .... 93
4.3.3. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Sêyemîn .... 94
4.3.4. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Çaremîn .... 95
4.3.5. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Pêncemîn .... 96

4.3.6. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Şeşemîn .......... 98
4.3.7. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Heftemîn .......... 99
4.3.8. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Heştemîn .......... 100
4.3.9. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Nehemîn .......... 101
4.3.10. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Dehemîn .......... 102
4.3.11. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Yazdemîn .......... 104
4.3.12. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Dozdemîn .......... 105
4.3.13. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Sêzdemîn .......... 106
4.3.14. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Çardemîn .......... 107
4.3.15. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Pazdemîn .......... 108
**4.4. ENCAMA ANKETÊ .......... 109**
**4.5. ANKETA BI ZIMANÊ KURDÎ .......... 110**
**4.6. TURKÇE YAZILAN ANKET .......... 113**
**ENCAM .......... 115**
**ÇAVKANÎ .......... 118**

# ÖZET

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUSA ANTER: HAYATI, ESERLERİ VE ETKİSİ**

**Ercan ABİ**

**Tez Danışmanı: Doç. Dr. Ayhan TEK**

**2025, 131 sayfa**

Bu çalışmamızda Musa Anter'in hayatı, eserleri ve etkisi üzerinde duracağız. Amacımız, bir aydının topluma nasıl bir etkisi olduğunu ve eserlerinin Kürt edebiyatına katkısının neler olduğunu kapsamlı bir çalışma sayesinde açığa çıkarmaktır. Amacımıza varmak için toplumunda öncü olan bir kişinin topluma katkısını tespit etmek amacıyla 15 soruluk bir anket hazırlayıp farklı profillere sahip kişilere cevaplamaları için sunduk. Sorular hem sosyal medya üzerinden hem de yüz yüze cevaplandı. Anket katılımcılarının yanıtları sayesinde Musa Anter ve onun toplum üzerindeki etkisi hakkında daha fazla bilgi edinmiş olduk. Bu çalışma aynı zamanda Musa Anter'in Kürt edebiyatındaki önemini ve Kürt edebiyatını nasıl etkilediğini de bize gösterecektir.

Çalışmada aynı zamanda Kürt modern edebiyatı ve Kürt basınının tarih içerisinde önemli bir temsilci olarak anılmaya başlanan Musa Anter'in yaşamı ve eserleri çerçevesinde nasıl bir değişim geçirdiği de gözlemlenmiş olacaktır. Bu bağlamda çok yönlü bir aydın ve yazar olan Musa Anter gibi aktörlerin yaşamları üzerinden edebiyattan siyasete, dil ve kültürün ilerleme aşamalarından edebiyat çevrelerinin oluşmasına kadar pek çok alan yeniden değerlendirilme imkânı bulabilir.



**Anahtar Kelimeler:** Musa Anter, Kürt Edebiyatı, Toplumsal Eleştiri, Kürt Basını.

**KURTE**

**TEZA LÎSANSA BILIND**

**MUSA ANTER: JIYAN, BERHEM Û BANDORA WÎ**

**Ercan ABİ**

**Şêwirmend: Doç. Dr. Ayhan TEK**

**2025, 131 Rupel**

Di vê xebatê de em dê li ser jîyan, berhem û bandora Musa Anter bisekinin. Armanca me ew e ku bi lêkolîneke berfireh em bandora roşenbîrekî li ser civakê û tevkariya berhemên wî di wêjeya kurdî de derxin holê. Ji bo ku em bigihîjin armanca xwe, me anketek ji 15 pirsan pêk tê, ji bo ku em beşdariya pêşengek di civakê de diyar bikin, amade kir û pêşkêşî kesên xwedî profîlên cihê kir ku bersivê bidin. Pirs hem li ser medyaya civakî û hem jî rûbirû hatin bersivandin. Bi saya bersivên beşdarên anketê em hîn zêdetir haylê derbarê Musa Anter û bandora wî ya li ser civakê bûn. Ev lêkolîn, wê girîngîya Musa Anter ya li edebîyata kurdî jî nîşanî me bide ku çawa bandor li edebîyata kurdî kirîye.

Di lêkolînê de wê were dîtin ku edebîyata kurdî ya nûjen û çapemenîya kurdî, di çarçoveya jîyan û berhemên Musa Anter yê ku di dîrokê de bûye nûnerekî girîng, çawa hatine guhertin. Di vê çarçoveyê de ji edebîyatê bigire heta siyasetê, ji pêşketina ziman û çandê bigire heya avakirina derdorên edebî gelek qadan bi jîyana şanogerên wekî Musa Anter ku roşenbîr û nivîskarekî piralî ye, dikarin ji nû ve werin nirxandin.

**Peyvên Sereke:** Musa Anter, Edebîyata Kurdî, Rexneya Civakî, Çapemenîya Kurdî.

# ABSTRACT

## MASTER'S THESIS

## MUSA ANTER: HIS LIFE, WORKS AND INFLUENCE

**Ercan ABI**

**Advisor: Assoc. Prof. Ayhan TEK**

**2025, Page: 131**

In this study, we will focus on the life, works and influence of Musa Anter. Our aim is to reveal the impact of an intellectual on society and the contribution of his works to Kurdish literature through a comprehensive study. In order to reach our goal, we prepared a 15 question survey in order to determine the contribution of a pioneer in the society and presented it to people with different profiles to answer. The questions were answered both on social media and face to face. Thanks to the responses of the survey participants, we learned more about Musa Anter and his impact on society. This study will also show us the importance of Musa Anter in Kurdish literature and how he influenced Kurdish literature.

In the study, it will also be observed how the Kurdish modern literature and the Kurdish press have changed within the framework of the life and works of Musa Anter, who has become an important representative in history. In this context, many fields from literature to politics, from the progress of language and culture to the formation of literary circles can be re-evaluated through the lives of actors such as Musa Anter, who is a versatile intellectual and writer.



**Key Words**: Musa Anter, Kurdish Literature, Social Criticism, Kurdish Press.

## PÊŞGOTIN

Di vê xebatê de em li ser jîyana roşenbîrekî Kurd Musa Anter bisekinin û dê li ser berhemên wî û bandora wî kûr bibin. Armanca me ev e ku em bikaribin di çarçoveya xebata xwe de tesbît bikin ka him di civaka Kurd de him jî di edebîyata Kurdî de girîngîya Musa Anter çi ye û wî wek roşenbîrekî bandoreke çawa çêkirîye. Ji bo ku em girîngîya Musa Anter tesbît bikin jî bi saya rêbazên ku me bikar anîne, em giheştine encamekê. Di merhaleyên ji bo giheştina encama xebatê de ji alîyê lêkolînê ve metodek wek anketê me bi kar anîye. Anketa ku me bikar anîbû me li kesên pirsên ankatê xwestin ku bibersivînin me yek bi yek ew anket gihande ber destên wan. Paşê li gor rêbaza ku me dîyar kiribû me ew agahiyên di anketan de bûn kom kirin û ew daxilê xebatê kirin. Her çiqas xebatên anketan kareke zehmet be jî ji bo xebata me girîng bû û bi saya anketê bandora Musa Anter ya li ser civakê delîlek girîng da dest me. Yek zehmetîyek din jî ya ku di vê xebatê de derkete pêşiya me, pirsgirêkeke ji alîyê çavkanîyan bû. Lewra li ser edebîyata Kurdî û xebatên bi vî rengî xebat gelek kêm bûn. Me xwest ku em bigihêjin berhemên Musa Anter çapa wan ya yekemîn da ku çi guherîn heta niha di berhemên wî de çêbûnin em bi dest bixin. Lê mixabin him ji alîyê rojnameyan û him jî ji aliyê berhemên ku Anter nivîsandine wek çapa ewil me bi ti awayî bidest nexistin. Di vê mijarê de ji mecbûrî me ji çapên li berdestan û kesên ku li ser Musa Anter nivîs parvekirinin istifade kirin. Bi saya berhevkirinê, hinek xeletîyên ku di derheqê Musa Anter de hatinin nivîsîn jî em hêvî dikin bi saya vê xebatê bi rastîyan re bêne guherîn. Bo numûne di gelek çavkanîyan de temenê Musa Anter xelet hatibû nivîsîn di xebata me de bi berfirehî em li ser sekinîn me di xebata xwe de cih dayê rastîya ku me bi dest xistîye. Di gelek çavkanîyan de Musa Anter wek "kesekî derçûyê beşa hiqûqê hatiye û bûye parêzer" hatîye nivîsîn lê bi lêkolîna ku me ev yek jî hatine serrastkirin. Gelek mînakên bi vî rengî derketin pêş me. Daxwaza me ew e ku ev xebat pêşîya xeletîyên bi vî rengî bigrin û ji bo xebatên bi vî rengî jî ji kesên lêkolîner re bibe çavkanîyek. Em ji girîngî û zehmetîya vê xebatê haydar bûn. Lewra Musa Anter bi piralîya xwe ve di civakê de cihek taybet girtibû. Li gor civakê, Apê Musa roşenbîr, nivîskar, sîyasetmedar, rojnameger, helbestvan û hwd ye. Me ev piralîbûn û gîrîngîya Musa Anter bi saya lêkîlenek kûr yekbiyek nirxand û daxilî nav xebata xwe kir. Em hêvî dikin ev xebate pêşî li gelek xebatên bi vî rengî veke û edebîyata Kurdî bi saya wan xebatan bigihêje asteke çêtir.

Di amadekirina her merhaleya vê xebatê de bi her awayî bi alîkarîya xwe û bi agahîyên xwe kesên ku alîkarî daye min û şêwirmendî ji min re kirîye spasîya xwe ji Ayhan TEK re dikim. Kêsên ku anketa ku me amade kiribû û beşdarî anketê bûne, kesên ku di perwerdehîya zanîngehê de bûne wesîle ku di qada edebîyata Kurdî de ez gihandime astekê, spasdarîya xwe pêşkêşî wan tevan dikim.

**Muş-2025** **Ercan ABİ**

**LÎSTEYA TABLOYAN**

Tabloya 2.1. Alfabeya Zimanê Kurdî....................................................................46

Tabloya 2.2. Dicle–Firatê de Parvekirine ev in..............................................................72

Tabloya 4.1. Zayenda xwe naxazim dîyar bikim: JIN: MÊR........................................93

Tabloya 4.2. Temenê we?................................................................................................94

Tabloya 4.3. Tehsîla we? Xwendin û nivîsîn nîn e: Dibistana seretayî: Dibistana navendî: Lîse: Zanîngeh.........................................................................................95

Tabloya 4.4. Hûn kîjan zimanan dizanin? Kurdî: Tirkî: Farisî: Erebî: Ingilîzî: Almanî: Zimanekî din...............................................................................................96

Tabloya 4.5. Hûn kîjan Zaravayên Kurdî dizanin? Kurmancî: Kirmanckî (zazakî): Soranî: Goranî: Lekî: Lorî: Bi yekî jî nizanim................................................................97

Tabloya 4.6. Hûn ji nivîskarên ku Kurd in û bi Kurdî yan jî Tirkî dinivîsinin an nivîsandine ji wan çend kesan nas dikin?..............................................................98

Tabloya 4.7. We Navê Musa Anter an jî Apê Musa Qet Bihîstîye? Erê–Na.................99

Tabloya 4.8. Hevnasîna we yan jî naskirina bi Musa Anter re çawa çêbûye? Li ser medyaya civakî: Bi saya nivîsên wî: Di nava civakê de: Min hevaltî bi wî re kirîye: Wekî din...................................................................................................100

Tabloya 4.9. Sîyasetmedar: Roşenbîr: Nivîskar: Helbestvan: Rojnameger: Hemû: Ne yek...........................................................................................................102

Tabloya 4.10. We heta niha çend pirtûkên Musa Anter xwendîye?.............................103

Tabloya 4.11. Li gor we Musa Anter xwedîyê fikr û ramanên çawa bû: Aştîperest: Humanîst: Welatparêz: Nijadperest: Polîtîk: Azadîperest: Nizanim............................104

Tabloya 4.12. Hatıralarım: Kara Yara (Birîna Reş): Kimil: Ülke ve Gündem Yazıları: Vakayiname: Çinara Min: Yeke Din: Min nexwendiye...............................................105

Tabloya 4.13. Li gor we Musa Anter ji alîyê edebîyata Kurdî ve nivîskarekî çawa bû? Serkeftî ye: Ne Serkeftî ye:.............................................................................106

Tabloya 4.14. Li gor we di kîjan civînan de navê Musa Anter bêtir derdikeve pêş? C. Xwendekaran: C. Polîtîk: C. Edebîyatê: C. Medyayê: Weke din:...............................107

Tabloya 4.15. Li gor we bandora Musa Anter li ser civakê bi awayekî erênî çêbûye? Erê: Na: Nizanim: Naxwazim bibersivînim..................................................................108

YÖK

## DESTPÊK

Dema ku di civakê de mewzûbehsa kesekî pêşengtî kiribe, hewce ye ku ji her alî ew kes bête nirxandin û bandora wî ya li ser civakê bête analîzkirin. Ji wan kesên ku pêşeng re di nav gel de weke "roşenbîr", "rûspî", "ronakbîr", "rêber", "zana" û hwd tête binavkirin. Civak misyonekê li wan kesên xwedî wê nasnameyê bar dikin û wan kesan di civakê de wek pêşeng tênin pejirandin. Kesên pêşeng li gor xebatên xwe statuyekê bi dest dixin û li gor wê statuyê xwe bi civakê re qebûlkirin didin. Wek mînak dibe ku kesê pêşeng sîyasetmedar be, nivîskar be, rojnameger be, bijîşk be an jî kesekî dîndar be. Li ser pênasîneya peyva pêşeng, wateyek rasterast hê jî nehatîye peydakirin. Lewra pêşeng wek xwedî yek wate nayête dîtîn, pirwateya peyva pêşeng bêtir derketîye pêş. Weke mînak di derheqê vê mijarê de Ayşem Sezer wisa behs kirîye: Peyva roşenbîr ji têgeha elît hatîye û binkategoriyeke wê ye. Têgîna roşenbîr yek hevwateya wê nîne. Berî her tiştî di dîrokê de wateya peyva roşenbîr bi awayek cuda derdikeve pêş me. Weke têgeha yekem ku em pê re rû bi rû dimînin têgeha elît e. Têgeha elît ji bo pênasîna peyva Roşenbîr di serî de ye. Bi demê re, gelek teorîsyenan li ser mijara elîtan lêkolîn kirinin û li gor wan têgeha elît tê wateya roşenbîr (Sezer, 2012: 3). Kesên ku li ser peyva pêşeng ango roşenbîr rawestîyane wek ku hatîye behskirin herdu peyv digihînin hev lê bi awayekî pirwate didin nasîn. Wek tête dîtin em şahid dibin yek wateyek di peyva roşenbîrê de nayête dîtîn û her civak li gor xwe wateyek erênî li peyva roşenbîr bar kirine. Yanê dema ku me peyva roşenbîr bikar anî em bi mabesta "rêzan, rûspî, ronakbîr, rêber, zana û hwd" bikar tînin. Wek her civakê di civaka Kurdan de jî kesên bi xebat û berhemên xwe, fikr û ramanên xwe di asta roşenbîrîyê de hatinin qebûlkirin henin.

Musa Anter jî yek ji wan kesan e ku ger bi nivîsên xwe û ger jî bi hebûna nav û berhemên xwe yên di nav civakê de ji alîyê me ve layîqê wê astê hatîye dîtin. Ji ber wê me xwest ku em di vê xebata xwe de jîyan û berhemên Anterî bi awayekî zanistî analîz bikin. Musa Anter di qada edebîyata Kurdî de û ji alîyê çapemenîya Kurdî ve bi nivîsên xwe yên di kovar û rojnameyan de bi berhemên xwe yên li ser realîteya gel ve çi bandor li ser gel kirîye? Ji bo vê pirsê me anketek amade kir û li gel belav kir. Di encama anketê de bandora Musa Anter ya li ser civakê em dê derxin holê.

Me di vê xebatê de hewl da ku em bandora Musa Anter ya li ser civakê bi çi awayî çêbûye tesbît bikin. Em dê di lêkolîna xwe de li ser berhemên Musa Anter ên ku wendayî û bi ti awayî ne li ber destan in bisekinin. Herwisa em dê girîngîya Musa Anter ya di çapemenîya Kurdî de bi lêkolîneke kûr analîz bikin. Mabesta me ew e ku xebata ku em dê bikin li edebîyata Kurdî fêdeyêkê bike û nivîskarên mîna Musa Anter bêtir bêne fêhmkirin.

Musa Anter, (bi gotina di nav gel de: Apê Musa) roşenbîr, nivîskar, helbestvan û rojnamegerekî Kurd e. Derheqê jidayîkbûna Anter dîrokekek rasteqîn di destê me de nîne. Musa Anter li gundê Zivingê yê girêdayî navçeya Nisêbînê ya bajarê Mêrdînê hatîye dinyayê. Anter, bi armanca xwendina dibistana lîseyê çûye bajarê Edenê. Musa Anter piştî qedandina lîseyê ji bajarê Edenê derdiçe û bi armanca xwendina zanîngehê çûye bajarê Stenbolê. Anter, li Stenbolê di destpêkê de qeyda xwe li beşa felsefeyê çêkirîye û paşê jî bi pêşnîyara hevalên xwe qeyda xwe derbasî beşa hiqûqê kirîye. Musa Anter herdu beşan jî naqedîne û dest bi karê wargehê û bazirganîyê û paşê jî dest bi karê çapemenîyê kirîye.

Musa Anter di nivîsên xwe yên di rojname û kovaran de behsa pirsgirêkên gel, xîzanî û xerabîya ku gel tê de ye kirîye. Bi zimanekî zelal û fêhmker nivîsên xwe nivîsîbûn û hunera hicwî jî bêtir di nivîsên xwe de bikar anitîye. Di serdema komeleya Tirkîyeyê de Musa Anter yekemîn kes e ku *Ferhenga Khurdî-Tirkî* nivîsîye. Wî di gelek rojname û kovaran de kuncenivîskarî kirîye. Musa Anter di jîyana xwe ya nêzî 80 salan de gelek berhem li ziman û edebîyata Kurdî zêde kirine. Anter ji ber fikr û ramanên xwe ketiye zindanan, sirgûn bûye û gelek tadeyên mezin kêşane. Anter di nav ewqas tadeyî û zordestîyê de berhemên li edebîyata Kurdî zêde kirine ku ew niha li ber destê me ne ev in: *Birîna Reş* (Kara Yara) (1959), *Qimil* (1962), *Ferhenga Kurdî–Tirkî* (1967), *Hatıralarım I-II* (1991-192), *Çinara Min* (1999), *Vakayiname* (1992), *Fırat Marmara'ya Akar* / *Ülke* ve *Gündem Yazıları* (1996).

Di çavkanîyan de ji xeynî berhemên Anter ên ku li ber destan, me berhemên Anter yên ku navê wan di çavkanîyan de derbas dibin lê çapên wan li ber destan nînin tesbît kirin. Em dê di bin serenavê "Pirtûkên Musa Anter yên ku me bi dest nexistîne" de li ser wan berheman bisekinin. Em dê di xebata xwe de li ser jîyan û berhemên Anter, di çarçoveya edebîyat û çapemenîya Kurdî de, bi awayekî berfireh bisekinin û binirxînin.

Em dê di vê xebatê de fikr û ramanên Anter, bandora wan li ser berhemên wî bi çi girîngîyê çêbûye bêtir bibînin.

Nivîsîn û berhemên Anter piştî zordestî, sirgûnî û zindanê di encamê de bûye sedema ku di 80 salî de bête kuştin. Musa Anter di 20 Îlonê ya sala 1992yan de li Amedê ji alîyê kesên ku hîn jî bi awayekî fermî nehatine dîyarkirî ve hatibû kuştin. Lê li gor gelek agahîyên ku li ser kuştina Musa Anter hatîne parvekirin, kujerên Musa Anter di nav alozîyekê de ye û ne dîyar e. Her sal di dîroka kuştina Musa Anter de li ser navê wî xelatê rojnamegerîyê tête dayîn.

Musa Anter bi jîyana xwe û ramanên xwe bandoreke çawa li ser civakê kirîye? Bi armanca tespîtkirina vê pirsê, me anketek amade kir rûbirû li gel belav kir. Pirsên ku hatîne amadekirin bi beşdarbûna bersivên başdarvanên anketê me encamek bi dest xist. Ev xebat, bandora nivîskarekî di nav gel de bi çi awayî bandor li gel kirîye di qada akademîyê de em dê bêtir bibînin. Çavkanî û xebatên ku me ji bo mijara xwe ji wan istifade kirîye ji alîyê me ve ji bo zimanê Kurdî hatine wergêran.

## BEŞA YEKEM

## MUSA ANTER

Musa Anter, nivîskarekî Kurd e ku ew li bajarê Mêrdînê hatîye dinyayê lê bi gelemperî jîyana wî li bajarê Stenbolê derbas bûye. Bajarê Stenbolê, ji alîyê pêşketina zanistîyê ve bandoreke mezin li ser Musa Anter kirîye. Anter, li Stenbolê dest bi xwendina beşên felsefe û hiqûqê kirîye lê wî ew neqedandine. Di dema xwendina xwe ya zanîngehê de bi pêşnîyarîya hevalê xwe dest bi berpirsarîya karê wargehê kirîye. Anter, ji ber ku berpirsyarî li wargeheke bi navê "Dicle Öğrenci Yurdu" kirîye, fikr û ramanên wî yên bi tevgerên îdeolojîk, bi xwendekaran re bêtir çêbûye. Musa Anter, îdeolojîya xwe li ser mafê mirovan ava kiribû ango neteweyên kesan çi be li ba wî ne girîng bû. Li gor Musa Anter ya herî girîng wekhevîya di navbera neteweyan de bû. Fikr û ramanên Anter yên wekhevîyê him di nivîsên wî de cih girtine û him jî piştî kuştina wî jî nûçeyên di derheqê wî de bi vî rengî hatibû parvekirin: "Musa Anter her tim daxwaza jîyaneke bi hev re di navbera neteweya Kurd û Tirkan de kiribû. Ne kesekî ehlê cudahîbûna Kurd û Tirkan bû. Musa Anter, yekem ji wan kesan e ku di dema komeleya Tirkîyeyê de bi Kurdî nivîsîbû, çîroknûs bû û *Ferhenga Kurdî*, amade kiribû (Bir Cinayet; 1992: 3)." Musa Anter xwedîyê fikreke humanîst bû û ev fikra ku her tim daxwaza mafên mirovan kirîye ku ew yek di nivîsên wî de bêtir dîyar dibin. Li ser wekhevîya neteweyan di sala 1959an de di rojnameya *İleri Yurt*ê de nivîsîneke Musa Anter bi navê "Mademki Lozancıyız" ("Ger ku Em Lozanparêz in") hewce ye ku nivîsîna bi zimanê Kurdî jî ne qedexe be (Anter, 2013c: 27). Li gor peymana Lozanê hemû neteweyan dikarîbû bi zimanê xwe biaxivin, binivîsin û jîyana xwe bidomînin. Lê desthilatdarên dewletê nivîsên bi zimanê Kurdî nedipejirandin û her tim di dadgehan de doza di çarçoveya xayîntîyê de li wan kesên ku bi zimanê Kurdî berhem nivîsîne, vedikirin. Musa Anter ji ber wan fikrên xwe gelek nexweşîyan bi çavê serê xwe dibîne û dikêşe. Astengîyên mîna binçavkirin, bêrûmetîya ku di îşkenceyan lê hatine kirin, zindan, sirgûn û hwd.

Musa Anter di nivîsînên xwe de zimanekî sade û rexneyî bikar tîne. Dema ku em nivîsên Musa Anter dinirxînin di nivîsên wî de hîciw bêtir derdikeve pêşîya me. Musa Anter bi saya meselok û çîrokên balkêş bûyeran zelal dike û wan di hişê xwîneran de

bêtir bicih dike. Yanê ew xwendevanan aciz nake, wan bêtir dixe nava nivîsên xwe, mabesta ragihandina di navbera xwe û xwendekaran de bi vê rêyê derdixe pêş me.

Musa Anter endamê Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê bû ku vê enstîtûyê li ser ziman, wêje, huner û çanda Kurdî gelek xebat kirine û hîn jî bi navekî din xebatên xwe didomîne. Li gor Hasan Bildirici, bi pêşnîyarîya Musa Anter serokê Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê İsmail Beşikçi bû lê Beşikçi qet navê seroktîyê bikar nedianî, heta ku hate kuştin jî serokê Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê her Musa Anter bû (Bildirici, 2011: 375). Musa Anter jî kedkarê sazîya Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê bû û bi gelek xebatên xwe edebîyata Kurdî dewlemend kirîye.

Musa Anter li edebîyata Kurdî berhemên wek *Qimil, Birîna Reş, Hatıralarım, Vakayiname, Kürtçe Türkçe Sözlük, Fırat Marmaraya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları, Çinara Min* zêde kirine. Ji xeynî van berheman, di gelek kovar û rojnameyan de jî bi zimanê Kurdî û Tirkî nivîsên wî hatîne belavkirin. Anter, bi xebatên xwe yên ku di qada çapemenîya Kurdî de kirîne, ew xebatên wî bûne wesîle ku di çapemenîya Kurdî de pêşkeftinek çêbibe.

Musa Anter, di 20ê Îlonê ya sala 1992yan de tê kuştin. Li ser kuştina Musa Anter itirafçiyên JİTEMê di hevpeyvînên bi rojnamegeran de itiraf kirine ku Musa Anter ji alîyê JİTEMê ve hatiye kuştin. Lê ew itiraf ji alîyê dadgehê ve wek rastîyekê nehatîye qebûlkirin. Kuncenivê rojnameya *Hürriyetê*, Oktay Ekşi bi van gotinan behsa kuştina Musa Anter kiribû û rexne li Süleyman Demirel kiribû:

> *Piştî kuştina Anter, serokê konseya çapemenîya Tirkîyeyê û kuncenivîskarê rojnameya Hürriyetê Oktay Ekşi jî rave kiribû ku dewletê Musa Anter kuştîye. Bi sedema kuştina Musa Anter ji Süleyman Demirel re telgirafekê dişîne. Ji ber ku Süleyman Demirel derheqê kuştina kesan de di hevpeyvîneke xwe de gotibû: "Kesên ku têne kuştin hemû milîtan in." Oktay Ekşi ji ber wan gotinan Demirel rexne kiribû. (Hekimoğlu, 2000: 87).*

Her çiqas ku kujerên Anter dîyar bin jî alozîyek li ser doza wî kon vedaye û bi wê alozîyê jî doza wî gihiştîye encama qedandinê. Anter ji ber ku kesekî di civakê de hatîye nasîn piştî kuştina wî her sal di roja kuştina wî de li ser navê wî çalekîyên edebî û rojnamegerîyê çêdibin û xelat têne dayîn. Ev dayîna xelatê jî di nav civakê de girîngîya kesayeta wî bêtir derdixe pêş. Ji bo ku em girîngî û kesayeta Musa Anter ya di nav

civak û edebîyata Kurdî de bêtir fêhm bikin pêwist e ku em ji jîyana wî ya nêzî 80 salan haydar bin.

### 1.1. JÎYANA MUSA ANTER (APÊ MUSA)

Musa Anterê ku zêdetir wek Apê Musa tête nasîn, rewşenbîrekî Kurd e ku ew li gundekî navçeya Nisêbînê ya bi navê Zivingê hatiye dinyayê. Musa Anter di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê "*Hatıralarım*" (Bîranên min) de bi van gotinan behsa cihê jidayîkbûna xwe kirîye:

> *Kurdistan, herêma herî paşmayî ya Tirkîyeyê ye. Mêrdîn, bajarê herî paşmayî yê Kurdistanê yê. Nisêbîn, navçeya Mêrdînê ya herî bi kul e. Stîlîlê nehîyeya herî xîzan ya Nisêbînê ye. Zivingê, gundê herî paşmayî yê Stilîlê ye. (Anter, 2016f: 19)*

Her çiqas jidayîkbûyîna Musa Anter di sala 1920an de têtê gotin jî lê rastîya sala jidayîkbûyîna wî di nav nivîsên wî de bi van gotinên wî derbas bûye. Di nivîsa xwe ya bi navê "Welat" de, di meha Tebaxê ya sala 1992yan de wisa behsa dîroka jidayîkbûyîna xwe kirîye:

> *Em ji sala 1915an re dibêjin "Sala mihacirîyê." Lê bi rastî em Kurd tim di welatê xwe de jî mihacir in. Tewer niha Tirkên mihacir ji me re dibêjin "Sığınmacı", yanî Tirkan bi xêra xwe Kurdên Zaxoyê li Silopîyê hewandine. Lê ma ez ê çi bejim, çavê felekê kor be!*
>
> *Sala mihacirîya me ya meşhur, dema ku Osmanlî li ber Uris belav bûn û revîyan. Uris heta Bedlîsê hatin. Kurdan dev ji mal û milkên xwe berdan û bi çolê ketin. Sê par ji wan ji birçîbûnê û ji nexweşîyê mirin. Ez wê sala mihacirîyê çêbûme. Paşê ez bûm şeş-heft salî jî hîn mihacir li gundê me hebûn. (Anter, 2013b: 62)*

Di lêkolîna ku me kiriyî de di belgeyeke dadgehê de jî behsa dayîkbûna Anter hatîye kirin. Musa Anter, di sala 1959an de ji ber ku helbesta "Qimil" di rojnameya *İleri Yurt*ê de parve dike dozek li wî û li wê rojnameyê vedibe: "Dema ku dadgehdar nasnameya Musa Anter dide nasîn temenê wî li gor salnameya hicrî 1336an dixe qeydan (Anter, 2013c: 41)." Dema ku em li gor salnameya Mîladî temenê wî hisab dikin, ew dibe beramberê sala 1918an. Lê ya herî girîng li gor me ya wî bi devê xwe gotîye û jidayîkbûna wî em dê di navbera 1915-1918 de qebûl bikin. Lewra dêya Musa Anter dema behsa jidayîkbûna wî dike, behsa salên qirkirina Ermenîyan dike. Qirkirina Ermenîyan di navbera salên 1915 û 1918an de, di dema dewleta Osmanî de pêk hatiye.

Navê bavê Musa Anter, Anter e û navê dêya wî jî Fesla ye. Navê Musa Anter yê ewil Şêxmus e û ji alîyê kesên ku li gundê wî û li derdora wî, Musa Anter bi navê Şêxmus nas dikin. Veysel Dinçer wisa behsa navê Şêxmus dike: “Navê Şêxmus jî ji zîyaretek (tirbeyek) bi navê Siltan Şêxmus tê. Gelên wê herêmê ji ber bawerîya dîn û bandora çandê navê Şexmûs li zarê xwe yên kur dikin (Dinçer, 2015).” Ev çanda ku navdayîna li kesan hîn jî didome. Navê Siltan Şêxmus yê rasteqîn Siltan Şêx Musa ye lê di nav gel de ji ber bilêvkirina hêsanî wekî Siltan Şêxmus li ziman rûniştîye. Ji ber ku sala jidayîkbûna Musa Anter, di dema dewleta Osmanî de bû, paşnavê wî jî bi navê bavê wî ve girêdayî bû, yanê Anter bû. Lê piştî ku dewleta Osmanî hilweşîyaye û komeleya Tirkîyeyê ava bûye, li gor krîterên dewleta Tirkîyeyê di sala 1934an de paşnav tên guherandin. Paşnavê Anter jî bûye Elmas. Hatice Kamer bi van gotinan behsa mijara nav û paşnavê Musa Anter dike:

> *Musa Anter nav û paşnavê xwe wek Şeyhmus Elmas piştî zewac û zarokên wî çêbûnin jî bikaranîye. Guherîna nav û paşnavên Musa Anter di navbera salên 1946-1947an de çêbûye. Wî navê xwe kirîye Musa û paşnavê xwe jî kîrîye Anter. (Kamer, 2022: 27)*

Musa Anter, ji malbateke dewlemend bû lê dewlemendîya aborî têra jîyana malbata wî nekiribû. Anter bi van gotinan behsa sedema xwendina xwe kirîye: Pirsgirêka ziman li herêmê gelek hebû ji ber ku li gundê Zivingê kesê zêde bi zimanê Tirkî nedizanin û di qada ragihandinê ya bi dewletê re tengasî derxistibû holê. Dêya Musa Anter, Fesla Xanim ji ber nexweşîya zilamê xwe erka mixtartîya gundê Zivingê dide li ser milên xwe û kurê xwe Musa ji bo ku fêrî zimanê Tirkî bibe dişîne dibistanê. Musa Anter, li navçeya Kercewsê (navçeya ku heta sala 1990î jî girêdayî bajarê Mêrdînê bû) dest bi dibistana seretayî kirîye û paşê jî li navçeya Nisêbînê xwendina xwe domandîye. Lê ji aliyê din ve herçiqas Musa Anter daxwaza domandina xwendina xwe kiribe jî Fesla xanimê ji ber karê malbatê daxwaza Musa Anter ya ji bo xwendinê qebûl nekiriye. Lewra fêrbûna zimanê Tirkî ji alîyê Fesla Xanimê ve bes hatîye dîtin (Anter, 2016f: 31-33).

Musa Anter di dema xwendina xwe ya dibistanê de dikeve ezmûnekê. Di encama dîyarbûyîna ezmûnê de kesên serkeftî, dewlet wan kesan dê bêpere bidin xwendin. Dema ku encama ezmûnê dîyar bûye, Musa Anter navê xwe di nav kesên serkeftî de ditîye. Her çiqas ne bi dilê malbatê jî be, Musa Anter bi saya mamosteyên xwe malbata

xwe îkna kirîye û bi mabesta xwendinê çûye bajarê Edenê. Anter dema ku li Edenê xwendekar bû jî bûye şahidê qetlîema Dêrsîmê. Kesên ku di pola Anter de bûn ji ber ku zanîbûn Musa Anter Kurd e û di derheqê xanima Seyîd Riza de gotinên ne ji rêzê gotine. Musa Anter jî bertekê wan gotinên wan dijûnan ji dêya Atatürk re kirine. Veysel Dinçer wisa behsa wê yekê dike:

> *Musa Anter ji ber ku dijûn li dêya Atatürk kirîye ev bûyer dibe sedema ku Musa Anter di salên zaroktîya xwe de yekemîn carê bikeve bin çavan û ji ber ku dijûn li Atatürk daye, doz lê vebûye. Lê paşê Atatürk, Musa Anter bexşandibû û Anter vegerîyabû dibistana xwe. (Dinçer 2015)*

Musa Anter lîse li Edenê qedandîye lê dema ku li Edenê xwendevan bû û ketibû bin çavan ji Kurdbûyîna xwe bêtir haydar bûye. Musa Anter di sala 1941an de beşa felsefeyê qezenç kirîye û bi mabesta xwendinê çûye Stenbolê. Li bajarê Stenbolê kesên ku di jîyana wî de cih girtîye, Faik Bucak nas kirîye. Faik Bûcak hişmendîya Kurdîtîyê bi Musa Anter re bêtir çêkirîye. Musa Anter di wan salên ku li Stenbolê bûye li derdora xwe Kurdan bêtir nas kirîye û her tim jîyana xwe bi alîyê Kurdewarîyê ve meşandîye.

Musa Anter piştî ku dest ji xwendina zanîngehê berdaye dest bi midûrtîya wargeha "Dicle Talebe Yurdu"yê kirîye. Musa Anter, li xwendekarên Kurd û xîzan xwedî derketîye û wan li xwe kom kirîye. Ömer Turan wisa behsa Mûsa Anter û girîngîya "Dicle Talebe Yurdu"yê kirîye:

> *Dicle Talebe Yurdu ji bo Kurdan bûbû navenda perwerdehî û çandê û li Tirkîyeyê ewilîn koma folklorê ji alîyê "Dicle Talebe Yurdu"yê ve hatîye lidarxistin. Li ser navê çandê him çanda Kurdan tête meşandin û him jî bi rêya navê şevên Dîcleyê kesên Kurd li hev kom dibûn. Musa Anter jî yek ji wan kesan bû ku rêbertî ji vê yekê re kiribû. (Turan, 2020: 161)*

Musa Anter ji bo ji alîyê aborîyê ve debareya xwe û malbata xwe bike li Lalelîya Stenbolê wargehekê bi navê "Özel Fırat Talebe Yurdu" vedike. Musa Anter bi vî awayî dikeve ticaretê lê her tim baldarî fikrên xwe yên Kurdîtîyê jî bûye. Xwendekarên Kurd li wargeha "Özel Fırat Talebe Yurdu"yê kom dibin. Musa Anter di sala 1943yan de li ser doza Kurdîtîyê kesekî oldar û helbestvan Abdurrahîm Zapsu (1890-1958) nas dike û di sala 1944an de bi keça wî Ayşe Hale Zapsu re dizewice. Musa Anter piştî ku "Özel Fırat Talebe Yurdu"yê digire li semta Eminönü/Stenbolê loqenteyeke mezin vedike û ji alîyê aborîyê ve jî gelek serkeftî dibe. Anter û çend hevalên xwe bi mabesta xizmeta Kurdîtîyê bêtir bikin daxwaza avakirina komeleyekê dikin. Anet bi van gotinan behsa

komeleyê kirîye: Piştî komeleya *Hêvî*, yekemîn komeleyeke xwendekaran ya bi navê "Komeleya Xelaskirina Kurdan", ji aliyê Musa Anter û çend hevalên wî ve bi hev re tête avakirin. Yekem armanca Komeleyê eve e: Xwendekarên ku ji derveyê stenbolê bên li wan xwedî derkevin û fikrên xwe bi wan bidin pênasîn.Di avakirina vê komeleyê de Mustafa Remzi Bucak, Yusuf Azizoğlu, Ziya Şerefhanoğlu, Musa Anter û Faik Bucak jî bi wî re bûye (Anter, 2016f: 61-64). Faik Bucak di jîyana Musa Anter de kesekî gelek bi girîng e ku Anter bi pêşnîyarîya wî dest bi xwendina beşa hiqûqê kiriye û bi alîkarîya wî bûye berpirsê "Dicle Talebe Yurdu"yê. Musa Anter di sala 1948an de bi rojnameya *Dicle Kaynağı*yê dest bi karê çapemenîyê dike ku di vê babetê de Hüseyin Akyol wisa behs kirîye:

> *Di sala 1946an de dema ku Demokrat Parti vedibe, kesên ku li ser doza Kurdîtîyê ne, ji ber ku li hember partîya CHPyê ne, xwe didin alîyê DPyê û mixalefetê li fikr û ramanên partîya CHPê dikin. Musa Anter di sala 1948an de li Stenbolê çapxaneyekê vedike û di wê çapxaneyê de rojnameya Dicle Kaynağıyê çap dike. Di rojnameya Dicle Kaynağıyê de dinivîse û nivîsên xwe dişîne Rojhilatê Tirkîyeyê, li Rojhilatê ev rojname bêtir bala kesan dikeşîne. Di rojnameya Dicle Kaynağıyê de her tim partîya CHPyê rexne dike û pesnê partîya DPyê dike. Di encama hilbijartina 1950an de li Rojhilatê Tirkîyeyê DPyê gelekî pêş dixe. (Akyol, 2021: 16-18)*

Rojnameya *Dicle Kaynağı* ji ber pisgirêkên çapxaneyê ve weşandina xwe bi dawî anîye. Ji aliyê dî ve Musa Anter, di sala 1951an de bi alîkarîya Kemal Sulker rojnameya *Şark Mecmuasi* derxistîye. Di ber xebata çapxaneyê de karê loqentecîtîyê jî kirîye. Musa Anter di navbera salên 1949 û 1950 de loqenteyek bi navê "Dicle Memur ve İşçi Lokantası" vekirîye lê piştî têkçûyîna partîya CHPyê Anter bi mecbûrî dev ji karê loqentecîtîyê berdaye. Lewra karmendên ku dihatin loqenteya wî û xwarin dixwarin dengê xwe jî didan DPyê. Îhaleya loqenteya wî ji ber vê sedemê ji alîyê walîyê Stenbolê ve hatiye betalkirin (Anter, 2016f: 117-118). Anter piştî karê wî bi dawî bûye dev ji jîyana li Stenbolê berdaye û vegerîyaye gundê xwe û dest bi karê cotkarîyê kirîye. Di wan salên ku li gundê xwe jîyabû bi daxwaza hevalên xwe vegerîyaye Amedê. Li Amedê pêşîyê dest bi karê berpirsîyarîya otelekê kirîye û paşê dest ji wî karî berdaye û dest bi kuncenivîsa rojnameya *İleri Yurt*ê kirîye. Di 31ê meha Tebaxê ya 1959an de helbesteke bi navê "Qimil" bi zimanê Kurdî di rojnameya *İleri Yurt*ê de nivîsîye. Ev helbeste ji alîyê medyaya Tirkîyeyê ve xeternek hatîye dîtin û li hember helbesta "Qimil" bertekên xwe dîyar kirine. Bertekên medyayê bûne seebe ku Musa Anter

zêdetir bikeve ber çavên rayedarên dewletê. Di 11ê meha Mijdara 1959an de bi sedema helbesta *Qimil* -derheqê wî û rojnameyê de doz hatiye vekirin- Musa Anter û kesên ku berpirsîyarên rojnameya *İleri Yurt*ê têne girtin.

Piştî vê bûyerê gelek roşenbîrên Kurd li hember vê biryara dadgehê û ketina Musa Anter ya zindanê dengê xwe bilind kirine. Ev berteka ku roşenbîrên Kurd dabûn, dibe sedem ku ew jî bikevine zindanê. Di destpêkê de tevlî Musa Anter 50 kes têne binçavkirin lê ji ber ku cihê wan yê hucreyan têra çil kesî bû, deh kes tên berdan û çil kes girtî dimînin. Di demek nêz de hevalekî wan ji ber ku di hucreyê de miribû wek bûyera 49an di nav medyayê de tê binavkirin (Anter, 2016f: 148). Musa Anter û çend hevalên xwe ji doza bi navê 49an ceza dixwin û tên surgûnkirin. Lê paşê darbeya eskerî ya 27ê Gulanê ya 1960î li Tirkîyê çêdibe û doza 49an di dadgehê de didome. Ji ber ku mehkeme demek dirêj dewam dike, doza wan dikeve û ji zindanê derdikevin. Piştî bûyera 49an di demek nêz de, di sala 1963yan de, tevlî Musa Anter 23 roşenbîrên Kurd bi maneya wek daxwaza Kurdistaneke serbixwe dikin, tên girtin û doz li wan 23 kesan vedibin. Ew jî di medyayê de wek doza 23yan hatîye binavkirin. Di sala 1964an de ew doz jî dikeve û kesên di girtîgehê de ne tên berdan. Musa Anter piştî derketina ji zindanê bi çend hevalên xwe re daxilî qada sîyasetê dibe. Anter, xwe nêzî partîya TÎPê dibîne û di partîya TÎPê de daxilî sîyasetê dibe. Süreyya Algül û çend nivîskarên din di pirtûka bi navê *Türkiye Siyasal Hayatından Portreler* de wisa behsa têkilîya Musa Anter û sîyasetê dikin:

> *Musa Anter Ewil di partîya TÎP de weke fermî dikeve nav sîyasetê lê paşê ew û gelek hevalên xwe ji TÎPê vediqetin. Di navbera salên 1969-1971an de Musa Anter û hinek hevalên xwe DDKOyê "Devrimci Doğu Kültür Ocakları" ava dikin. Bi saya DDKOyê fikra sosyalîzmê him di nav roşenbîrên Kurdan de û him jî di nava gel de bêtir cih digire. Di sala 1971an de ji ber avakirina DDKOyê dozek li wan vebûye Musa Anter û hevalên xwe sê sal ceza girtine. Musa Anter piştî ku ji zindanê derketîye li gundê xwe vegerîyaye. Di 12 Îlona ya sala 1980î de darbeya eskerîyê çêbûye û Anter hatîye girtin û carek din ketîye zindanê. Musa Anter piştî ku ji zindanê derketîye vegerîyaye Stenbolê û dest bi karê nivîsandinê kirîye.*
>
> *Musa Anter di sala 1990î de yek ji wan kesên ku partîya HEPê, di 1991an de jî "Çanda Nevendî ya Mezopotamya" (MKM) û di sala 1992an de "Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê" vekiribû". Musa Anter kesekî aştîperest bû lê dozên ku li wî dihatin vekirin her tim bi mabesta têkçûyîna fikr û ramanên wî bûn. Musa Anter ji ber fikr û ramanên xwe nêzî yanzdeh sal û nîvan di zindanê de mabû û di sala 1992yan de li Amedê hatibû kuştin (Algül û Aydemir, ûyd 2019: 173-174).*

Bi vî şiklî wekî ku tête dîtin Musa Anter hêj wextê di jiyanê de bû, hem bibû şahidê meseleyên Kurdan û Kurdewariyê, hem jî di hafizeya Kurdan de wek kesekî girîng maye.

### 1.2. MALBATA MUSA ANTER

Musa Anter, him bi malbata xwe û him jî bi zewicîna bi Ayşe Hale re bi malbata malxezûrê xwe di nav civakê de bêtir tête nasîn. Girîngîya malbata Musa Anter ji eşîrtîyê, mezinbûnê û ji mîrîtîyê tê. Navê bavê wî Anter e û navê dêya wî jî Fesla ye. Yaşar Kaya bi van gotinan behsa malbata Musa Anter ya alîyê bavê wî kirîye:

> *Malbata wî bi navê Anter li derdora bajarê Mêrdînê tête nasîn. Malbata Anter jî digihêje şaxê Misotezê yên girêdayî Milê malbata mezin ya Temikan. Malbata Temikan jî girêdayî eşîra Botanê ye. Dema ku sînor di navbera dewlata Tirkan û Sûrîyê de çêdibe gelek kes ji malbata wan û gundê girêdayî malbata Temikan dikeve alîyê dewleta Sûrîyê û hinek ji wan jî li Tirkîyeyê dimînin. (Kaya, 1993:7)*

Bavê Musa, Anter mixtarê gundê Zivêngê bûye lê di temenek ciwan de ji ber ku nexweş ketibû mixtartîya gundê Zivingê ji mecbûrî ketîye destê dêya wî Fesla Xanimê. Fesla Xanim di nav wan kesên ku jin û mixtartî di dema komeleya Tirkîyeyê de kirîye, wek yekem mixtara jin jî tête dîtin. Du xwîşk û du birayên Musa Anter hebûn. Xwîşka wî ya mezin Xensê ye, paşê jî ew çêdibe û paşê Hesen, Wetha, Ûsib (Yûsûf) tê. Dema Musa dest bi dibistanê kirîye bavê wî çûye ber rehma Xwedê. Dêya Musa, Fesla Xanim jî di sala 1963yan de çûye ber rehma Xwedê.

Musa Anter dema ku li Stenbolê jîyabû ji malbata mîrên Hekkarîyê keça Abdurrahîm Zapsu, Ayşe Hale Zapsu nas kirîye û di sala 1944an de pê re zewicîye. Li ser vê mijarê Celal Temel wisa behsa Ayşe Hale Anter kirîye:

> *Ayşe Hale Zapsu, di sala 1927an de li bajarê Stenbolê tê dinyayê. Doza ku bi navê 49an dema ku gelek roşenbîrên Kurd hatibûn girtin di destpêkê de zêde di medyayê de deng nedabû. Bi alîkarîya Ayşe Hale û destgirtîya Medet Serhat, Senîha Xanimê nûçe û nameyan bi saya çend leşkerên li ber zindanê gihandibûn medyaya mixalif û partîyên mixalif da ku ji bûyerê haydar dibin.*
>
> *Medya û partîyên mixalif him li ser van kesên binçavkirî û him jî di Meclisê de behsa bûyerê kiribûn. Lewra yek ji wan kesên ku hatibûn binçavkirin jî M. Emîn Batu bû ku ew di zindanê de miribû. Heta wê deme jî ji alîyê dewletê ve nedixwestin kes bi vê bûyerê bihesin. Piştî ku partîyên muxalîf û medya bi bûyerên hesîyan doza 49an di dadgehê de vebûye (Temel, 2020: 78).*

Ayşe Hale Xanim pişgirîya doza xwe û zilamê xwe bi wê alîkarîya girîng derxistibû pêş. Keça Musa Anter, Rahşan Xanim bi hevpeyvîneke ya bi Bircan Değirmenci re di derheqê girîngîya dêya xwe ya li ser malbata xwe de wisa behs kirîye:

> *Dêya min Ayşe Hale jinek ji malbata Bedîrxanîyan bû. Li kolejek Avûstûryayê xwendîbû, keseke bi duçerxe û soberî baş dizanîbû û kesek burjuva bû. Weke her jinên malbata Bedîrxanîyan ew jî jinek dominant bû. Ji ber ku dapîra min mamoste bû, yek ji wan mamosteyên di dema komeleya Tirkîyê ava bûbû yekemîn bû. Li wîlayeta Çankirîyê mamostetî kiribû û keçê xwe jî bi wê hişmendîyê mezin kiribû. Ger ku Bedirxan Paşa û Kurd Musa Anter nebûya li ser dêya min jî ew hişmendî çênedibûn. Her çi qas gazin ji bavê min jî dikir lê her tim li paş wî disekinî. Ger ku kesekê cihê wî razanê tinebûya dihatin mala me, ger ku kesek bizewica jî dêya min bi meaşê xwe yê karmendîya dewletê dikir ji wan kesan re eşya distend. Dêya min Kurdbûna xwe ya him ji alîyê bavê xwe û him jî ya ji alîyê mêrê xwe bi serbilandayî meşand. (Değirmenci, 2020)*

Di van gotinan de jî diyar dibe ku girîngîya Ayşe Xanimê li ser jîyana Musa Anter û malbata wî gelekî çêbûye. Di sala 1945an de kurê wan Anter tête dinyayê. Kevneşopîya çandî di malbata Anter de jî dîyar dibe. Lewra kurê mezin ger ku kurê wî çêbibe bi gelemperî navê bavê xwe li wî dike. Musa Anter jî ji ber ku di malbata xwe de kurê mezin ew bû, wî navê bavê xwe li kurê xwe kiribû. Yanê navê kurê wî, ji navê bavê wî û bapîrê wî tê. Di sala 1948an de keça wan çêdibe û ji ber ku navê meta Musa Anter, Reşê bû xwestibû ku navê wê rake. Di wê demê de navên Kurdî ji ber ku ji alîyê hikumetê ve hatibûn qedexekirin ev mirada Musa Anter nahête cih. Ew jî navek nêzî navê meta xwe li keça xwe dike û navê wê jî dike Rahşan (Anter, 2016f: 57).

Di sala 1950an de jî kurek din ji wan re çêdibe. Di wan salan de Musa Anter berpirsyarê wargeha “Dicle Öğrenci Yurdu”yê bûye. Di nav Kurdên ku li Stenbolê dijîyan de bi mabesta bişibe roja Newrozê bi şev wek şevên Dîcleyê amade dikirin û dihatin ba hev û pîrozbahîya wê rojê dikirin. Di şeveke wisa de mizgînîya ku kurek ji wî re çêbûye tê û ji ber xatira wê şevê navê kurê xwe dike Dîcle (Anter, 2016f:57, 58). Kurê mezin, Anter Anter li Siwêdê dijîya û 20 meha îlonê 2024an de di roja mirina bavê xwe de çû ber dilovanîya Xwedê, keça wan Rahşan li Tirkîyeyê, li bajarê İzmîrê dijî û kurê wan Dîcle jî li bajarê Elîhê dijî. Di hevpeyvîneke Rahşan Anter de wisa behsa mirina dêya xwe kirîye: Dêya min Ayşe Hale di 18ê meha Kanûna Pêşîn ya sala 1998an de li Siwêdê ji ber ku bi êşa dil dilê wê sekinîye û çûye ser dilovanîya xwe (Kamer, 2022:205). Piştî mirina Musa Anter bi nêzî 6 sala xanima wî jî wefat kirîye û tirba wê li Siwêdê ye.

## 1.3. JÎYANA MUSA ANTER YA POLÎTÎK

Musa Anter dema ku li Stenbolê jiya li fikrên çepgirêyê hevnas dibe ku heta mirina xwe jî ew li ser wan fikrên xwe maye. Bi saya wargeha "Dicle TalebeYurdu" û wargeha xwendekarên "Özel Fırat Talebe Yurdu" ve yekîtîyek û xwenasînek polîtîk bi saya Musa Anter di nav xwendekarên Kurd de çêbûye. Ji bo ku xwendekarên Kurd fikr û ramanên kurdîtîyê bi wan re geş bibe jî ji alîyê roşenbîrên Kurd ve "Komeleya Xelaskirina Kurdan" tê avakirin. Ev komele ji alîyê Mustafa Remzî Bucak, Yusuf Azizoglû, Zîya Şerefxanoglû, Faîk Bucak û Musa Anter ve di sala 1948yan de tê avakirin. Komeleyek ne fermî bûye (Kalkan, 2006:21). Her çi qas fikrên Anter yên polîtîk sînorên wan dîyar bin jî piştî hevnasîna wî û xezûrî wî û zewaca wî ya bi Ayşe Hale re bêtir sînorên wî fireh bûne. Lewra malbata malxezûrî wî digihşte Bedirxanîyan û Ersîn Kalkan wê yekê wisa izah dike: "Kesên ku nivîskar an jî di nav sîyasetê de û di karê perwerdehîyê de li Tirkîyeyê bi her awayî dihatin nasîn bi malata malxezûrî Anter re têkildarin. Ji wan hinik kesan kesên wek Kamuan Bedirxan, Nazım Hikmet, Halide Edip, Vasıf Çınar, Cemal Kutay, Celadet Bedirxan, Fatih Rüştü Zorlu, Emre Gönensay, Meziyet Çınar û hwd. (Kalkan, 2006:22,23)." Ew kesên ku behsa wan hatine kirin hinek ji wan kesan bi gelemperî di nav pergalên dewletê de ji alîyê polîtîk ve cihên girîng girtine û hinek ji wan kesan jî xwe bi xebatên li ser edebîyatê derxistinin pêş. Dema ku em li pirtûka Musa Anter ya *Hatıralarım* dinhêrin hinek ji wan kesên ku me behsa wan kirîye jî navê wan derbas dibin. Ji alîyê firehbûn û pêşketina fikrên Anter yên polîtîk ev agahî wek delîlekê em di nivîsên wî de dibînin. Lê ji ber ku li Tirkîyeyê sîyaset li gor parastina yekalîtîyê dihate meşandin gelek roşenbîr li rêyên cudayê wê sîyasete digerîyan û xwe aîdê wê yekîtîyê nedîtin. Mûsa Anter jî yek ji wan kesên li hember wê yekalîtîyêye bi nivîsên xwe xuyayî me dike.

Dewleta Tirkîyeyê di bin sîwaneya partîyekê de meşîyabû û ramanên kesan her tim di bin qedexebûnê de bûn, roşenbîrên wê demê her tim li alternatîfekê gerîyabûn. Piştî ku di komeleya Tirkîyeyê de, di qada sîyasetê de biryara pirpartûbûnê tê dayîn ev biryar bûye alternatîfek ku Kurd bêtir bi sîyasetê têkildar bibin. Bilal Nergiz bi van gotinan behsa wê demê kirîye:

> *Di sala 1946an de, berîya hilbijartinê, Adnan Menderes diçe wargeha "Fırat Talebe Yurdu"yê û axaftinek wisa di navbera wî û Musa Anter de derbas dibe. Menderes daxwaza Musa Anter ya tevlî DPyê dike. Lê Musa Anter vê fikrê napejirîne. Ji ber partîya CHPyê li hemberê Kurdan gelek sîyaseteke ne baş û*

*xirab kiribû, ew jî wek her Kurdekî li hemberî partîya CHPê bû. Ji bo ku CHP winda bike jî çi ji destê wî bê ew dê bike, bi Menderes re parve dike. Anter tevlîbûyîna partîyan weke dîn û mezheban dibîne. Çawa ku kesek dînekî bipejirîne û xwe ayîdê wî dînî bibîne, nikare her dem dînê xwe biguherîne, kesên ku tevlî partîyekê bibe hewce ye zûbizû neguherîne. Musa Anter, DPê di wê demê de li gor fikr û ramanên xwe nabîne, ger ku di pêşerojê de li gor fikra wî pêşketinek çêbibe dibe ku wê demê ew û kesên mîna wî tevlî bibe. Bi vî awayî tête gotin ku axaftinek di navbera wî û Adnan Menderes re derbas bûye. (Nergiz, 2019: 154)*

Dema ku qanûnek ji bo pirpartîbûnê derdikeve û vekirina partîyan azad dibe, roşenbîrên Kurd jî li hember partîya yekem CHPyê disekinin û alîkarîyê didin DPê. Musa Anter jî bi nivîsên xwe gelê Kurd îqna dike da ku sîyaseta Tirkan dest biguherîne.

Di hilbijartina sala 1950an de li rojhilatê Tirkîyeyê DP bi ser dikeve û paşê jî hikumet dikeve destê DPyê. Lê di demek nêz de rêxistina DPyê dûrî fikrên xwe dibînin û Kurd ji DPyê jî dûr dikevin. Di sala 1965an de hevalên Musa Anter yên ku di partîya TÎPê (Türkiye İşçi Partisi) de ji bo wekîltîya Mêrdînê daxwaza namzetîyê ji Musa Anter dikin. Lê ji ber pirsgirêkên ku ne di destê wan de çêdibe, Musa Anter ji vê biryarê vedigere. Musa Anter bi tena serê xwe, yanê ne di bin sîwaneke partîyekê de daxilî hilbijartina sala 1965an dibe lê bi ser nakeve.

Ji aliyê din ve di navbera salên 1969-1970ê de gelek sîyasetmedarên Kurd ji partîya TÎPê vediqetin û tevlî roşenbîr û xwendekarên Kurd dibin û yek ji wan jî Musa Anter bû ku DDKO “Devrimci Doğu Kültür Ocakları” vekirine. Di 12 meha Adarê ya 1972yan de ji ber DDKOyê dozek li wan kesên ku namzedên vê sazîyê bûn, vebûye. Musa Anter bi wê sedemê hatibû girtin û çar salan ceza stendibû. Musa Anter paşê bi efûyê derketîye. Aslan Kılıç wisa behsa jîyana Musa Anter ya polîtîk kirîye:

*Musa Anter roşenbîr û sîyasetmedarekî Kurd e. Her çi qas kesekî sîyasetmedar bû jî bi ti awayî di nav tevgerên sazî û partîyên sîyasî de cih negirtîye, bi ti awayî nebûye endamê sazîyekê yan jî partîyekê. Musa Anter, di jîyana xwe ya 50 salan de bi ti awayî ger ku sazîyên sosyalist, kapîtalîst, burjuva, feodal, Kurd, Tirk, Tîp, DDKO, TKDP-T, Hep û hwd. bi ti awayî endamê van partî û sazîyan nebûye. (Kılıç, 2012: 9)*

Lê dema ku me lêkolîn kir endambûyîna Musa Anter ya sazî û partîyên sîyasî derket pêş me. Yavuz Çamlıbel li ser endambûyîna Musa Anter ya DDKOyê wisa gotîye:

*Di derheqê cezagirtina sazîya DDKOyê de Musa Anter ev agahîyene dane. Sazîya DDKOyê di sala 1969an de li Enqerê hatîye damezarandin. Dema ku teklîfa endambûyîna sazîyê ji Musa Anter re pêşnîyar dibe Musa Anter pêşnîyarê*

*dipejirîne. Sazîya DDKOyê heta ku hate girtin jî dibêje ku ez endamê wê sazîyê bûm. (Çamlıbel, 2010: 55)*

Di sala 1990î de bi vekirina partîya HEPê, Musa Anter carek din ketîye nav sîyasetê û yek ji wan kesan e ku yên ev partî vekirine. Lê Musa Anter rolek çalak nagire ser milên xwe lewra ew bêtir bi alîyê nivîsên xwe ve derdikeve pêş. Heta ku çûye ser dilovanîya xwe jî bi wî şiklî di nav tekoşîna jîyanê de jîyana xwe ya polîtîk meşandîye.

## 1.4. ROJNAMEGERÎYA MUSA ANTER

Rojnamegerîya Kurdî li Tirkîyeyê di navbera salên 1920an û 1950yî de ji ber şertên sîyasî astengîyan kişandibûn. Li Tirkiyê rejîmek komeletîyê ava bûye û di qada sîyasetê de jî yek partî hikim li sîyasetê kiribû. Hikimê yek partîyê bi gelemperî li ser parastina Tirkbûyînê bû. Parastina Tirkbûyînê astengî li gelê Kurd jî kiribû. Çapamenî û weşandina bi zimanê Kurdî ji ber yek partîbûnê li Tirkîyeyê di bin sîwana qedexebûnê de asteng mabû. Berîya sala 1950yî li bakurê Kurdistanê bi saya çend roşenbîrên Kurd, di destpêkê de weşanxane û çapkirina rojname û kovaran carek din hêdî hêdî dest bi xebatan kiribûn. Ji wan roşenbîran jî bi hêza xwe navê Musa Anter derketîye pêş. Di kovara *Lêkolîn a Înstûtîya Kurdî* de wisa behsa girîngîya Musa Anter ya li ser çapamenîya Kurdî kirîye:

> *Ji sala 1920´an heta bi sala 1950´î Tirkiye fersend nedaye ku kurd rojname û kovaran derxin.Belê ji vê salê û pê de mirov pêjna çend hewlên biçûk dike. Ev jî mohra Apê Mûsa Enter hildigrin. Rojnamgeriya Kurd careke din çavên xwe vedike û herçendî çend carên din jî his û pêjin jê dibire jî, belê bêdengî û kerrayî zêde najo, zêde dirêjnake û bi ketin û rabûn be jî heta bi zemanê me tê û bi salên 90´î û piştretir re berdewamiyê zeft dike. Tu li eslê wê binerî, mirov ji bo rojnamgeriya qonaxa piştî 1920´an divê bêje rojnamgeriya Mûsa Anter. Mûsa Anter mohra xwe li vê demê dide, ev qonax li Bakur mohra Mûsa hildigre. (Lêkolîn, 2010: 38)*

Musa Anter di sala 1948an de li Stenbolê çapxaneyekê vekiribû û di wê çapxaneyê de rojnameya bi navê *Dicle Kaynağı*yê çap kiribû. Anter, di wê rojnameyê de nivîsandibû û rojname şandibû rojhilatê Tirkîyeyê. Ev rojname, ji alîye sê xwendekarên ku di wargeha “Dicle Talebe Yurdu”yê de bûn, hatibû derxistin û Musa Anter tê de nivîsên xwe parve kiribû. Ew her sê kes; Hüseyin Dikici, Talat Saygın û Veli Dolu bûn. Musa Anter paşê biryar dide ku rojnameya *Dicle Kaynağı*yê mabesta xwe anîtîye cih û di sala 1951an de weşandina rojnameya *Dicle Kaynağı*yê bi dawî anîtîye.

Anter, bi Kemal Sülker re kovara *Şark Mecmuası* çap kirîye. Ew kovar jî ji mehê carekê derdikeve lê piştî du hijmaran kovara *Şark Mecmuası*yê jî weşana wê bi dawî dibe. Kerem Yavaşça wisa behsa kovara *Şark Mecmuası*yê kirîye:

> *Bi armanca ji kesên Rojhilatê re behsa Beyaneta Mafê Mirovan û wan ji vê yeke haydar bike, hatîye derketin. Zilmên ku di dema partîya CHPê de li Kurdan hatibûn kirin di vê kovarê de dianîn ziman. Him ji ber westandina karê çapamenîye û him jî fikra ku li Rojhilat be dê fêda wî li gel bêtir bibe bi Musa Anter re çêdibe. Paşê kovarê jî digire û çapxaneyî jî difroşe û tê gundê xwe. (Yavaşça, 2013: 50)*

Anter, demekê li gundê xwe jîyana xwe didomîne. Musa Anter di sala 1954an de li Amedê bi nivîsên xwe daxilî rojnameya bi navê *Şark Postası*yê dibe. Di dû demekê de bi pêşnîyarîya hevalên xwe nivîsên xwe di rojnameya *İleri Yurt*ê de parve dike û kuncenivîskarîyê dike.

Musa Anter, dema ku di rojnameya *İleri Yurt*ê de dinivîse û helbestek bi navê *Qimil* parve dike, bala desthilatdaran bêtir dikeşîne ser xwe. Lewra zimanê Kurdî di wê demê de qedexe bû. Di wan salan de doza bi navê 49an derdikeve rojevê. Di destpêkê de 50 roşenbîrên Kurd tên binçavkirin û dikevin zindanê, paşê jî yek ji wan kesan di zindanê de diçe ser dilovanîya xwe û navê doza wan jî bi vî şiklî rast dibe. Ahmet Alış wisa behsa rojnamegerîya Musa Anter dike:

> *Di sala 1960î de li Tirkîyeyê leşker dest datîne ser sîyasetê û serokê DPyê û çend endamên partîyê têne xeniqandin. Doza 49an jî wisa diqede. Paşê ji derketina zindanê Musa anter di sala 1961an de di rojnameya Bariş Dunyasiyê de dest bi nivîsînê dike. Di dû demekê re di rojnameya Dîcle-Firatê de dest bi nivîsînê dike. Di sala 1963yan de nivîsên wî yên di rojnameya Dîcle-Firatê, paşê jî rojnameya Bilinmeyen Doğu û kovara Deng de dibe sedema ku doza 23yan li roşenbîrên Kurd vebibe (Alış, 2010).*

Anter di sala 1969an de *rojnameya bi navê Doğu* derdixe û paşê carek din tête girtin. Di sala 1976an vedigere gundê xwe. Piştî ku di sala 1980yî de eskerîyê dest danî ser sîyasetê carek din tê girtin û paşê têt berdan. Di sala 1989an de carek din vedigere bajarê Stenbolê. Di kovarên bi navê *2000'e Doğru, Medya Güneşi*, *Deng* de nivîsên wî derdikevin. Yaşar Kaya derheqê nivîsên Musa Anter yên di kovar û rojnameyan de wisa behs dike:

> *Di 20ê Cotmeha sala 1990î de nivîsên wî her heftîyê di rojnameya Yeni Ülkeyê de derdiket. Ji xeynî vê rojnameyê,di kovar û rojnameyên bi navê Welat, Özgür Gündem, Rewşen, Tewlo de dinivîsî. Di 20 Îlonê ya sala 1992yan de, berê ku were kuştin di rojnameya Yeni Ülke, Özgür Gündem û Welat de dinivîsî (Kaya, 1993: 7,8).*

Ji xeynî wan kovar û rojnameyan, li gor lêkolîna ku me kirîye Musa Anter kovarek bi navê *Mezopotamya* derxistîye û ev kovar di dema Komeleya Tirkîyeyê de yekem e ku bi Kurdî hatîye nivîsîn. Em dê di bin beşa berhemên Musa Anter de behsa kovara "Mezopotamya"yê bikin. Anter bi nivîsên xwe yên di kovar û rojnameyan de him bala gel kişandibû ser xwe û him jî bala dewletê kişandibû ser xwe. Musa Anter têkoşîna xwe ya li hember neheqîyê di nivîsên xwe de dîyar kiribû. Em dê bi baldarî li ser armanca nivîskarîya Musa Anter bisekinin û têkoşîna wî ya ji bo wekhevîyê bi alîyê wî yê nivîskarîyê ve analîz bikin.

## 1.5. NIVÎSKARÎYA MUSA ANTER

Musa Anter di destpêka nivîskarîyê de ewil bi kuncenivîsan dest bi nivîsandinê kirîye. Di nivîsên xwe de zimanekî gelek fêhmker bi kar anîye. Bi gelemperî bi saya metodekî hîcwî balê kişîne ser nivîsên xwe.

Meseleyên balkêş girêdayî fikra ku bahs dike û ew meselokên di nivîsên xwe yên hicwî de bi kar diîna bêtir xwîner kişandîye nav mijara xwe. Musa Anter di 4-10ê Cotmeha sala 1992yan de bi van gotinan behsa nivîskarîya xwe kirîye: "Nivîskar divê berhemên xwe ji serê xwe derxe û fikr ya wî bi xwe be." Xwe wek nivîskarekî nabîne, xwe dişibîne zabitekî dadgehê. Çawa ku hakim hemû tiştî dibêje û katib dinivîse paşê jî destnîşana wî li binê tiştê ku nivîsandibe jî lê biryar ne ya wî ye. Ji ber ku mesele ew qas li Tirkîyeyê gelek in hewcedarîya nivîskaran namîne ku meseleyek nû derxin holê.

Êş, elem, xizanî, neheqî û hwd ew qas li derdorê gelek e ku ger kesek bixwaze wan pirsgirêkan tenê bihevde jî dikarin bi cildan nivîsan binivîsîne. Anter jîyana xwe weke mînakekê daye: "Çawa ku heta 70 salîya min di jîyana min de êş, elem, zindan, zilm kêm nebûye, nivîsandina van tiştên ku hatîye kişandin dê çawa xelas bibe? (Anter, 2013b: 73)." Ger ku li welatekî ew qas neheqî hebe nivîskar li ser wan bûyeran dikarin di rojekê de pirtûkekê jî binivîsin. Xwe û berhema xwe ya *Birîna Reş* mînak dide ku çawa di şevekê de nivîsandîye bi lêv dike. Vê yekê weke taybetîyeke xwe tenê nabîne, kesên ku li Tirkîyeyê dijîn û xwedî hişmendî bin wisa behsa wan kesan kirîye: Kesên ku li dervê Tirkîyeyê dema ku li nivîskarên li ser vê axê dinihêrin weke afîreneran wan dibînin. Dibêje "Çawa ku heyetek Ewropayî tê li ser Tirkîyê hinek lêkolîn dikin û paşê jî bi Aziz Nesin re di axavtina xwe de ji Azîz Nesîn re bi lêv dikin ku me wî wek nivîskarekî mezin didîtin lê dema ku me li welatê Tirkîyeyê lêkolîn kir, em dibînin ku te

hew tiştên welatê xwe nivîsandîye.” Li gor nivîskarê welatê Ewropayê nivîskarên li Tirkîyê bêtir bi siûd dibîne. Lewra li welatê Ewropa ne xizanî, ne neheqî, ne îşkence heye. Ger ku tiştek din jî binivîsîne dibe ku bala kesan nekişîne. Yanê weke ku tu ji kesekî têr re behsa xwarinê bikî, ew dê çawa balê bikişîne?

Musa Anter nivîsên xwe weke ku ji kesên birçî re behsa xwarinê bike dibîne. Ji ber ku gel birçîyê tiştên bahs dike bala gel dikişîne. Ji nivîskarîya xwe hez dike, lewra derd û kederên miletê xwe bêtirs û bêderew dinivîse. Ji ber vê yekê ji alîyê gel ve tête ecibandin, bi lêv kirîye.

Ji alîyê gelek kesan ve ji Musa Anter re tête pirsîn ku çima nivîsên te her tim li ser xemgînî, êş û elemê ye? Pirsêk di cih de dibîne û bûyerên di jîyana wî de çêbûye û heta jî niha çêdibe dê çawa bihêlin ku kesek mîna wî dê behsa aramî, xweşî û kêyfxweşîyê bike? (Anter, 2013b: 73,74).

Destpêka ji dayîkbûna wî di dema fermana neteweyekî de çêbûye û ew bûyer ji wî re bûye salek nîşandar. Di nav temenê wî de împaratoriyek hilweşîyaye û kesên ku xwe warisê wê împaratorîyê dîtîne jî, zixta wan ya li ser gel her tim dîyar kirine.

Bûyera Şêx Seîd, Agirî, Zîlan, Sason, Omerya û Dêrsim... Hemû bi qetlîam û bi xwînê hatîye safîkirin. Musa Anter ji ber ku li ser neheqîya li gel hatîye kirin û tengasîya ku gel tê de bû nivîsandiye. Tahir Baykuşak bi van gotinan behsa girîngîya nivîsên Anter kirîye: Dema komeleya Tirkîyeyê ava bû û di sala 1925an paşê jî di sala 1938an de ji ber bûyerên hatine serên kurdan zixtên dewletê zêde bûne û roşenbîrên Kurd ji ber zixt û zordestîyê bêdeng mane. Heta sala 1960î jî hebûna Kurdan û zimanê wan jî wek serbixe ji alîyê dewletê ve nehatîye pejirandin. Hinek roşenbîrên Kurd li ber polîtîkaya dewletê bi nivîsên xwe bertek didan. Ji wan roşenbîran yek jê Musa Anter e. Anter mîna arkeologekî li ser pirsgirêkên gel xebitîye û ji ber ku dema hatibû Stenbolê têkilî bi roşenbîrên Kurd yên dema dewleta Osmanî re danîye di derheqên Kurdan de gelek agahî bi dest xistîye. Musa Anter di nivîsên xwe de agahîyên ku bi dest xistîye parve kirîye û roşenbîrên Kurd yên dema komeleya Tirkîyeyê ji civaka Kurd bêtir haydar kirîye. Musa Anter bi saya xebat û nivîsên xwe him gel agahdar kirîye himjî ji gel û roşenbîren Kurd yên dema komeleya Tirkîyeyê bûye pirek girîng (Baykuşak, 2022: 426).

Di axaftineke di navbera Firat Cewerî û Musa Anter de, li ser pirsa Firat Cewerî ya di derheqê nivîskarîya Musa Anter de ji alîyê Musa Anter ve wisa tête bersivandin: Musa Anter xwe wek nivîskarekî polîtîk dîtîye. Sîyasetê di çarçoveya mîzahê de şirove kirîye. Ji ber ku fikr û ramanên xwe bi zimanekî dîyarkirî nedikarî bîne ziman, fikr û ramanên xwe bi rêya mîzahê anîye ziman. Musa Anter dema ku behsa nivîsîna xwe û berhemên xwe jî dike, dibêje ku “Ez ne çekdarek im û ordîyeke min jî nîn e. Ji ber ku min neheqî nepejirand, min hewcedarî bi nivîsînê anîye.” Ji ber ku ji malbata wî hinek kes li hêla sînor (rojavayê Tirkîyê) bûn. Yanê dema ku sînorên dewleta Tirkîyê û Sûrîyê hate avakirin mirovên Musa Anter hinek ji wan li hêla dewleta Sûrîyê dimînin. Ev yek dibe sedem ku Musa Anter biçe ba wan. Dema ku diçe ba mirovê xwe, roşenbîrên Kurd yên li Sûrîyê diman kovara *Hawar* û *Ronahî* di wê demê de çap dikirin. Musa Anter di bin bandora roşenbîrên ku di wan kovaran de dinivîsandin dimîne. Kesên ku weke Celadet, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Qedrîcan nas dike biryara nivîsandinê di wê demê de dide. Lê paşê vedigere Stenbolê û di sala 1948an de bi rojnameya *Dicle Kaynağı*yê dest bi karê çapkirin û nivîsandinê dike (Uzun, 2007: 302-303).

Musa Anter bi vê gotinê behsa xwe dike: “Xwezî ez mezin nebûma (Anter, 2013e: 144).” Musa Anter di sala 1937an de tête binçavkirin û heta temenê ku tête kuştin jî her tim doz li wî têne vekirin. Ya baş wê dibîne ku ji ber ku temenê wî mezin e weke berê îşkenceyan li wî nakin. Nivîsandinê ne weke ku şêranîya li paş kesên mirî ve tê dayîn dibîne. Heta ku welatê me di bin destê desthilatdarîya faşizan û zilmkar de be hewce ye ku nivîsên kesên weke wî jî dibe bi vî rengî be. Ger ku zilmkarî li ser welat rabe ew dem dikarin nivîsên aramî û dilxweşîyê binivîsînin. Di 12 meha Qanûna Paşîn ya sala 1991an de di sernivîsa xwe ya *Yazılarım*ê “Nivîsên min” de wisa behsa nivîskarîya xwe kiribû (Anter 2013e: 144-145). Kesên ku bi zimanê xwe nenivîsîne, çi qas pisporîya wî di zimanê duyemîn de hebe jî di pêşkêşkirina hestên xwe de dibe ku kêmasîyê bikeşîne.

Ev yek jî bandorê li taybetîya kesayeta kesên ku bi zimanê xwe nanivîsîne dike. Lewra bi zimanê xwe yê yekem difikire û li gor zimanê duyem xwe sînor dike. Musa Anter jî yek ji wan kesên ku bi zimanê Kurdî difikirî û nivîsên wî bi zimanê Tirkî bûn. Musa Anter li ser vê mijarê fikrên xwe wisa dîyar dike: Li welatê Tirkîyeyê desthilatdaran çawa ku zimanê Kurdî nedipejirandin, nivîsandina bi zimanê Kurdî jî qedexe dikirin. Yanê kesên ku bi Kurdî binivîsîne ji alîyê desthilatdarên dewletê ve ceza

li wan kesan ve dihate birîn. Ji ber vê sedemê jî nivîsandina kesên ku bi eslê xwe Kurd in û bi zimanê Tirkî dinivîsînin zêde serkeftî nabîne.

Li gor fikra Musa Anter ji ber ku malbata zimanê Tirkî û malbata zimanê Kurdî ne yek in, kesên ku Kurd in û bi zimanê Tirkî dinivîsînin tengasîyê di ragihandinê de dikişînin. Ji ber taybetîya ku zimanê Tirkî ji malbatek zimanê Ewropayî cuda ye, hevoksazî û rêziman jî bandoreke neyînî li ser kesên wekî wî dike. Musa Anter li gor fikra xwe zimanê Tirkî ji xwe re qels dibîne. Qelsbûyîna ziman ne ku bi mabesta kêmanîya ziman dibîne, ji ber ku qaîdeyên zimanê Tirkî û Kurdî ne li gor hev in lewma wisa difikire, diîne ziman (Anter, 1989: 56-57).

### 1.6. JÎYANA MUSA ANTER YA EDEBÎ

Musa Anter di destpêkê de di rojname û kovaran de bi kuncenivîsîyê dest bi nivîsandinê kirîye. Berhema Musa Anter ya yekem bi navê *Qimil* di sala 1962yan de hatîye çapkirin. Girîngîya vê berhemê ew e ku dema qedexebûn û astengbûna li ser zimanê Kurdî heyî, bi zimanê Kurdî ji alîyê Musa Anter ve tê nivîsîn.

Berhema Musa Anter ya duyem jî *Birîna Reş* e. Ev berhema Anter di sala 1959an de hatîye nivîsîn û berhema *Birîna reş* di sala 1965an de tê çapkirin. Bûyerên di vê berhemê de derbas dibin, zilm û tengasîya ku gelê Kurd tê de ye derdixe ber çavan. Lewra di wê demê de ji alîyê hikumeta DPyê ve genimê ku dermankirî li gel tê belavkirin.

Ji ber ku xeternaka genimê dermankirî bi gel re nayê parvekirin, gel jî ji xizanî û nezanîya xwe genimên dermankirî dixwe û ji ber vê sedemê jî nexweşî û mirin di nav gel de gelek çêdibe.

Di nav gel de ev nexweşî bi navê *Birîna Reş* tête binavkirin. Musa Anter berhema xwe ya bi navê *Birîna Reş* di dema doza 49an de di zindana leşkerîyê ya bi navê Harbîyeyê, di demeke kurt de dinivîse. Berhema sêyemîn ya Musa Anter, *Ferhenga Khurdî û Tirkî* ye. Musa Anter vê pirtûkê di salên 1963yan de dema ku di zindana leşkerî ya Mamakê de nivîsîye. Ev ferheng, nêzî yazde hezar peyvan pêk tê. Musa Anter di vê berhemê de behsa zimanê kurdî û alfabeyên ku kurdan pêk anîye dike. Ev pirtûka *Ferhenga Kurdî û Tirkî* di sala 1967an tête çapkirin.

Berhema Musa Anter ya çarem jî *Hatıralarım-I* û *Hatıralarım-II* ye. Berhema *Hatıralarım-I* di sala 1991ê de û berhema *Hatıralarım-II* jî di sala 1992an de hatîye çapkirin. Navaroka ev herdu berhemên Anter ji jîyan û bîranînên Musa Anter pêk tê. Me ev herdu berhem di cildekê de weke çavkanîyekê pejirand û wisa di çavkanîyên xwe de dîyar kirin.

Berhema Musa Anter ya pêncemîn *Vakayiname* ye. Berhema *Vakayiname* ji nivîsên Musa Anter yên di navbera salên 1987-1992yan ve dema ku li Nisêbîn û Stenbolê-Dragosê bû, pêk tê. Berhema *Vakayiname* di sala 1992yan de berhema Musa Anter ya pêncemîn tê çapkirin.

Berhema Musa Anter ya şeşemîn jî *Fırat Marmaraya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları* ye. Nivîsên Musa Anter yên di rojnameya *Ülke û Gündem*ê de derketîye di vê berhemê de cih digirin. Berhema Musa Anter ya *Fırat Marmara'ya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları* di sala 1996an de tê çapkirin.

Berhema Musa Anter ya heftemîn *Çinara Min* e. Ev berhem piştî ku Musa Anter tê kuştin nivîsên wî tên berhevkirin û di sala 1999an de weke pirtûk tê çapkirin. Ji xeynî van berhemên ku me nivîsandîye, li gor lêkolîna ku me kirîye navê çend berhemên din jî derkete pêş me. Lê bi ti awayî me ew berheman bi dest nexistin. Ew berhem hinek ji wan di pirtûka Musa Anter ya bi navê *Ferhenga Kurdî û Tirkî* de behsa wan dibe, ev in: *Kunca 38.* (38 nolu Hücre), *Bêçemkan* (Yarasalar), *Gramatiko Zimanê Khurdi* (Kürt Dil Bilgisi) (Anter, 1965: 178). Di paş berhema xwe ya *Ferhenga Kurdî û Tirkî* de behsa van pirtûkan dike. Ji xeynî van berheman di sala 1990î de bi hevpeyvîneke bi Fırat Cewerî re behsa pirtûkeke xwe ya bi navê *Wê Şevê Reş Bû* jî dike û wek li ber çapkirinê ye tîne ziman.

Dema ku behsa hinek berhemên xwe dike, behsa polîsan dest dayîne ser hinek berhemên ku wî nivîsandine jî kirîye (Uzun, 2007: 304). Ixtimala ku ev berhemên wenda di wan salan de hatine çapkirin an jî dê bên çapkirin tîne hişê me.

Wek ku nivîskar jî anîtîye ziman dibe ku dema polîsan dest daye ser berhemên wî û bi destê polîsan jî hatibin wendakirin. Musa Anter him di berhemên xwe de û him jî di roportajên xwe de sedemên xizanî û tengasîya gel girêdayî polîtîkaya desthilatdaran dikir. Xeletîyên polîtîkayê him di dema Osmanlîyê de û him jî bi avakirina Komeleya Tirkîyeyê ve di demên dîrokê de bûye sedema bûyerên girîng.

Gîrîngî û tesîra bûyeran em di nivîsên Anter de bandora wan zêdetir li ber çavan dibînin. Ji bo ku em berhem û nivîsên Anter analîz bikin divê em bûyerên ku hatîne serê gel bizanîbin. Em dê li ser, ger di 80 salîya temenê Anter de û ger jî di dema Osmanlîyê de bûyerên girîng yên li jîyana Anter bandor kirine di çarçoveya mijara xwe de behs bikin.

## 1.7. DI JÎYANA MUSA ANTER DE BÛYERÊN GIRÎNG

Ger ku bûyerên di dema Musa Anter de çê bûyê û ger ku jî bûyerên berîya jîyana wî çê bûye bandorek li ser jîyana wî çê kiribû. Çawa ku dema behsa ji dayîkbûna xwe kirîye nîşaneke trajedîyeke mezin kiribû. Lewra di wan salan de him êrîşa dewleta Ûris ya li ser Rojhilatê Tirkîyeyê dibe û gelek Kurd ji bajarên Serhedê derdikevin û wek penaberan li bajarên Rojhilatê Tirkîyeyê belav dibin. Paş vê bûyerê jî fermana Ermenan radibe û welatê ku Anter lê jîyabû, dibe cihê qetlîam û xwînrijandinê. Lewra Musa Anter her ku dema behsa ji dayîkbûna xwe kirîye ev bûyerên trajedîk jî bi wî re tête li ser ziman. Piştî bûyera Ermenan di sala 1925an de bûyera Şêx Seîd çêbûye di encama vê bûyerê de jî gelek alim û kesên di civakê de pêşketî tên qetilkirin û tên sirgunkirin.

Paşê bûyera li Agirî û gelîyê Zîlan çêbûye, di encama vê bûyerê de jî qetilkirin û sirgunek mezin li gelê Kurd çêbûye. Di navbera salên 1936-1938an de jî bûyera Dêrsimê çêbûye dema ku ev bûyer çêdibe Musa Anter li Edenê xwendekarê dibisana lîseyê ye û ev bûyer bûye sedema yekemîn ku Musa Anter binçav bibe. Veysel Dinçer wisa behsa bûyera Dêrsim û binçavkirina Anter kirîye: “Salên bûyera Dersimê çêdibe Musa Anter li bajarê Edenê xwendekarê lîseyê bûye. Ji ber ku kesên di pola wî de dizanîbûn Musa Anter Kurd e, hinek ji wan kesan ji bo ku wî aciz bikin dijûn ji xanima Seyîd Riza, ji Besê Xanimê re dikin û Musa Anter jî li hemberê wan dijûnan ew jî ji dêya Atatürk re dijûnan dike. Paşê ji alîyê Atatürk ve tête bexşandin (Dinçer, 2015).” Ew dijûn jî dibe sedemê yekemîn ya binçavkirina Musa Anter û him jî bêtir xwenaskirina Kurdîbûyîna wî.

Musa Anter dibistana lîseyê li Edenê xilas kirîye û bi mabesta xwendina zanîngehê çûye bajarê Stenbolê. Li bajarê Stenbolê bêtir fikra wî ya kurdewarîyê geş dibe him bi wazîfeya berpirsarîya “Dicle Talebe yurdu”yê û him jî bi hevnaskirina Abdurrahîm Zaps bi her awayî bandorekê li jîyana Musa Anter çêkirîye. Di sala 1944an de bi keça Abdurrahîm Zapsu A. Hale Zapsu re zewicîye û bi têkildarîya malxezûrê xwe

malbata Bedirxanîyan bêtir nas kirîye. Di sala 1959an de bi nivîsa helbesta *Qimil* re doz li wî vebûye û paşê jî bi doza 49an tête girtin. Paşê bi doza 23an carek din tête girtin. Heta ku diçe ber rehma Xwedê jî her tim doz û girtin di temenê wî de cih girtîye.

Bûyerek ya herî girîng jî di 16yê Adara sala 1988an de bûyera Helebçeyê ye. Musa Anter bûye şahidê vê bûyerê jî. Bûyera Helebçeyê ji alîyê dewleta Iraqê ve bi çekên mezin û kîmyewî, êrîşî neteweya Kurd ya di nav sînorê dewleta Iraqê de dijîya kiribû. Di encama bûyera Helepçeyê de li gor raporên komeleya mafên mirovan nêzîkê pênc hezar Kurd hatine qetlkirin. Kesên ku ji ber zilm û kuştina dewleta Iraqê revîyan xwe li dewleta Tirkîyeyê girtibûn. Penaberên ku xwe li dewleta Tirkîyeyê girtibûn ji alîyê hikumeta Tirkîyeyê ve li qampan hatibûne bicihkirin. Ji ber ku penaberên di qampên Tirkîyeyê de di şertên ne li gor mirovahîyê jîyabûn gelek nivîskar û roşenbîrên Kurd bertek dane li ber vê rêxistina li hember mirovên penaber hatîye kirin. Yek ji wan kesên ku bertek dabû jî nivîskar Musa Anter bû.

Dewleta Tirkîyeyê dema ku behsa Kurdan dihate kirin di destpêkê de Kurd jî wek Tirkan didîtin yanê hebûna Kurdan nedipejirandin û li gor dewletê Kurd nînin ew jî Tirk in dihate gotin. Musa Anter li hember nepejirandina Kurdan bi van gotinan berteka xwe anîtîye ziman: Anter gotîye ger ku Kurd tine ye û li gor fikra dewletê jî Kurd Tirk in, hewce ye ku dewleta Tirkan li wan Kurdên ku ji ber zilma dewleta Iraqê revîyane û bûne penaberê Tirkîyeyê xwedî derkeve û muameleya penaberîyê li wan neke. Na, ger ku Kurd ne Tirk e û Kurd ji Tirkan re weke bira tête dîtin hewce ye ku carek din jî li birayê xwe xwedî derkevin. Çawa ku Tirkmenên li ser erdnîgarîya Bilxarîstanê dema ku ketin tengasîyê dewleta Tirkan digot ew neteweyên Tirk in û li wan xwedî derket çima li Kurdan jî vê xwedîderketin çênabe? Ji bo Tirkên li Qibrisê dijîyan Tirkiye ket herbê lê bi çavê penaberan li Kurdên ku ji ber zilmê revîyane dinihêre.

Dema ku Tirkên ji dewleta Bilxar revîyan û xwe li Tirkiyê girtin him sazîyên girêdayî dewletê weke TRTyê û him jî gel alîkarîya wan penaberan kiribûn. Lê dema ku penaber Kurd bûn dewleta Tirkan nehiştibû gel zêde bibe alîkar û ne jî dewlet alîkarîyek bi rêkûpêk nedabû wan. Anter ji ber vê nakoktîyê sîyasetmedarên Tirkîyeyê û rêxistina wan ya li hember Kurdan rexne kiribû (Anter, 1990: 42-43). Sîyaseta bi fikrên asîmîlasyonê û înkarkirinê di gelek deman de pêşîya serhiladana gelê Kurd ya li hember dewletê vekiribû. Di encama serhildanan de jî xwînrijandina gel û zextên dewletê yên li

ser Kurdan bi tûndî domîyabû. Serhildanên Kurdan yên ku di dema Osmanlî û dema Komêleya Tirkîyeyê de heta salên 1938an pêk hatîye ji bo zelalkirina mijarê em dê behs bikin.

Hemû bûyerên ku hatine serê Kurdan ji Musa Anter re bûye mijar û bandor li fikr û ramanên wî kirîye. Ji bo ku Musa Anter bête fêhmkirin divê em behsa bûyerên hatine serê Kurdan bikin.

### 1.7.1. Bûyerên ji Dema Dewleta Osmanî û Heta Sala 1938an

Musa Anter kesekî ji dîrokê jî haydar bû. Anter dema ku behsa bûyeran kirîye bi saya agahîyên ku ji dîrokê kom kiribû û zilma ku li Kurdan hatibû kirin bi zaneyî anîtîye ziman. Ji bo ku em fikr û ramanên Musa Anter bêtir fêhm bikin hewce ye ku hinek bûyerên di dîrokê de li ser Kurdan çi bandor kirine em bizanîbin û li gor wê mabesta Musa Anter fêhm bikin. Ji ber ku ev mijar bi alîyê firehbûna xwe dibe ku çarçoveya mijara me derbas bike, em dê jî li gor vê hişmendîyê mijarê kurt bigrin. Lê ji bo em mabesta nivîsên Musa Anter fêhm bikin jî em pêwîst dibînin ku bûyer û dema wan bûyeran bi awayekî kronolojîk dîyar bikin.

Leşkerek ku piştî ji leşkerîyê teqawîd dibe belgeyên ku di arşîva “Genel Kurmay” de ye bi rojnamevan M. Ali Birand re parve kiribû. Di wan belgeyan de serhildanên Kurdan yên li hember Dewleta Osmanî û Komeleya Tirkîyê çêbûne cih digire. Rojnamevanê Tirk M. Ali Birand di 3yê Kanûna Paşîn ya 2003yan de wisa behsa wan bûyeran kirîye:

**-Serhildanên di Dema Dewleta Osmanîyan de çêbûne:**

*Babanzade Abdurrahman Paşa İsyanı (1806- Musul)

*Babanzade Ahmet Paşa İsyanı (1812 – Musul)

*Zaza’ların İsyanı (1820)

*Yezidilerin İsyanı (1830- Hakkari)

*Şerefhan İsyanı (1831- Bitlis)

*Bedirhan İsyanı (1835- Botan)

*Garzan İsyanı (1839- Diyarbakır)

*Ubeydullah İsyanı (1881- Hakkari)

*Bedirhan Osman Paşa ve kardeşi Hüseyin Paşa İsyanı (1872-Mardin-Cizre)

*Bedirhan Emin Ali İsyanı (1889- Erzincan)

*Bedirhaniler ve Halil Rema İsyanı (1912-Mardin)

*Şeyh Selim Şehabettin ve Ali İsyanı (1912- Bitlis)

*Koşgari İsyanı (1920- Koşgiri)

**-Serhildanên di Dema Komeleya Tirkîyê de çêbûne:**

*Nasturi İsyanı (1924- Hakkari)

*Jilyan İsyanı (1926- Siirt)

*Şeyh Sait İsyanı (1925- Bingöl-Muş-Diyarbakır)

*Seit Taha ve Seit Abdullah İsyanı (1925-Şemdinli)

*Reşkotan ve Reman İsyanı (1925- Diyarbakır)

*Eruh'lu Yakup Ağa ve oğulları (1926-Pervani)

*Güyan İsyanı (1926-Siirt)

*Haco İsyanı (1926- Nusaybin)

*I. Ağrı İsyanı (1926)

*Koçuşağı İsyanı (1926- Silvan)

*Hakkari- Beytüşşebab İsyanı (1926)

*Mutki İsyanı (1927- Bitlis)

*II. Ağrı İsyanı

*Biçar Harekatı (1927- Silvan)

*Zilanlı Resul Ağa İsyanı (1929- Eruh)

*Zeylan İsyanı (1930- Van)

*Tutaklı Ali Can İsyanı (1930- Tutak-Bulanık-Hınıs)

*Oramar İsyanı (1930- Van)

*III. Ağrı Harekatı (1930)

*Buban Aşireti İsyanı (1934- Bitlis)

*Abdurrahman İsyanı (1935-Siirt)

*Abdulkuddüs İsyanı (1935-Siirt)

*Sason İsyanı (1935-Siirt)

*Dersim İsyanı (1937-Tunceli) (Birand 2003).

Ji ber ku ev belgene di arşîva leşkerîyê de cih digirin kesê ku wan parve dike naxwaze ku navê wî bête dîyarkirin. Nekêfxweşîya ku gelê Kurd tê de ye her dem hatîye veşartin. Di dema Komeleya Tirkîyeyê de serhildanên li hemberê rêxistina komarê çêbûne rê li ber politikaya dewletê ya tûnd vekirine. Lewra komarê biryarên ku di wê demê de distîne bi gelemperî dixwazin Kurdan bi rêya asîmîlasyonê û zordestîyê bêdeng bihêlin. Em dê ji bo mijarê zelal bikin bi kurtasî li ser biryara dewleta Tirkîyeyê ya li hember Kurdan çi rapor amade kirine, bisekinin.

Piştî serhildana Şêx Seîd di 8ê Îlonê ya sala 1925an de raporek bi vî rengî li hember Kurdan hatîye amadekirin û li gor raporê rêxistinek bi van madeyan di raporê de cih girtîye. Bilal Nergiz bi van gotinan behsa raporên ku dewletê di derheqê Kurdan de amade kirîye, kiribû:

> *-Çi qas hewcedarî bi kargerîya pihêtkirî (sıkıyönetim) hebe, hewce ye bête cih.*
>
> *-Welat hewce ye veqete pênç herêman.*
>
> *-Di dadgehên leşkerî û sivîl de hewce ye dadgêrên ji wê herêmê di wan dadgehan de nexebite.*
>
> *-Tirkên ku dê ji Qefqasyayê, Balkanan û Arnavût bên hewce ye ku li Rojhilat bi cih bibin.*
>
> *-Gurcî û Laz dema ku li herêmê bi cih hatin kirin hewce ye hemû mesrefên wan ji alîyê dewletê ve betin dayîn.*
>
> *-Cihên ku ji Ermenîyan vala bûye hewce ye penaberên Tirk li wan deran bi cih bibe û Kurdan jî sirgûnî Rojava bikin.*
>
> *-Kurdên ku daxilî serhildanê bûne û kesên meriv û alîkarîya wan kirine hewce ye ku tevlî wan sirgûnên Rojava bibe.*
>
> *-Kesên ku di serhildanê de ji Tirkan re bûne alîkar hewce ye ku di cihê xwe de bimîne.*
>
> *-Hewce ye ku li sînorên Tirkîyeyê leşker bêtir bi cih bibin, li ser Kurdan û di malê wan de bi ti awayî sîleh nemîne. Kesên ku bi wan re bi sîleh bête dîtin jî hewce ye wan sewkî dadgeha kargerîya pihêtkirî (sıkıyönetim) bike.*

*-Di nav karmendê dewletê de yên ku li Rojhilat hewce ye kesek Rojhilatî li Rojhilat karmentîya dewletê neke.*

*-Li dibistanan, sûkan, bazaran û di hemû sazîyên dewletê de ji xeynî zimanê Tirkî hewce ye bi ti zimanên din nehêle bête axaftin.*

*-Hewce ye ku jinên li Rojhilat fêrî zimanê Tirkî bête kirin.*

*-Hewce ye sazîyên dewletê yên mezin û liberçavan, qerekolên leşkerîyê bête avakirin.*

*-Hewce ye ji bo sevkîyatê rê çêbibin û tirên di demên nêz de bigihêjin wê derê.*

*-Kurdên ciwan yên ku diçin leşkerîyê hewce ye ku bê sîleh bin û di xizmetên din de wan bi kar bînin*

*-Kes an jî sazîyên bîyanî bêyî dewletê hewce ye ku nehêlin bên Rojhilatê (Nergiz, 2019: 41).*

Ev rapor piştî bûyera 1925an ji alîyê dewletê ve li hember Kurdan ve hatîye amadekirin. Piştî bûyera sala 1925an, di sala 1935an de jî bi emrê Atatürk û İsmet İnönü jî raporekê li ser Kurdan amade kiribû.

Em dê madeyên rapora İsmet İnönü jî parve bikin. Li gor rapora İsmet İnönü jî hewce ye ku dewlet bi vê rêyê Kurdan islah bike.

*- Cilên leşkerên ku li Rojhilat dimînin hewce ye ku ne kevn û qetîyayî be. Lewra dewletê li ber çavê gel kêm û piçûk dike.*

*- Amed, hewce ye ku bibe navenda Tirkan ya herî bi hêz.*

*- Erebên li Mêrdînê dijîn dema ku em wan bikin alîgirê xwe di êrişên Kurdan de ew dê jî alîkarîyê bidin me.*

*- Kesên ku li bajarê Sîrtê dijîn dilê wan bi ser Tirkbûnê ve heye. Ger ku em bikevin nav gel, bijîşk û avê ji wan re tedarek bikin dê gelê Sîrtê jî li alîyê dewletê ve cih bigire.*

*- Bajarê Bilîsê hewce ye ku bibe kel û hêlîna Tirkan. Ji bo ku bajar bibe cihê Tirkan jî hewce ye ku karmendê dewletê ji vî bajarî jî hebin û sanayîyek li wê derê vebibe.*

*- Bajarê Erziromê hewce ye bi hêza dewletê ve bibe navenda Tirkan. Erzîncan jî girîng e. Wisa fikirine; ger ku Erzîncan bibe navenda Kurdan dibe ku Kurdîstan ava bibe. Lewra Kurdên ku ji Dêrsimê bar kirine li Erzîncanê kom bûne.*

*- Hewce ye ku Dêrsim bête islahkirin. Cihê walî hewce ye ku weke cihê eskerîyê bête amadekirin û li gor raporan di salên 1935-1936an de hewce ye qereqol û rêyên devera Dêrsimê bêne çêkirin.*

*- Deşta Mûş, Elezîzê û Wanê ji ber ku vala ye hewce ye ku bi Tirkan bête tijekirin. (Nergiz, 2019: 42)*

Piştî rapora İsmet İnönü dewlet tedbîrên xwe li ser rêya asîmîlasyonê dimeşîne. Lewra piştî rapora İsmet İnönü mifetîşek bi navê Zeynel Abidin Özmen li Rojhilatê Tirkîyeyê dest bi xebatê dike.

Zeynel Abidin Özmen jî heta sala 1943yan li Rojhilatê Tirkîyeyê dimîne û ew jî raporekê di derheqê gelê Kurd de amade dike. Li gor rapora Zeynel Abidin Özmen, piştî bûyera şerê Şêx Seîd û bûyera Agirî hestên Kurdbûyîne bi Kurdan re bêtir çêkirine. Ji ber vê yekê jî hewce ye milyonek Kurdên ku li Rojhilatê Tirkîyeyê dijîn bêne asîmîlekirin. Zeynel Abidin Özmen di rapora xwe de rêya asimilasyonê wisa pêşnîyar kirîye.

> - *Hewce ye ku derdora bajarê Wanê, deşta Mûşê û navçeya Bulanik û Malazgirtê Tirk li wê derê bi cih bête kirin.*
>
> - *Mamosteyên ku Tirkîtîyê di nav gel de belav bike hewce ye ku li Rojhilat bixebitin.*
>
> - *Beytar û kesên ku karê ziraetê dikin hewce ye ku biçin gundan û pesnê Tirkbûyîn û zimanê Tirkî bikin.*
>
> - *Tirkên ku dê bi keçên Kurd re bizewicin hewce ye ku dewlet erd û milk bide wan.*
>
> - *Hewce ye ku bijîşk heqê mianeyê nestînin.*
>
> - *Hewce ye ku di hemû sazîyên dewletê de tevlî karmendan ji xeynî zimanê Tirkî ti zimanekî din nehêle bête axaftin. Gundîyek dema ku karê wî bi dewletê re çêbibe hewce ye ku tercumanekî bi xwe re bîne. Armanç ew e ku gel tengasîya ziman bibîne û mecbur bibe zimanê Tirkî fêr bibe.*
>
> - *Cihên ku gel lê kom dibin hewce ye ku dewlet li wan deran nûçe û rojname bêtin xwendin.*
>
> - *Ji bo ku dewlet asayîşê bi dest bixwe hewce ye ku li herêmê rê bêtin çêkirin.*
>
> - *Kurdên ku herin leşkerîtîyê bikin hewce ye ku hew karê emeletîyê bi wan bête kirin. (Nergiz, 2019: 43)*

Ev çavkanîyên ku me dixilî mijarê kirîye bi mabesta êş û elemên ji pênûsa Musa Anter difûriyan bi saya wan dê bêtir bête fêhmkirin. Lewra li gor nerîna Musa Anter: “Hewce ye ku nivîskar xizanî, kul û derdên gel bibîne û nivîsên wan jî ji gel re bibe deng. Nivîskar hewce ye tiştên bala gel bikeşîne binivîsîne (Anter, 2013b: 73).” Musa Anter jî xwe li ser wê fikr û ramanê dîtîye. Ew fikr û ramanên Anter dibin sedema ku doz li wî vebibin. Di dema Komeleya Tirkîyeyê de bûyara 49an yek ji wan dozan e ku li Musa Anter û roşenbîrên Kurd vebûye.

### 1.7.2. Bûyera 49an

Piştî bûyera Şêx Seîd û bûyera Dêrsîmê, dengê Kurdan li ser axa Tirkîyeyê hatibû birîn. Lewra li Tirkîyeyê îdeolojîya Kemalîzimê di qada sîyasetê de bi rêxistina partîya CHPyê îdolojîya xwe domandibû.

Partîya CHPyê ango partiya M. K. Atatürk bi her awayî ji xeynî parastina Tirkbûyînê tiştekî din nepejirandîye. Ev politikaya tûnd kesên ku li hember fikra Kemalîzmênin bêdeng hiştinin.

Piştî sîyaseta li Tirkîyeyê ji yekpartîbûnê derket, kesên ku zordestî dîtibûn xwe bi gelemperî li partîya Adnan Menderes ya bi navê DPyê girtin.

Roşenbîr, xwendevan û zanayên Kurdan hewl danin ji bo serkeftina DPyê gelê Kurd ikna bikin da ku partîya CHPyê têk biçe. Di encama hilbijartinê de partîya Adnan Menderes ango DPê bi ser ketîye û hikumet ketîye destên wan. Rêxistina Kurdan heta demekê hinek baş çûye, lê paşê nêrîna ku ji alîyê dewletê ve li wan tête nêrîn dîtinin ku guherînek zêde çênebûye. Ev bûyara 49an jî di dema hikumeta Adnan Menderes de pêk hatîye. Roşenbîrên Kurd ji alîyê dewletê ve weke talûkeyekê têne dîtin.

Di wê deme de jî Kurdan di dewleta Iraqê de statûyek bi dest xistibûn. Ew statûya ku Kurdan bi dest xistibûn ji alîyê Tirkîyeyê ve nayête pejirandin. Lewra ixtimala encamek wisa di nav Tirkîyeyê de jî çêbibe hatîye kirin. Tirkmenên ku li dewlata Iraqê li nav Kurdan dijîyan li gor fikra sîyasetmedarên Tirkîyeyê di bin qetlîam û astengîyekê de bûn.

Ji bo ku bertekî, tada li Tirkmenan têtе kirin wekîlekî partîya CHPyê bi navê Asım Eren pêşnîyaznameyekê daye meclîsa Tirkîyeyê da ku qetlîema li Tirkmenan hatîye kirin ew jî li Kurdan bikin.

Di wê demê de di rojnameya *İleri Yurt*ê de helbesta *Qimil* ji alîyê Musa Anter ve tê parvekirin û gelek rojnameger û roşenbîrên Tirk bertekî vê helbestê nivîsandine Bala hikumet û dewletê bêtir kêşaye ser Kurdan. Ji ber nivîsana helbesta *Qimil* Musa Anter tê girtin û roşenbîrên Kurd jî li hember vê bûyerê serî rakirin. Him gotina Asım Eren û him jî girtina Musa Anter bûye sedem ku roşenbîr û xwendekarên Kurd telgrafan bişînin ji hikumeta DPyê re. Yanê bi rêya qanûnê bertekên xwe dîyar kirinin. Ew dengderxistina roşenbîrên Kurd panîkê bi hikumeta DPyê re çêkirîye.

Celal Temel bi van gotinan behsa wê deme kirîye: Hikumet, daxwaza raporekê ji MAH "Milli Emniyet Hizmetleri"yê re dike. Rapor, sedema telgraf û bertekên roşenbîr û xwendekarên Kurdan daye, girêdayî statûya Kurdan ya li dewleta Iraqê girtîye, kiribû.

Herweke daxwaza Kurdên li Tirkîyeyê dijîyan weke daxwaza statûya li Iraqê çêbûye ji hikumetê re tête raporkirin. Fikr û pêşnîyazîya wan jî herî kêm hezar Kurd bêtin wendakarin. Ger wisa bibe ev pirsgirêk dê nêzî pêncî salî paş de here. Serleşkerê giştî yê wê demê li Tirkîyeyê, Cemal Gürsel jî bi vî rengî yanê Kurd xwe amadeyî serhildanekê kirîye û hewce ye zûbizû pêşîya vê yekê bête girtin kirîye. Hikumet raporan kom kirine û bi serokwezîr Celal Bayar re parve kirîye.

Di destpêkê de behsa hezar kesên li ber çavan û li darxistina wan biryar tê dayîn, paşê ew hijmar tête sêsid kesî û paşê jî tê pêncî kesî. İstixbarat daxwaza îdama wan kirîye lê ne wek kesên rêxistinek Kurdan, weke rêxistinek Qominîstîyê baştir dîtîye.

Baqanê hikumetê Fatin Rüştü Zorlu ku tête gotin ku bi eslê xwe Kurd e, li hember vê fikrê sekinîye. Paşê Adnan Menderes daxwaza dozkirina wan kirîye, lewra rapora di derheqê wan de hatîye girtin li gor wê biryar bête dayîn û ew pêncî kes dê bên îdam kirin. Di paş vê biryarê de dest bi girtina wan kirinin bi awayekî kes bi girtina wan haydar nebin û wan li zindanê kom kirinin. Ji ber ku çil hicre hebûn, deh kesan azad kirine û çil kesan jî xisibûn wan hicreyan.

Paşê hevalekî wan çûye ber rehma Xwedê û di nav medyayê de navê dozê weke doza 49an hatîye nivîsandin (Temel, 2020: 67-77). Biryara ku ji alîyê dewletê ve li ser roşenbîren Kurd hatibûn stendin bi mirina roşenbîrekî Kurd ya di hicreyê de eşkere bûye. Musa Anter wisa behsa ew kesê ku di hicreyê de mirîye dike:

Ew kesê ku di hicreye de miribû navê wî M. Emîn Batu ye. Xwendekarê zanîngeha Enqerê ye û di beşa hiqûqê de, pola 3yan de xendîye. Musa Anter piştî ku ji zindanê derketîye xwestina çûyîna li ser gora hevalê xwe kiribû. Di rapora dewletê de cihê ku cesedê wî lê hatîye veşartin tespit kirîye. Paşê daxwaza ku gora wî çêbike, kirîye lê kesê ku wê gora wî çêbike agahîya ku gor vala ye daye Musa Anter (Anter, 2013h: 148). Ew bûyera ku li cesedê M. Emin Batu hatibû kirin ji berê de di nav politikaya dewletê de hebû. Lewra çawa ku cesedê Şêx Seîd, Saîdê Kurdî, Seyît Riza û hwd. hatibûn wendakirin, cesedê M. Emin Batu jî hatibû wendakirin.

Kesên ku bi gulleyên resmî ve hatibûn kuştin ji alîyê dewletê ve gora wan dihate wendakirin, bûyera ku li cesede M. Emîn Batu jî hatibû bi heman rengî dixuya. Doza 49an di demek dirêj de ji Kurdan re dibe hişyarbûyînek. Lewra kesên hatibûn girtin ji alîyê fikr û ramanan ve cuda bûn. Lê mabesta girtina kesên bûyera 49an ji ber ku hemû Kurd bûn hatibûn girtin. Doza 49an bûye sedema ku kesên hatine girtin li ser Kurdbûyîna xwe bifikrin û rêyekê li ber xwe vebikin. Pirsên ku Kurd çi ne û hewce yî çi bin ji xwe re pirsîne. Büşra Ersanlı di berhema bi navê "Türkiye Siyasetinde Kürtler" de bi van gotinan behsa bûyera 49an kirîye: Doza 49an bûye sedema xwenaskirinekê. Lewra kesên ku di doza 49an de hatibûn girtin û paşê ku hatibûn berdan pirsgirêkên Kurdan bêtir anînin ziman û di derxistina rojname û kovaran de rolek stendibûn.

Rojname û kovarên weke *Dicle-Fırat, Deng, Barış Dünyası, Doğu, Yeni Akış* û hwd di dû vê bûyerê re derketin û navê Kurdan, çanda Kurdan bêtir bi deng hatîye bihîstin (Ersanlı, Uçarlar, (vd) 2012: 64,65).

Musa Anter bi helbesta *Qimil* hişkbûyîna tirsê derizandîye, gotin û nivîsên wî û bi piştgirîya hevalên wî yekîtîyeke bêtirs di nav roşenbîrên Kurdan de ava kirîye. Musa Anter û helbesta *Qimil* çîrûskek hişyarbûyîna Kurdan bû û ev bûyer pêşîya gelek rêxistinan li roşenbîrên Kurd vekiribû.

Di dema bûyera 49an de di qada şanoyê de berhema *Birîna Reş* ji alîyê Musa Anter ve tête nivîsîn û ev berhem di dema Komeleya Tirkîyeyê de ji bo Kurdan di qada şanoyê de bi zimanê Kurdî yekemîn e. Di encama doza 49an de kesên ku hatibûn girtin paşê têne berdan lê bala dewletê her tim li ser roşenbîrên Kurdan bû. Lewra dewlet ji hişyarbûyîna Kurdan aciz bû. Roşenbîren Kurd piştî bûyera 49an di rojname û kovaran de bêtir li ser Kurdîtîyê û zimanê Kurdî sekinîbûn. Têkilîyên roşenbîrên Kurd yên mîna Musa Anter û çepgirên Tirkan jî di wê demê de bêtir çêbûnin. Yaşar Kaya wisa behs dike: Musa Anter yek ji wan kesên roşenbîrên Kurd e ku ewil têkilîya wî û çepgirên Tirk çêbûye. Anter kesekî fikrên çepgir diparast û xelasîya Kurdan ya ji zilm û sirgûnîyê di îdolojîya çepgirîyê de didît. Di Fikrên wî yên humanîst de wekhevîya hemû gelan û biratîya Kurd û Tirkan hebû (Kaya, 1993: 9). Desthilatdarên dewletê ji fikr û ramanên roşenbîren Kurdan yên ku li ser Kurdîtîyê di kovar û rojnameyan de parve kirinin ne razî bûn. Dewlet ji bo tesîra tirsa xwe li ser Kurdan kêm neke carek din roşenbîrên Kurd xistinin bin çavan û doza 23yan dest pê kirîye.

### 1.7.3. Bûyera 23yan

Bûyera 23yan dema ku bazirganekî Ereb bi navê Abdulsettar Hamavendi tête Stenbolê û bala MİTê kışandîye serxwe û ketîye binçavan, dest pê kirîye. Musa Anter bi van gotinan behs kirîye: Abdulsettar Hamavendi dema ku li Helebê ye ew û Nûrî Dêrsimî hev nas kirinin. Abdulsettar Hamavendi dema ku biryara çûyîna Stenbolê daye û bi Nûrî Dêrsimî re parve kirîye, Nûrî Dêrsimî jî du navan daye Abdulsettar Hamavendi da ku li Stenbolê ji wî re bibin alîkar. Ji wan her du navan yek jê navê Musa Anter bû. Musa Anter bi van gotinan behsa bûyera 23yan kirîye: Abdulsettar Hamavendi dema ku tête girtin navê Musa Anter jî li ser nîşeyên ku bi wî re bûn ji alîyê MİTê ve tête dîtin. Ji ber di gelek belgeyên dewletê de ji alîyê neyînî ve navê Musa Anter derbas bûye, MİT jî bi wê mabestê wî jî binçav kirîye (Anter, 2016f: 189). Ev hew alîyê doza 23yan yê xuya ye. Lewra bûyerên ku berîya vê bûyerê pêk hatibûn, tevî Musa Anter bûne sedema girtina gelek kesên doza 23yan.

Ji bo ku em bûyera 23yan bi çi armancê çêbûye fêhm bikin, hewce ye ku tevgerên berîya vê bûyerê em bizanîbin. Di sala 1960î de dema ku li Tirkîyeyê leşker dest dana ser hikumeta DPyê û di encama darbeye de gelek sîyasetmedarên Tirk hatin kuştin. Lê paşê jî dewlet,li ser fikrên polîtîk jî tevgera gel hinekî azad kirin. Varol Şener wisa behsa mijarê kirîye: Roşenbîrên Kurd ger rojname û ger jî kovar çap kirin, fikr û ramanên xwe anîtinin ziman. Kovar û rojnameyên ku berîya doza 23yan derketine ev in; *Roja Newe*, *Dîcle- Firat*, *Deng*, *Barış Dünyası, Yön* hatîye çapkirin. Her çi qas berhemên cuda be jî bi gelemperî kesên ku di van berheman de nivîsînin nivîsên wan li ser Kurdîtîyê bûn. Roşenbîrên ku di kovara *Deng* de nivîsînin bala dewletê bêtir kişandibûn ser xwe. Lewra di dema KTyê de yekem kovar *Deng* e ku nivîsên bi zimanê Kurdî û Tirkî tê de parve kirin. Kovara *Deng* di 15yê meha Avrêlê ya 1965an de dest bi weşanê kirîye. Piştî du hijmaran, kovara *Deng* ji alîyê dewletê ve bi sedema propagandeya Kurdîtîyê kirîye, tête girtin.

Di derheqên kesên ku di kovara *Dengê* de nivîsînin û berpirsarîyê li kovarê kirinin dozek vebûye. Ji wan kesên ku di kovara *Deng* de nivîsînin yek jî jê Musa Anter bû (Şenol, 2019: 118-119). Dema ku doza 23yan li roşenbîrên Kurd vebûye nivîsên wan yên di kovaran de parve kiribûn ji alîyê dozgehê ve weke delîlekî te pejirandin. Doza 23yan wek ku di navê wê de jî dîyar dibe, bi sedema girtina 23 kesanin û ji alîyê

medyayê ve weke doza 23yan hatîye nivîsîn. Ji wan kesên ku hatine girtin hinek ji wan xwendekar bûn.

Heşt xwendekar ji dewleta Iraqê û xwendekarek jî ji dewleta Îranê bi sedema xwendinê hatibûn dewleta Tirkîyeyê. Çarde kesên ku hatine girtin jî kesên ku di kovar û rojnameyan de behsa çand û zimanê Kurdî kiribûn û ji Tirkîyeyê bûn. Wekhevîya wan kesên ku di doza 23yan de tên girtin bi gelemperî Kurd bûn.

Girtina kesên doza 23yan di 4 meha Xizîranê ya 1963yan des pê kirîye û di dawîya meha Xizîranê bi temamkirina 23 kesan doz vebûye. Di dema girtina wan kesan de medyayên ku alîyê desthilatdaran girtinin, girtina kesên doza 23yan wisa dabûn nîşandar. Ew kesên ku tên girtin dixwazin pêşketina dewleta Tirkîyeyê sabote bikin û cudahîyê di navbera gel bixin.

Bi mabesta fikra qominîstîyê komeleyek Kurdan tê avakirin û bi dewletên ji derveyê Tirkîyeyê ji bo armanca xwe pêk bînin têkildar tê dîtin. Ji wan kesan yek jê Musa Anter e û di dema girtina Musa Anter de di rojnameya *Toprak* de wisa behsa wî tê kirin: Musa Anter yek ji wan Kurdên qominîst e, endamê partîya TİPê ye. Di mala wî de li ser kurdîtîyê û qominîstîyê 17 delîl hatîne girtin. Hinek gotarên ku behsa Kurdan kirinin û wek Kurd sînorên ku dewleta Tirkîyeyê, Iraqê û Îranê napejirîne nivîsandîye di mala Musa Anter de hatîye zevkirin tête gotin (*Toprak*, 1963: 4).

Di encama bûyera 23yan de kesên ku ji derveyê Tirkîyeyê bi mabesta xwendekarîyê hatibûn ji alîyê dewleta Tirkîyeyê ve têne berdan û paşê beraat kiribûn. Kesên ku ji welatê Tirkîyeyê bûn û li Tirkîyeyê diman piştî salekê ji alîyê dozgehê ve sûcdar nayê dîtin, beraat kirinin. Yek ji wan kesên ku beraat kiribû, yanê sûcdar nehatibû dîtin Musa Anter bû. Anter di temenê xwe yê nêzî 80 salî de gelek caran tê girtin û sirgunkirin lê ji ser doza xwe venagere. Anter ji ber ku Kurd e û di her gotinên xwe de behsa zilm û zordestîya dewletê ya li ser Kurdan kirîye, bûye hedefa çeteyên dewletê. Musa Anter di temenê xwe yê nêzî 80 salî de tê kuştin. Em dê li ser sedema kuştina Anter û girîngîya kesayeta wî bisekinin.

### 1.8. KUŞTINA MUSA ANTER

Musa Anter di 20 Îlonê ya sala 1992yan de li taxa Seyrantepeyê ya wîlayeta Amedê tê kuştin. Dema ku tê kuştin temenê wî nêzî 80 salî bû. Ji bo ku wî bikujin gelek sedem ji wî re tên dîtin. Li gor hinek kesan kesekî daxwaza perçekirina Tirkîyeyê

kiribû, li gor hinek kesan kesekî bêbawer bû (Qomunîst bû), li gor hinek kesan nijadperest bû, li gor hinek kesan mirina wî di cih de bû û mirinek derengmayî hatîye dîtin û hwd.

Di derheqê kuştina Musa Anter de nivîskar Yaşar Kemal di 26-27ê meha Îlonê ya sala 1992yan de, yanê piştî kuştina Musa Anter bi heftayekê wisa behsa wî kirîye:

> *Li gor bawerîya min, kesek çi qasî zalim be jî dixwaze bila qatilê sed însanan be, dixwaze bila işkencecîyek be, çavbixwîn be, çi dibe bila bibe, min qet bawer nedikir kesên wek Musa Anter qetil bikin. Di bîst û sê salîya xwe de ez wî nas dikim. Musa Anter li dinyayê her tim bi nerînek başî dinihêrî. Bawerîya wî bi çanda gelê wî bû, wê ew çand ji dinyayê re bibe rengekî, bi wê bawerîyê bû. Bi hebûna xwe her tim li hemberê wendabûna nasname û çanda xwe bû. Qet ne kesekî nijadperest bû. Her tim kesekî sosyalîst û demokrat bû.*
>
> *Tekoşîna xwe ya girêdayî vê bawerîyê heta mirinê jî domand. Ji ber van sedeman ew qetil kirin. Lê ew bi aramî mir, lewra wî dawîya tekoşîna xwe nedît. Lê wî, ew ronahîya ku di tekoşînê de peyda bûye, dîtibû. Kesên ku ew qetil kirin û bi kuştinkirindan qet tiştek nebaş kirin. Lewra Tirk jî qetil kirin. Bi rastî em wek Musa Anter ji welatê xwe hez dikin? An jî em wek wî ji demokrasîyê hez dikin? Em dê ji van astengîyan azad bibin. Lewra ez bi Musa Anter û ji vî welatî bawer im, çi Kurd be û çi Tirk be her bijî Musa Anter, Apê Musa. (Kemal, 1994: 95-100)*

Musa Anter dema ku tê kuştin, di wan salan de gelek kesên ku di civakê de pêşketî, him kesên Kurd û him jî kesên Tirk û Ermenî jî têne kuştin. Dîyar e ku mabesta wan kesên ku ew kuştin pêkanîne, dixwestin di nav gel de qaosekê çêbikin û kesan çavtirsîyayî bikin. Li ser qetilkirina Musa Anter kesên ku daxilî hêzên di nav dewletê de bûne û paşê bi îtîrafên ku kiribûn, kuştina Musa Anter bi destê wan hêzên di nav dewletê de çêbûye, eşkere kiribûn.

Îtîrafkarê JİTEMê Muhsin Gül di rapora Susurlukê de kuştina Musa Anter, Wedat Aydîn û gelek kesên di girêdide Yeşil (Mahmut Yıldırım). Lewra Muhsîn Gül gotîye dema ku biryara kuştina kesan dihate dayîn di destpêkê de navê Qomunîstîyê bi dûv wan dihate xistin û wisa ew dikuştin. Navek wisa jî bi dûv Musa Anter dixin û wî wek kesekî zirara wî li dewletê heye didin nasîn û wisa qetil dikin (Savaş, 1998: 29-31).

Dema ku em li ser kesên ku li Tirkîyeyê hatîne kuştin û faîlên wan bi ti awayî nehatîne girtin disekinin, eşkere dibe ku bi gelemperî kesên hatîne kuştin nivîskar, roşenbîr, rojnameger, sîyasetmedar û hwd. nin. Ji wan kesên ku bi gelemperî di salên nehwêtan de li rojhilatê Tirkîyeyê tên kuştin an wendakirin û kujerên wan hîn jî ne dîyar

kirîne, hinek ji wan xebatkarên rojnameya *Yeni Yaşam, Welat û Özgür Gündemê* bûn. Lewra di salên 90an de Musa Anter û kesên ku xebatkarên rojnamêya *Özgür Gündemê* tên kuştin. Kesên ku ji xizanî ew rojname li gel belav kirine bi gelemperî temenên wan di bin hejdeh salîyê de bûn, tên girtin û paşê jî wek kesên ku kujerên wan ne dîyar tên wendakirin.

Musa Anter û xwarzîyê wî nûçevan – nivîskar Hüseyin Deniz her du jî bi nivîsên xwe di rojnameya *Özgür Gündemê* de nivîsînin û her du jî bi heman şiklî tên kuştin. Ji xeynî Musa Anter û Hüseyin Deniz di salên nehwêtan de kesên ku di rojnameya *Özgür Gündemê* de xebitînin nêzî 27 kes tên kuştin. Nîhat Hîkmet Şenol wisa behsa wan kesan kirîye:

Ji wan kesên ku tên kuştin, hejdeh (18) kes kesên ku rojname li gel belav kiribûn û heşt (8) kes nûçevan, yek (1) nivîskar Musa Anter, yek (1) berpirsîyarê rojnameya *Özgür Gündemê,* yek (1) jî şifêr bû. (Şenol, 2008: 120). Lê kuştina Musa Anter gelek deng dabû di nav gel de. Kuştina Musa Anter him li Tirkîyeyê û him jî li welatên derveyî Tirkîyeyê ve tê şermezerkirin.

Piştî kuştina Musa Anter, bandorek mezin li ser gelên li Tirkîyeyê dijîyan çêdibe. Gelek roşenbîr, nivîskar, rojnamevan li henber vê qetilkirinê bi gotin û nivîsên xwe derketinin pêş. Lê dewlet vê kuştinê qet dernaxe pêş û her tim dixwaze ser vê bûyerê bigire. Lewra di wan salan de gelek kes bi bêserûşûn diçin û têne kuştin û dozek jî li kesekî venabe yan kesek nayê binçavkirin.

Le ji aliyê din ve itirafçîyê Jitemê Abdulkadir Aygan piştî ku revîyaye Ewropayê bi berfirehî behsa kuştina Musa Anter kirîye. Abdulkadir Aygan li ser kuştina Musa Anter bi van gotinên xwe mijar zelal kirîye: Aygan gotîye ku me ger bixwesta em kesekî bixin dafika xwe, tişta ku me jê re digot bi awayakî balkêş me dianît ziman. Lewra me qurbanên xwe bi vî awayî dixistin dafika xwe. Diyar e ku Aygan, berîya bûyera kuştinê, navê Musa Anter zêde nebihîstiye. Roja ku ev bûyer pêk hatibû haya wî jê çêbûye wê kî dê bête kuştin. Planên kuştina Musa Anterî ji aliyê Ahmet Cem Ersever û Yeşîl ve hatibû çêkirin. Li gor planên wan, dê Musa Anter ji otela ku lê bû bête derxistin û kesên ku dê wî ji otelê jî derxe dê wî bîne ba Hogir (Cemil Işık) û Yeşîl. Yeşîl jî serokê vê çalekîyê bûye. Hogir ew jî kesekî ji nav PKKyê revîyaye û bûye alîgirê dewletê, li ser navê Jitemê kuştinê dike.

Dijwar (Hamit Yıldırım) ew jî weke Hogir e, îtîrafçî ye û ji Jitemê re şixulîye. Şeva 20ê Îlonê ya 1992yan Musa Anter û Orhan Miroğlu bi hev re ji otelê derketine û erebeya ku Dijwar têde ye li benda wan sekinîye û li erebeyê siwar bûnin. Li gor gotina Orhan Miroğlu haya wî ji vê yekê di destpêkê de nebû. Kesên ku dafika qetilkirinê vekiribûn jî hew ji bo Musa Anter bû. Paşê plana ku Jitemê çêkiribû pêk nehatibû, yanê Musa Anter negihiştibû ber destê Yeşîl û Hogirî. Lê Dijwar dîtîye ku ew dê li wî şibhe bikevin li taxa Seyrantepeyê Musa Anterî dikuje û Orhan Miroğlu jî bi xedarî birîndar dike. Ev bûyer ji alîyê gelek roşenbîrên li Tirkîyeyê ve û kesên ku Musa Anter nas kirine bi dengekî bilind bertekên xwe li hember vê yekê dîyar kirine. Li gorî Aygan, ev emir û emrên bi vî rengî ji alîyê walîyê (OHAL)ê Ünal Erkan ve û kesên ku pişta wî digirtin weke Mehmet Ağar ve gotibû, hatibûn dayîn. Lewra dema ku Hogir hatibû îknakirin da ku bi JİTEMê re bixebite mala wî li wîlayeta Elezîzê (Elazığ) bû û kirya xanîyê wî jî ji alîyê partîya DYPyê ve hatibû dayîn. Ev îtîrafên Aygan eşkere dike ku qetilkirina Musa Anter bi destê kê ve pêk hatîye. Aygan, heta sala 1999an jî dibêje ku ez li rojhilatê Tirkiyê bûm û Hamit Yıldırım (Dijwar) li wîlayeta Şirnexê dijîya (Miroğlu, 2012: 42-50).

Ersin Kalkan di sala 2006an hevpeyvînekê bi Abdulkadir Aygan re dike, di hevpeyvîna di navbera Kalkan û Aygan de behsa Ahmet Cem Ersever û planên wî yên kuştinê, yên li ser roşenbîran hatiye kirin. Li gor gotinên Aygan emrê kuştina roşenbîran hatibû û kuştina Uğur Mumcu jî ji alîyê Jitemê pêk hatîye. Kuştina Musa Anter jî bi heman rengî pêk hatîye. Piştî ku Abdulkadir Aygan bi berfirehî behsa kuştina Musa Anter kirîye û kesên ku planên kuştina Musa Anter çêkirine navê wan gotîye. Di 2006an de Orhan Miroğlu û 337 roşenbîr ji bo ku kesên beşdarî wî sûcî bûne bête cezakirin destnîşan kom kirine (Kalkan, 2006: 78-139).

Piştî van gotinên Aygan doza qetilkirina Musa Anter carek din xwe nû kirîye. Bi saya destnîşanên nêzî 337 roşenbîrên li Tirkîyeyê dijîyan îdanameyak ji alîyê serdadgerê Amedê ve tête amadekirin û doza Musa Anter bi girtina Dijwar (Hamit Yıldırım) ve carek din destpê kirîye. Dijwar (Hamit Yıldırım) demekê girtî dimîne lê weke sûcdar nayê dîtin. Di encamê de Dijwar (Hamit Yıldırım) jî tê azadkirin û doza Musa Anter di cihê xwe de dimîne. Doza ku li ser kuştina Anter tê vekirin li gor qanûnên dewletê piştî 30 sal derbas bibe doz nagihêje encamekê û xilas dibe.

Doza Musa Anter xilas bibe jî bi nivîsên xwe û berhemên xwe her tim di nav gel de zindî maye. Keda wî ya li ser ziman û edebîyata Kurdî, li ser çapemenîya Kurdî piştî kuştina wî bi 30 sal jî bi bandor maye. Em dê di xebata xwe ya beşa duyem de li ser berhemên Musa Anter û bandora wî ya li ser çapemenîya Kurdî bi baldarî bisekinin û binirxînin.

## BEŞA DUYEM

## BERHEMÊN WÎ

Musa Anter di jîyana xwe ya nêzî 80 salan de gelek berheman nivîsînin. Di dema saxbûna wî de pirtûka *Qimil, Birîna Reş, Ferhenga Khurdî-Tirkî* û *Hatıralarım I-II* (Bîranên Min), *Vakayiname* tên çapkirin.

Pîştî mirina wî jî nivîsên wî yên di kovar û rojnameyan de tên çapkirin. Bi rêya berhevkirinê ve weke pirtûk niha li ber destê me heye. *Fırat Marmaraya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları û Çinara min*. Ev her du pirtûk jî piştî ku Musa Anter çûye ser dilovanîya xwe tên çapkirin. Ji xeynî pirtûkan jî di gelek kovar û rojnameyan de jî nivîsên wî hatinin çapkirin.

Di paş pirtûka wî ya bi navê *Ferhenga Khurdî-Tirkî* de behsa pirtûkeke bi navê *Bêçemkan* ("Yarasalar") dike ku hatîye çapkirin. Lê ev pirtûk heta niha bi ti awayî nehatîye dîtin. Behsa du pirtûkan jî dike û dibêje dê bête çapkirin, ew her du pirtûk jî heta niha bi dest kesan neketîye û li ber destê me nîn e. Ew pirtûkên ku navê wan derbas dibin *Gramatîko Zimanê Khrdî (Kürt dil bilgisi) û Kunca 38an* (38 Nolu Hücre) ye. Di hevpeyvînek Fırat Ceweri ya bi Musa Anter re jî behsa pirtûka *Wê Şevê Reş Bû* tête kirin, lê ev pirtûka wî jî bi ti awayî li ber destan nehatîye dîtin. Astengî û qedexebûn di her demê de li ser berhemên Kurdî çêbûye. Berhemên Musa Anter jî carînan di bin astengî û qedexeya dewletê de manin. Di sala 2012an de berhemên Musa Anter yên ku ji alîyê weşanxaneya Aramê ve tên çapkirin tên qedexekirin. Sedema qedexekirina berhemên Musa Anter jî li gor sersawcîyê komeleya Tirkîyeyê ji ber ku propagandeya komeleyên îlegal dike, bi wê sedemê tehqîqatê li weşanxaneya Aramê vedike. Li gor gotina Dîcle Anter jî "Sawcî anîtîye ziman ku çima hûn berhemên kesekî mirî çap dikin? (TYB 2014: 195)." Ev gotina ku sawcî kirîye mabesta wî ya li ser berhemên Kurdî dîyar kirîye.

Em dê di vê beşê de li ser berhemên Musa Anter bisekinin û analîza çend nivîsên wî yên di berhemên wî de cih digirin bikin. Ji xeynî pirtûkên ku Musa Anter nivîsandinin, nivîsên wî yên di kovar û rojnameyan de jî balkêş in. Em dê bi kurtasî behsa nivîsên Musa Anter yên di kovar û rojnameyan de jî bikin. Girîngîya Musa Anter ya li ser çapemenîya Kurdî jî em dê di vê beşê de behs bikin.

## 2.1. QIMIL - KIMIL

Berhema Anter ya *Qimil* çapa yekemîn di sala 1962yan, ji alîyê çapxaneya *Yeni Matbayê* ve hatîye çapkirin.

Paşê di sala 1991an de çapa yekemîn û çapa duyemîn jî di Cotmeha sala 1992yan ji alîyê weşanxaneya *Koralê* ve hatîye çapkirin. Weşanxaneya *Avestayê* jî di sala 2000î de ev pirtûk carek din çap kirîye.

Paşê weşanxaneya *Aramê* weke çapa yekemîn di meha Îlonê ya sala 2010an, çapa duyemîn di meha Îlonê ya sala 2011an û weke çapa sêyemîn jî di meha Adarê ya sala 2013an de çap kirîye.

Weşanxaneya Aramê di sala 2021an de hemû berhemên wî kom kirine û di bin serenavê "Tüm Eserleri" anko "Hemû Berhemên Wî" de çap kirîye. Pirtûka *Qimil* navê xwe ji helbesta *Qimil* girtîye û ji 76 rûpelan pêk tê. 38 nivîsen Musa Anter ên ceribandinê, raporên dadgehê û yên di wê demê de rojnameyên di derheqê nivîsa *Qimil* de fikrên xwe nivîsandine tê de cih digire. Hinek ji wan rojnameyan li hember nivîsîna bi Kurdî bertekên xwe dîyar kirinin, hinek ji wan rojnameyan jî nivîsîna bi Kurdî asayî dîtinin. Em dê bi kurtasî behsa wan nivîsên ku di rojnameyan de parve bûne bikin. Ji ber heta ku *Qimil* bi Kurdî nehatîye nivîsîn bala nivîsên bi Kurdî ji alîyê dewletê ve ew qas nehatibû kişandin. Musa Anter wisa behsa bertekên li hember nivîsandina bi zimanê Kurdî kirîye: Rojnameyên bertekên xwe li hember nivîsîna bi Kurdî daye yek jê rojnameya *Ulus* e. Ev rojname li wîleyata Enqerê tête weşandin û dema ku di rojnameya *İleri Yurt*ê de helbesta *Qimil* tête parvekirin, rojnameya *Ulus*, alîkarê walîyê Amedê ji bûyerê haydar kirîye û ji ber ku dewlet midaxaleyî çapkirina vê helbestê nekirîye, walî rexne kirîye. Heta ku ji bo weşandinê kaxizên ku rojnameya *İleri Yurt*ê bi dest dixin jî daxwaza îfşakirinê kirîye. Ji xeynî rojnameya *Ulusê* rojnameya *Cumhuriyyetê* jî ji ber ku helbesta *Qimil* hatîye weşandin walîyê Amedê rexne kirîye. Çima misade daye ku nivîsînek bi zimanê Kurdî li dewleta Tirkîyeyê bête çapkirin. Rojnameya *Cephe* jî weşandina helbesta *Qimil* normal dîtîye û ji ber ku Kurd jî li ser axa Tirkîyeyê dijîn mafdar dîtîye ku bi zimanê wan nivîs bêne nivîsandin. Rojnameya *Akşam* jî balê dibe ser girîngîya ziman. Ji bo ku pirsgirêkên wisa çênebin jî hewcedarîyê bi kampanyaya zimanê Tirkî dibîne, yanê ji ber ku partîyên sîyasî ji vê mijarê re ne baldar in wan rexne kirîye.

Rojnameya *Akşam* bi serenavê, meseleya ziman di ser hemû partîyan re ye û daxwaza teşfîka zimanê Tirkî li nav gel belav bibe, kirîye (Anter, 2013c: 14-19). Di sala 1938an de li Tirkîyê ji bo ku zimanê Tirkî li nav gel ve belav bibe dewleta Tirkan biryarekê digire ku ji xeynî zimanê Tirkî zimanek din bête axaftin qedexe ye. Kesên ku ji xeynî zimanê Tirkî ger ku bi zimanekî din biaxife weke sûcdar hatinin pejirandin û cezayê pereya li wan kesan hatinin birîn. Ger ku kesên bertekê vê qanûnê bike û bête ixbarkirin jî kesên ku vê ixbarê bike ji alîyê dewletê ve pere didan wan.

Me xwest ew mijara ku teşwîqa zimanê Tirkî ya rojnameya *Akşam* behs kiribû, em zelal bikin. Di pirtûka *Qimil* de em dê hew li ser du nivîsan bisekinin û binirxînin, lewra ew her du nivîs dibe sedema ku doz li nivîskar Musa Anter vebibe. Ji wan yek jê helbesta *Qimil* e û ya din jî *30 Ağustos* (30yê Tebaxê) e. Ji ber ku roja 30yê Tebaxê di dîroka Tirkîyeyê de nîşangehek roja serkeftî ye, bi navê “Zafer Bayramı” cejna serkeftîbûnê tête bilêvkirin. Musa Anter balê dikêşîne ser girîngîya wê rojê û kesên ku li gor wê rojê tevgerên wan nîn in û xwe wek parezvanê wê rojê dibînin wan kesan rexne dike. Lewra hem di wê rojê de rojnameyan behsa pîrozbahîya roja cejna serkeftinê kiribûn û him jî behsa kesên ku ji Amerîka hatine û tevgerên wan ên ku di nav gel de kiribûn. Musa Anter wê nakokîyê rexne kiribû. Musa Anter di nivîsa xwe de gotîye “Ger ku serxwebûn nebe cudahî di navbera Yewnan û Amerîka de nîn e.” Lewra bi dûrxistina Yewnan ya li ser welatê Tirkan, gelê Tirk azad kir. Ger ku dewleta Tirkîyeyê rê li ber Amerîka veke çi cudahî dê di navbera Amerikan û Yewnan de çêbibe? Musa Anter di paş vê gotinê de jî ji ber ku kesên wê serxwebûnê naparêzin rexne kirîye û lêborînê ji wan kesên ku li ser wê dozê canê xwe dane dixwazê (Anter, 2013c: 12). Piştî vê nivîsê dozek li Anter vedibe û di encama dozê de sûcdar nayê dîtin. Nivîsa Anter ya di pirtûka *Qimil* de ya duyemîn em li ser sekinîn û me nirxand helbesta *Qimil* e. Helbesta *Qimil*, gilî û gazinên keçek Suregî ye. Ji ber ku ajalek bi navê *Qimil* wan xistîye xizanîyek mezin, derd û kulê xwe digihîne etarê ku hatîye gundê wan. Etar (çerçî), ew kesê ku amûrên mala li gundan digerîne û wan amûrên ku di dest wan de ye bi zat diguherînin an jî bi pera difiroşin. Di 31ê meha Tebaxê ya 1959an de di rojnameya bi navê *İleri Yurt*ê de helbesta *Qimil* bi zimanê Kurdî / Kurmancî bi van gotinan hatîye parvekirin.

Bi çîya ketim lo apo, çîya melûl bûn rebeno

Ceh sendî lo apo, genim hur bûn evdalo

Qimil hatî lo apo, bi refa ye rebeno

Xwar genimi lo apo, hiştî ka ye rebeno

Hat qimil lo apo, hat ji zozana lo apo

Xwar genimê me xizano lo apo

Ro hatibû lo apo wexta dana lo apo

Pez herikî lo apo ser şivana rebeno

Çar kulekê me man apo li ser guhana rebeno (Anter, 2013c: 11).

Di vê helbestê de jî dixuye ku gel dema tengasîyekê dikeşîne gilî û gazinên xwe bi awayekî bi stranî û awazî li kilaman bar dikin. Ev çandek kevneşopî ye û di nav neteweya Kurd de gelekî pêş ketîye. Ji alîyê çandê ve jî cihekî girîng digire. Taybetîyeke edebîyata gelêrî ye, ji ber ku nivîsandina bi zimanê Kurdî qedexe bû edebîyat li ser şaxa devkî dimeşîya. Ji ber ku helbest bi zimanê Kurmancî bû gelek rexne, bertek li rojnameya *İleri Yurt*ê û Musa Anter tên kirin. Dozek li wî û rojnameyê vedibe lê paşê beraat dibin. Anter dema ku di zindanê de li ser pêşnîyarîya hevalên xwe dest bi nivîsandina berhema xwe ya *Birîna Reş* kirîye û li gor gotina wî di şevekê de nivîsîye.

## 2.2. BIRÎNA REŞ-KARA YARA

Pirtûka *Birîna Reş* bi naveroka xwe pirtûkeke şanoyê ye. Di dema Komeleya Tirkîyeyê de di edebiyata Kurdî ya nûjen de wek yekemîn pirtûka şanoyê tête dîtin. Çapa yekemîn di sala 1965an li Stenbolê û çapa duyemîn jî di sala 1991an de ji alîyê weşanxaneya Korelê ve hatîye çapkirin. Weşanxaneya Avestayê jî di sala 1999an de weke çapa yekemîn çap kirîye.

Paşê weşanxaneya Aramê çapa yekemîn di meha Îlonê ya 2010an de, çapa duyemîn di meha Îlonê ya 2011an de û çapa sêyemîn jî di meha Sibatê ya 2013an de çap kirîye.Çapa vê pirtûkê ya herî dawîn jî di sala 2021an de ji alîyê weşanxaneya Aramê ve di bin serenavê *Tüm Eserleri* “Hemû Berhemên Wî” de hatîye çapkirin. Çetoyê Zêdo û Yavuz Akkuzu di berhema xwe ya *Kürt Tiyatro Tarihi* de wisa behsa berhema *Birîna Reş* dike: Çawa ku li Tirkîyê qedexe û astengî li ser nivîsîna bi zimanê

Kurdî hebû, di warê şanoyê de jî ev qedexebûn tesîra xwe dîyar kiribû. Piştî Komeleya Tirkîyeyê ava bû û heta salên 1990î jî ji xeynî *Birîna Reş* - Kara Yara 1965 û Kemal Burkay nivîsa wî ya bi navê *Dawîya Dehaq* (Dehak'in Sonu 1978) ji xeynî van nivîsînên şanoyî ti nivîsîn heta niha nayên xuyakirin (Zêdo, Akkuzu 2016: 13).

Di van gotinan de jî diyar dibe ku di şanoya Kurdî de yekem pirtûka şanoyê ye û di şertên zahmet de ji alîyê Musa Anter ve hatîye nivîsîn. Girîngîya vê pirtûkê ev e ku zordestîyek gelek mezin di wê demê de li ser zimanê Kurdî hebû û ligel wan qedexe û zordestîyan, nivîskar Musa Anter di zindanê de û di şevekê de nivîsîbû.

Dema ku em mekanê nivîsîna vê berhemê û tengasîya ku nivîskar tê de bû didin ber çavan giringîya berhemê bêtir derdikeve pêş me. Lewra nivîskar di sala 1959an de dema ku dikeve zindana Harbîyeyê ya li bajarê Stebolê berhema *Birîna Reş* nivîsandibû. Di wan salan de li Rojhilatê Tirkîyeyê di nav gel de nexweşîyek bi navê Birîna Reş li gel derketibû. Ev navê nexweşîyê ji alîyê gel ve hatîye gotin. Ji xeynî wê nexweşîyê, nexweşîyên mîna werem, trehom, cuzam jî di nav gel de peyda bûnin.

Ji alîyê medyayê ve ev nexweşîya ku li nav gelê Kurd belav bûye bûye rojev. Nexweşîya Birîna Reş bi gelemperî li wîlayeta Amedê û derdora wê bêtir bandorek neyînî kiribû. Vedat Çetin wisa behsa bûyera Birîna Reş kirîye: Di sala 1955an de ji alîyê dewletê ve genim li gelê rojhilatê Tirkiyê tête belavkirin. Ji ber ku genim derman kirine û gel jî ji vê yekê nehatîye haydarkirin bi xwarina genimî gel nexweş ketibû û ew genimê dermankirî di navbera du salan de bûye sedema ku gelek kes bimirin.

Nexweşîya Birîna Reş ji ber ku di rojnameyan de gelek hatîye behs kirin, wezîrê tendiristîyê yê di wê demê de medyayê agahdar kiribû. Di agahdarîya xwe de nexweşîya Birîna Reş wek xetereyekê nayê dîtin, gotibû (Çetin, 2020). Beyenata ku wezîrê tendiristîyê dabû ji alîyê roşenbîran ve bêtir bertek tên dayîn. Di rojnameyan de wêneyên kesên ku bi nexweşîya Birîna Reş ve ketine tên parvekirin. Nazim Hikmet dema ku wêneyên di rojnameyan de dibîne û li axaftina wezîrê tendiristîyê rast tê, helbestekê bi navê Kara Yarayê dinivîse. Nazim Hikmet ji ber ku wezîrê tenduristîyê nexweşîya Birîna Reş weke xeternakê nabîne, rexneyê xwe bi gotinên wî di helbesta xwe de diîne ziman. Ji ber ku çarçoveya mijara me îxtimala derbas bike heye, em zêde li ser helbesta Nazim Hikmet nasekinin, lê em dê bi kurtasî behsa naveroka helbestê bikin. Lewra ixtimala ku Nazim Hikmet dema helbesta "Kara Yara" nivisandîye dibe ku

bandor ji Musa Anter girtibe û wisa nivîsandibe. Musa Anter di nivîsîneke xwe de gotibû: Ji ber ku bûyera Birîna Reş deng da û wezîrê tendiristîyê bi raporên sexte dixwest balê ji ser nexweşîyê bibe, çi ji destan dihat dikir. Nazim Hikmet li Moskovayê piştgirî li Musa Anter dike û helbesta xwe ya “Kara Yaraya Yakalanası Sağlık Bakanı” dinivîse (Anter, 2016: 186).

Nazim Hikmet di helbesta xwe ya bi navê “Kara Yara” de li ser zarokên ku bi nexweşîya Birîna Reş ketine, guherînek bi çi awayî di bedena wan de çêbûye behs kiribû. Di dawîya helbestê de jî wezîrê tendiristîyê li ser gotinên wî yên di medyayê de belav bûye, ji alîyê helbestvan ve hatiîye rexne kirin

Lewra dema ku wezîrê tendurstîyê behsa nexwşîya Birîna Reş kiribû nexweşîyê xeternek nedîtibû û weke fikara nexweşîyê ne pêkan e “Endişeye mehal yoktur” gotibû. Ji ber wan gotinên wezîr ve Nazım Hikmet jî nifira ku lê kirîye daxwaza wezîr jî bi nexweşîya Birîna Reş bikeve kirîye. Tarîfeya Nazim di helbesta Birîna Reş de dike, wek ku ew tarîfeyên zarokên bi nexweşîya Birîna Reş ketîye ji Musa Anter hatibûne stendin. Musa Anter bi van gotinan ve behsa nexweşîya Birîna Reş kiribû: Musa Anter dema ku di rojnameya *İleri Yurt*ê de nivîsên xwe parve kiribû, bûye şahidê wê bûyerê. Nexweşîya li wîlayeta Amedê û navçeyên Amedê belav bûye bûnin sedema ku Musa Anter li wan deran lêkolînê bike. Di encama lêkolîna ku di nav gel de kiribû vê nexweşîyê bêtir dîtibû û di rojnameya *İleri Yurt*ê de bûyera Birîna reş anîtibû ziman.

Nexweşîya Birîna Reş di rojnameyan de bêtir derketibû pêş. Wezîrê tenduristîya Tirkîyeyê ji ber sedema bûyerek bi wî rengî di rojnameyan de belav bûye û sedema nexweşîya *Birîna Reş* wek genimî ji alîyê dewletê ve tête nîşandar, di derheqê mijarê de axiftibû. Di axaftina xwe de nexweşîya *Birîna Reş* înkar kiribû û weke ku ev nexweşîyek ji genimî çênebûye anîbû ziman. Musa Anter di lêkolîna ku di nav gel de kiribû û dîtibû ku bi gelemperî zarok bêtir ji vê nexweşîyê dimirin (Anter, 2016: 184-187). Ew bûyera kambax dibe sedema ku nivîskar Musa Anter li ser wê berhemeke şanoyê binivîsîne. Musa Anter dema ku di zindanê de ye bi pêşnîyarîya hevalên xwe yên di zindanê de berhema *Birîna Reş* dinivîse.

Orhan Tüleylioğlu wisa behsa berhema *Birîna Reş* kirîye: “Musa Anter sedema nivîsandina berhema *Birîna Reş* wisa bi lêv kirîye. ‘Berhema *Birîna Reş* li hember partîzantîya DPyê ya ku di sala 1950î û heta wê demê de Kurdan weke mirov û roşenbîr

nedîtine hatîye nivîsandin" (Tüleylioğlu, 2010: 294, 295). Hikumet ji bo ku otorîteya xwe mihafiza bike bi gelemperî ji gel zêdetir têkilî bi axa, beg û şêxan re dikir.

Gel di nav xizanîyê de bû, lê alîgirên dewletê di nav dewlemendîyê de bûn. Nexweşîya Birîna Reş dibe sedema mirina gelek kesên xizan. Ji ber ku gel di bin bandora desthilatgirên weke axa, beg, şêx û dewletê de bûn û xwendin kêm bû, gelê Rojhilatê Tirkîyeyê ji bêçaretî li ber qedera xwe disekinîn.

Anter bêçaretîya gel tê de bû dike berhem û dibe sedem ku bala kesan bêtir bikêşîne ser bûyerê. Berhema *Birîna Reş* him bi zimanê Kurdî ye û him jî bi zimanê Tirkî ye.Yanê hêlek pirtûkê bi serenavê *Birîna Reş* dest pê dike û bûyer bi zimanê Kurdî hatîye ragihandin, ji 52 rûpelan pêk hatîye. Alîyê pirtûkê ya din jî bi serenavê *Kara Yara* yê ve hatîye nivîsîn û bûyerên wê jî bi zimanê Tirkî hatîye ragihandin, ji 55 rûpelan pêk hatîye.

Berhema *Birîna Reş* ji çar beşan (perdeyan) pêk hatîye. Lîstikvanên vê şanoyê "Zîno, Biro, Misto, Bedo, Apê Sado, Seroxan, Kelos, Reşo, Xensê, Silo, Xort, Gulê û Biharê" ye. Yekemîn navê pirtûkê di rûpela 13an de ji alîyê Zînoyê ve tête bilêvkirin. Serleheng Bedo ye. Bi kurtasî şanoya *Birîna Reş* bi vî awayî ye.

Cihê bûyerê gundekî li deşta Amedê, bi navê Zoravayê derbas dibe. Bûyer li ser genimê dermankirî yê ku ji alîyê dewletê ve bi mabesta li gel belav bibe gihiştîye Rojhilatê. Ji ber ku nezanî û xizanî zaf e, axa û begên wê herêmê bi tonan li ser navê gundîyan ji dewletê genimî distînin û difiroşin gundîyan. Ji ber ku xizanî gelek e xwarina nanê genimî li her malê tineye. Kesên ku ew genimî dikirin û dixwin jî nexweşî li wan peyda dibe û eqlep jî zarokên temen-piçûk ji ber vê nexweşîyê dimirin. Heft xwişk û birayên Bedo jî dimirin û Bedo bi xwestina dêya xwe Zîno dixwîne û dibe bijîşk. Ji ber ku Bedo kesek ji nava gel e, xwe aîdî gel dibîne û li pê çaraserîya vê nexweşîya *Birîna Reş* dikeve. Lîstik bi vî awayî didome (Anter, 2013a: 11-53). Ji bo pirtûka *Birîna Reş* jî doz li nivîskar vedibe û pirtûka *Birîna Reş* tête qedexekirin û tête komkirin. Paşê di encama dozê de nivîskar sûcdar nayê dîtin û pirtûk di nav gel de bi awayekî fermî dimîne. Anter piştî berhema *Birîna Reş* li ser *Ferhenga Khurdî û Tirkî* xebata xwe domandîye. *Ferhenga Khurdî û Tirkî* di dema Komeleya Tirkîyeyê de li gor dema xwe li ser zimanê Kurdî bi dewlemendîya peyvên xwe yekem berhem e. Ji alîyê Musa Anter ve li edebîyata Kurdî zêde bûye.

## 2.3. FERHENGA KHURDÎ Û TIRKÎ (KÜRTÇE VE TÜRKÇE SÖZLÜĞÜ)

Musa Anter vê pirtûkê di sala 1963yan de dema ku di zindina leşkerî ya Mamakê de di hucreya “Î” de dinivîse. Ev ferheng nêzî yazde hezar peyvan e û li paş ferhengê jî wek elîfbayek bi tîpên latînî ji bo zimanê Kurdî tê nivîsîn. Ev pirtûk di sala 1967an de ji alîyê çapxaneya Yeni Matbayê ve li Stenbolê tê çapkirin. Ji xeynî vê çapê çapek din jî ji weşanxaneya Aramê di sala 2021an de hemû berhemên wî kom kirine û di bin serenavê *Tüm Eserleri* “Hemû Berhemên Wî” de çap kirine.

Ev pirtûk piştî 54 salan carek din tê çapkirin. Pirtûk 178 rûpelan pêk tê û di rûpêlê berhemê yê herî dawî de pirtûkên nivîskar yên hatîne çapkirin û yên dê bên çapkirin navê wan hatîye nivîsîn. Em dê jî nivîsa wî weke ku rave dike, neqil bikin. Di pêşgotina berhema *Ferhenga Khurdî û Tirkî* de nivîskar Musa Anter bi van gotinan behs kirîye:

> *Min ev ferheng di sala 1963 yanda, li Enqarê, di bendexana mamakê ya leşkeri da, di khunca «İ» da nivîsî.*
>
> *Di rêzkirna ferhengê da, hevalê mini bendexanê xorte hêja xwendevarê avairaza bilind ji hevlêrê (Erbilê) Cemal Alemdar, pir arîkarya min kir.*
>
> *Ez aşikare spazî wî dikim. Gelekî di zorî, ne xweşî û tuneye da min ev ferheng nivîsî. Li ber çava ferhengek kevn nînbû û bi serda jî ez de bendexanê, qul û qulêra da bûm.*
>
> *Ji ber vê yekê, wê kêmaî û ne li rêyê min hebin. Ji xwe ferheng, bi jînêra dighin û distewin. Ev ferhêngog xelkê î pêsda, 10-15 caran hatine çapkirin û de her carê da kêm; û ne li rêzî û ne li rêyên wan, rast kirine. Go ez mam sax, yan xwedyêddin, hey bi caran ji nûda emè vé ferhengê çap bikin. Wekîdin jî ez bahwer dikim ku ev ferheng, ji welatyên min î Tirkiyê ra sûde (fêdeye).*
>
> *Ji nêzîk va zanim go bi milyona welatî ji ber go ji zimanêhev nizanin, bir kulin. Bi vê ferhengê û bi pey vê da a go ezê çap bikim (Ferhenga Tirkî Khurdî) go piçkokî kulêd wan sivik bibin, ezê pir baxtiyar bibim. Zanînekî vekirine go mirov bi zarê hev nizanibin, hînî hev nabin. (Anter 1967: 6)*

*Ferhenga Khurdî û Tirkî* li gor dema xwe berhemek bi qîmet tête xuyakirin. Lewra heta wê demê li Komeleya Tirkîyeyê berhemek weke ferhengok û bi zimanê Kurdî bi vê rê û rêbazê nehatîye nivîsîn. Di berhema ku Musa Anter nivîsîye 32 tîp hene û ji wan tîpan heşt tîp dengdêr û bîst û çar tîp jî dengdar in. Bi gelemperî nivîskar li ser dengan sekinîye û bilêvkirina dengan di zimanê Kurdî de bi çi awayî ye eşkere kirîye. Di destpêka alfabeyê de alfabeyen ku Kurdan bikar anîye nivîsîye. Yekemîn alfabaya ku ji alîyê Kurdan ve hatîye amadekirin (Îbn- û şah – Masî soratî) wek wêne hatîye

parvekirin. Paşê jî alfabeya Erebî û alfabeya Latînî nivîsandiye. Lê Kurdên dîyasporayê li Êrîwanê alfabeya Kirîlî bikar anîne. Aramî, Suryanî û hwd. Alfabeya Kurdî ya bi tîpên latînî jî di sala 1932an de ji alîyê Celadet Alî Bedirxan ve hatîye amadekirin û gelek berhem bi vê alfabeye hatîne çapkirin.

Yekem di 15yê Gulanê ya sala 1932yan de di kovara Hawar de dest bi nivîsîna vê alfabeyê dike (Bedirxan, 2010: 9). Di nav Kurdan de 15yê Gulanê wek roja zimanê Kurdî tête pîrozkirin.Alfabeya ku Musa Anter amade kirîye gelek nêzî alfabeya ku Celadet amade kirîye, lê çend cudahî jî di navbera her du alfabeyan de hene. Em dê li ser wan cudahîyan bi kurtasî bisekinin û mijarê zelaltir bikin. Ji ber ku Musa Anter ji bo ku cudahîya di navbera alfabeya Kurdî û Tirkî de derxe ber çavan muqayeseya her du alfabeyan dike.

Em dê jî alfabeya zimanê Kurdî ya ku Celadet amade kiribû bi mabesta muqayeseyê bi ber hevdin û cudahîya her du alafabeyan analîz bikin.

**Tabloya 2.1. Alfabeya Zimanê Kurdî**

| Hijmar | Alfabeya Kurdî ya Musa Anter | Alfabeya Kurdî ya Celadet Elî Bedirxan | Alfabeya Tirkî |
|---|---|---|---|
| 1 | Aa | Aa | Aa |
| 2 | Bb | Bb | Bb |
| 3 | Cc | Cc | Cc |
| 4 | Çç | Çç | Çç |
| 5 | Dd | Dd | Dd |
| 6 | Ee | Ee | Ee |
| 7 | Êê | Êê | - |
| 8 | Ff | Ff | Ff |
| 9 | Gg | Gg | Gg |
| 10 | - | - | Ğğ |
| 11 | Hh | Hh | Hh |
| 12 | İi | Ii | Iı |
| 13 | Îî | Îî | İi |
| 14 | Jj | Jj | Jj |
| 15 | KH - kh | - | - |
| 16 | Ll | Ll | Ll |
| 17 | Mm | Mm | Mm |
| 18 | Nn | Nn | Nn |
| 19 | Kk | Kk | Kk |
| 20 | Oo | Oo | Oo |
| 21 | Pp | Pp | Pp |
| 22 | Q | Q | - |
| 23 | Rr | Rr | Rr |
| 24 | Ss | Ss | Ss |
| 25 | Şş | Şş | Şş |

**Tabloya 2.1. Alfabeya Zimanê Kurdî (Devamı)**

| | | | |
|---|---|---|---|
| 26 | Tt | Tt | Tt |
| 27 | Uu | Uu | Üü |
| 28 | Ûû | Ûû | Uu |
| 29 | V | V | V |
| 30 | W | w | - |
| 31 | X | X | - |
| 32 | Y | Y | Y |
| 33 | Z | Z | Z |

Di hejmara dehan de li hember tîpa “Ğ” ya ku di alfabeya Tirkî de di alfabeya Musa Anter amade kirîye de û di alfabeya ku Celadet amade kirîye de nîn e. Ji ber ku tîpa “Ğ”yê weke deng di axaftina kurdî de heye, Kurd ji bo nivîsîna bi zimanê Kurdî li şûna tîpa “Ğ”yê tîpa “X” bikar tînin. Mînak: Ğerib – Xerîb, Ğezal – Xezal û hwd.

Di hejmara dozdan de Musa Anter tîpa “İi” bi vî şiklî nivîsandîye, lê Celadet tîpa mezin bê xal amade kirîye. Yanê “Ii” bi vî rengî di nav alfabeya ku Celadet amade kirîye cih digire. Di hejmara pazdemîn de di alfabeya ku Musa Anter amade kirîye du tîpên bihevdudayînî hene “Kh” Ev tîp di alfabeya ku Celadet amade kirîye de cih nagire. Musa Anter ji bo tîpa “Kh” mînak wisa daye: Khurd, khar, khêf û hwd. Lê li gor alfabeya ku Celadet amade kirîye; Kurd, kar, kêf e.

Cudahîyek di navbera her du alfabeyan de jî pevdeng e, yanê ev her du tîpên hevdudanî “XW” ye. Pevdeng di alfabeya ku Musa Anter amade kirîye bi vî rengî cih negirtîye. Lê Celadet di alfabeya Kurdî ya wî amade kirîye cih daye pevdenga bi tîpên “XW”. Ji xeynî van cudahîyan di navbera her du alfabeyan de cudahî nayên xuyakirin.

Ev encamek wisa dide destê me ku di wê demê de ragihandina li ser nivîsîn û alfabeya di navbera Kurdên li rojhilatê Tirkîyeyê û yên li nav dewleta Sûrîyeyê ve dijîyan ji ber şert û mercên polîtîk kêm dixuîye. Piştî berhema *Ferhenga Khurdî û Tirkî* yanê di navbera salên 1967-1990î de berhemên Musa Anter yên ku tên çapkirin li ber destan nînin. Di lêkolîna ku me li ser berhemên Anter kiribû hinek berhemên wî yên ne li ber destan me navê wan tesbît kirin. Em dê di bin serenavê “Pirtûkên Musa Anter yên ku me bi dest nexistîye” analîza wan bikin. Li gor kronolojîya berhemên Anter berhema çaremîn *Hatıralarım* e.

### 2.4. HATIRALARIM (BÎRANÊN MIN)

Berhema Musa Anter ya bi navê *Hatıralarım* çapa yekemîn di meha Cotmehê ya sala 1990î de ji alîye weşanxaneya Dozê ve û çapa duyemîn jî di meha Tîrmehê ya sala 1991an de ji alîyê weşenxaneya Yönê ve tê çapkirin. Weşanxaneya Avestayê jî di sala 2000î de vê pirtûkê çap dike. Paşê ev pirtûka Musa Anter ji alîyê weşanxaneya Aramê ve çapa yekemîn di meha Îlonê ya sala 2010an de, çapa duyemîn di meha Îlonê ya sala 2011an û çapa sêyemîn di meha Adarê ya di sala 2013an de, çapa çaremîn jî di meha Awrelê ya 2016an de hatîye çapkirin.

Berhema *Hatıralarım* di destpêka çapkirinê de weke *Hatıralarım-1* û *Hatıralarım-2* tê çapkirin, yanê du pirtûk bûn. Lê paşê weşanxaneyan her du çap jî di berhemekê de diînin ber hev û weke yek pirtûk tê çapkirin. Çapa vê pirtûkê ya herî dawîn jî di sala 2021an de ji alîyê weşanxaneya Aramê ve, di bin serenavê *Tüm Eserleri* “Hemû Berhemên Wî” de tê çapkirin. Ev pirtûk ji bîranînên nivîskar pêk tê û 374 rûpel in. Di berhema *Hatıralarım* ya ku weşanxaneya Aramê çap kirîye di navaroka pirtûkê de weke cilda yekem û cilda duyem hatîye weşandin.

Di cilda yekem de pênc beş hene û pirtûk bi serenavê Zivêngê dest pê dike û di rûpela 234-236an de bi serenavê Son Tutukluğum “Girtina Min ya Dawîn” xilas dibe. Di cilda duyem de jî du beş e hene. Musa anter armanca nivîsandina bîranînên xwe bi van gotinan rave kirîye: “Ehmedê Xanî çawa ku di berhema xwe ya bi navê *Nûbihara Piçûkan* de gotibû ‘Ne ji bo sahib rewacan, belkî ji bo piçûkên Kurmancan’ Musa Anter jî dibêje ku min îlham ji wî kesî mezin girt. Yanê Musa Anter îlhamê ji Ehmedê Xanî distîne û anîye ziman ku vê berhemê ji zarê Kurdan re nivîsandîye (Anter, 2016f: 23). Piştî weşandina berhemê astengîya dewletê ya li ser berhema Anter carek din derdikeve holê.

Di sala 1991an de bi sedema pirtûka *Hatıralarım* dozek li nivîskar vebûye û dewlet dest daye ser pirtûka *Hatıralarım*, nahêle li gel belav bibe. Di encama dozê de nivîsên nivîskar yên berhema *Hatıralarım* weke sûc nayê dîtin û doza ku li Musa Anter tê vekirin jî bi beraatê dawî bûye. Di pêşgotina pirtûkê de nivîskar berhema xwe dîyarî xanima xwe Ayşe Hale Anter kirîye. Lewra wê jî wek xwe şirîkê eş û tengasîyan dîtîye.

Musa Anter di Pêşgotina pirtûka xwe ya *Birîna Reş* de bi van gotinên xwe bêtir girîngîya pirtûka xwe derdixe pêş xwîneran. “Dibêje ku ez şahidê sondxwarî me, ew

şahîdîyê 55 sal e ku tiştên li Tirkîyeyê çêbûye. Hew ne şahid im, bersûc û mahkûm im (Anter, 2013c: 5). Musa Anter di pirtûka xwe ya *Hatıralarım* de hemû tiştên ku di jîyana wî de bi girîngîyê cih girtîye parve kirirîye. Lewra bi mabesta, xwîner ji bûyerên ku nivîskar şahîdîya wan kirîye bi gotinên xwe wan haydar bike. Li gor lêkolîna ku me kirîye jî pirtûka di nav gel de ya herî zêde tête nasîn pirtûka nivîskar ya *Hatıralarım* e. Ji bo girîngîya pirtûkê em dê di pirtûka *Hatıralarım* de analîza çend nivîsên Musa Anter bikin. Musa Anter di bin serenavê nivîsîna xwe ya Kürt-Türk Benzerliği "Li Hevçûyîna Tirk û Kurdan" de her du neteweyan dişibîne hev.

Li gor Anter di nav Kurdan de kesên ku pêşengtî dikirin weke Şêx, Seyîd, Axa û hwd. kesek ji wan xwe Kurd hîs nedikirin û nedidîtin. Ji ber vê sedemê jî neteweya Kurd bi hebûna netewetîyê dernediket pêş ve. Di nav Tirkan de jî him di dema dewleta Osmanî de û him jî di dema Komeleya Tirkîyeyê de kesên ku ger di ordîya leşkerîyê de û ger jî di sîyasetê de pêşengtî dikirin bi eslê xwe ne Tirk in û bi polîtîkayek ne rast tadê li gel dikirin.

Musa Anter him zilma ku şêx, axa û kesên ku hebûna xwe inkar dikirin çawa ku zirar dayîne Kurdan, bi sîyasetek nezan, kesên ku pêşengîyê ji neteweya Tirk re dikin jî gelê Tirk li zirarê qewimandine. Lê her çi qas li hevçûyînek di nav Tirk û Kurdan de hebe jî kêsên ku pêşengîyê ji neteweya Tirkan re dikin her dayîm xwe Tirk dibînin û Tirkbûyîna xwe her tim tînin ziman. Lê Musa Anter dibêje ku di Kurdbûyînê de ev yek nayê dîtin. Musa Anter li ser rûyê dinyayê nijadperstîyê tiştekî qenc nabîne û dibêje ez qet ne nijadperest im lê kesên ku haya wan ji nijadê wan nîn e û nijadperestîyê dikin zirarê dide neteweya xwe. Kesên ku weke pêşengîyê li neteweyên Tirk dike û wan di nav gelên cihanê de fedîkar derdixe. Musa Anter vê yekê tiştekî ji rêzê nabîne (Anter, 2016f: 251-255). Di berhema Musa Anter ya *Hatıralarım* de nivîsek wî ya girîng jî bi navê "Süper Vali" ye. Di vê nivîsa xwe de li ser neheqîya ku valîyê Amedê kirîye, disekine.

Girîngîya vê nivîsê ew e ku berîya bête kuştin bi nêzî sê meha nivîsandîye. Nivîsa Musa Anter li hember sîyaseta desthilatdaran ya li ser Kurdan e. Di naveroka nivîsê de rexneyê li walîyê Amedê dike û rêxistina wî ya li hember Kurdan şermezar dike. Li gor Musa Anter kesên ku mafdar bin her çi qas tengasîyê di jîyana xwe de bikeşîne jî di encamê de dê her tim bi ser bikevin. Li ser mijara rastîyê û mafdarbûyînê mînakan ji

kesên ku di civakê de pêşengtî kirine, dide. Dema ku behsa M. Akif Ersoy dike jî dibêje helbastvanê me, yanê qet cudahîyê naxe navbera neteweya Kurd û Tirkan.

Musa Anter di nivîsa xwe de dibêje ku ez nevîyê Saîdê Kurdî me, lewra Saîdê Kurdî jîyana xwe her tim li hember neheqîyê dîzayn kiribû. Çawa ku kesên dîktator di encamê de li pêş gel ve rezil dibe ji ber ku zilm kirine. Dibêje ku walî û kesên ku vê sîyasetê dimeşînin jî dê bi wî awayî têk biçin û rezil bibin. Ji ber ku li hember vê neheqîyê sekinîbû, gotibû ez dê di bîranînên gelê Kurd û Tirkan de bimînim. Lewra bi ti awayî serî li ber neheqîyê dibêje ez natewînim (Anter, 2016f: 355-356).

Musa Anter fikr û ramanên xwe yên li hember zilm û neheqîya walîyê Amedê wisa nivîsîye. Musa Anter berhema Bîranînên xwe weke bîranînên neteweya Kurd dîtibû. Anter dibêje ku ev berhem ji bîranînên min bêtirîn weke berhemek dîroka Kurdan e. Bi mabesta kesên dema ku ev berhem xwendin dem û bîranînên di pirtûkê de betir fêhm bikin û li gor wê binirxînin. Yanê mabesta nivîskar ew e ku di pêşerojê de ev berhem ji ciwanên Kurdan re, di derheqê civak û dîroka wan de ji bo ku bêtir fêhm bikin ji wan re bibe çavkanî û alîkar. Musa Anter bi daxwaza ku berhema bîranînên wî ji derd û kulên Kurdan re tercumantîyê bike nivîsîye (Anter, 2016f: 239). Berhema Anter ya Bîranîn min bi girîngîya wê ya di nav gel de bi van agahîyan bêtir derdikeve ber çavan. Berhema Anter ji alîyekî ve jî weke berhemek dîrokî em dikarin bibînin.

### 2.5. VAKAYINAME

Ev pirtûka Musa Anter ji nivîsên wî yên di navbera salên 1987-1992yan, dema ku li Nisêbîn û Stenbol-Dragosê bû tê berhevkirin. Nivîsên wî yên ceribandinê ne. Di meha Awrelê ya sala 1992yan de ji alîyê weşanxaneya Pelê Sor ve tê çapkirin. Weşanxaneya Avestayê jî di sala 2002yan de ev pirtûk çap kirîye. Pêşê ev pirtûka Anter ji alîyê weşanxaneya Aramê ve çapa yekemîn di sala 2010an de, çapa duyemîn di sala 2011an û çapa sêyemîn jî di sala 2013an de tê çapkirin.

Çapa vê pirtûkê ya herî dawîn jî di sala 2021an de ji alîyê weşanxaneya Aramê ve di bin serenavê *Tüm Eserleri* “Hemû Berhemên Wî” de hatîye çapkirin. Ev pirtûk ji 210 rûpelan pêk hatîye. Di pêşgotina pirtûkê de navê pirtûkê ji alîyê nivîskar ve bi van gotinan hatîye nivîsandin.

> *Vaka, olay (bûyer) e û name jî mektûp e. Çawa ku berê kesan bûyer li gor dîrokê dinivîsandin me jî metotek wisa bikar anît. Bi saya vakayinameyên dîrokê*

*em agahîyan di derheqê wê deme de qewimînin dibihîzin an jî dixwînin. Mirovahîya berî niha 1500salî ji alîyê zalimtîyê ve ti guherîneké nade destme (Anter, 2013e: 8-10).*

Musa Anter nivîsên xwe jî dişibînî weke nivîsên Fuzûlî. Lewra Fuzûlî jî behsa gilî û gazinan kirîye di nivîsên xwe de. Çawa ku kesên berê nivîsên xwe li gor dem û cihên ku lê dijîyan dinivîsandin ew jî nivîsên xwe li ser cihê ku lê dijî nivîsîye. Pirtûk ji pênc serenavan pêk hatîye. Serenavê yekemîn bûyer û nivîsên sala 1987an di bin vî serenavê de yazdeh nivîsên nivîskar hene.

Serenavê duyemîn jî bûyer û nivîsînên sala 1988an e. Di bin vî serenavî de jî çardeh nivîsîn heye. Serenavê sêyemîn jî ji bûyer û nivîsên sala 1989an e. Di bin vî serenavî de jî neh nivîsîn hene. Serenavê çaremîn jî ji bûyer û nivîsên sala 1990î ye.

Di bin vî serenavî de jî nozdeh nivîsên nivîskar hene. Serenavê pêncemîn jî ji bûyer û nivîsên sala 1991an e. Di bin vî serenavî de jî çil û heft nivîsên nivîskar hene. Nivîsên nivîskar yên vê pirtûkê cureyên ceribandinê ne.

Em dê bi kurtasî behsa çend nivîsên Musa Anter yên di vê berhemê de cih girtîne bikin. Di nivîsek xwe de li ser hebûna Kurdan sekinîye, serenavê nivîsa wî jî “Kürtler Türk’tür” (Kurd jî Tirk in) e. Di vê nivîsa xwe de li hember asîmîlasyon û politikaya desthilatdarên hikumetê derketîye. Lewra hikumeta Tirkîyeyê hebûna Kurdan nedipejirand û neteweya Kurd wek yek ji wan neteweya ku bi eslê xwe Tirk in, dipejirandin. Her çi qas pejirandina ku Kurdan weke neteweyekî Tirk hebû jî lê dema ku tengasîyek bihata serê neteweya Kurd, bêxwedîbûn bêtir dîyar dibû. Dema ku Kurd ji cih û warên xwe tên qetandin û dibin penaber, dema ku tên kuştin an zilm li wan tête kirin çima kesên ku wan Tirk dibînin xwedî li wan dernakevin?

Kesên ku bi rastîya xwe Tirk in û dema ku ketine tengasîyê dewleta Tirkan li wan xwedî derketîye û ji bo wan ketîye cengê. Herweke ji bo Tirkên li Kibrisê, Balkanê û Kerkûkê bertekê hikumeta Tirkîyeyê dîyar bû lê dema ku tengasî li Kurdan tê hikumet bêdeng dimîne û polîtîya hikumetê jî durist nabîne. Musa Anter tîne ziman ku ji Adem û Hawa hemû netewe xwişk û birayên hev in. Lê ger ku ev hişmedî nîn be û hew di gotinê de tenê bimîne ew dem neheqî û cudahî jî çêdibe. Li gor Musa Anter sedema ku hikumeta Tirkîyeyê neteweyên Kurd napejirîne û hebûna wan weke Tirkan dibîne jî ne bi duristî ye.

Ev fikir ji bo asimilasyona Kurdan e û ji gotina ku Kurd jî Tirk in kesek bawer nake. Yanê ji rastîya vê gotina ku Kurd Tirk in, Kurd jî û Tirk jî bawer nake (Anter, 2013e: 19).

Musa Anter di nivîsa xwe de nepejerandina neteweya Kurdan ya ji alîyê dewletê ve rexne kirîye. Anter, daxwaza dewletê ya bi fikra asîmîlasyonê ideaya Kurd nîn e û ew jî Tirk in, bi mînakên ji dîrokê kom kirine bi delîlên şênber ideaya dewletê pûç kirîye. Di vê nivîsê de dîyar dibe ku Musa Anter wekhevîyekê di nav neteweyan bi awayekî heqî dibîne û dawaza wekhevîyê işaret kirîye.

Pirtûka *Vakayiname* di dema saxbûyîna nivîskar de tê çapkirin û di dema saxbûyîna wî de berhema wî ya dawî ye. Piştî ku Anter tête kuştin nivîsên wî tên berhevkirin û weke pirtûk tên çapkirin. Berhema *Fırat Marmaraya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları* piştî mirina Anter weke pirtûk tê çapkirin û li edebîyata Kurdî zêde dibe.

## 2.6. FIRAT MARMARAYA AKAR/ ÜLKE VE GÜNDEM YAZILARI

Nivîsên Musa Anter yên ku di rojnameya *Ülke ve Gündemê* de derketîne tê berhevkirin û ji alîyê weşanxaneya Avestayê ve bi navê *Fırat Marmaraya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları* di meha Sibatê ya 1996an de weke çapa yekemîn tê çapkirin. Paşê jî carek din jî weşanxaneya Avestayê di sala 1999an de çap kirîye. Weşanxaneya Aramê bi navê *Ülke ve Gündem Yazıları* di meha Îlonê ya sala 2010an de weke çapa yekemîn, di meha Îlonê ya sala 2011an de çapa duyemîn û di meha Adarê ya sala 2013yan de jî weke çapa sêyemîn çap kirîye.

Çapa vê pirtûkê ya herî dawîn jî di sala 2021an de ji alîyê weşanxaneya Aramê ve, di bin serenavê *Tüm Eserleri* “Hemû Berhemên Wî” tê çapkirin. Pirtûk ji 320 rûpelan pêk tê. Cureyên nivîsînên di pirtûkê de ceribandin in.

Di pirtûkê de nivîsên nivîskar yên di navbera salên 1987an û 1992yan de nivîsandîye cih digirin. Di pirtûkê de 167 nivîsên Musa Anter ên ceribandinê hene. Di pirtûka *Fırat Marmaraya Akar/ Ülke ve Gündem Yazıları* de Musa Anter bi serenavê Kürt Tarihi’nde Kadının Yeri “Di Dîroka Kurdan de Cihê Jinê” behsa çar deman dike û di wan deman de di nav civaka Kurdan de jin di kîjan astê de ye behs kirîye. Em dê li ser vê nivîsa Musa Anter bisekinin û binirxînin. Di nivîsa Musa Anter de berîya ku

Kurd daxilî ola Îslamê bibin di nav Kurdan de cudahîyek di navbera mêr û jinan de nayê dîtin û wekhevîbûna jin û mêran bi mînakên ji dîrokê daye li ser sekinîye.

Di dema pejirandina ola Îslamê de jî jinên Kurd li gor jinên neteweyên din azadtir dibîne. Ji ber ku bandora çandê ya li ser Kurdan, jinên Kurd xwe ji mêran naparêzin. Anter, di nivîsa xwe de behsa bandora jinê ya di civakê de jî kirîye. Wek mînakan mêr li mal hebe yan jî tine be jî jin wasîfeyên mêran di malê de dike, mêvanan vedihewîne. Piştî pejirandina ola Îslamê ev rehetbûna jinan ya di nav civaka Ecem, Ereb û Tirkan de li gor Anter nayê dîtin. Musa Anter di nav civaka Kurdan de behsa pîrozbahîya jinê dike û ev pîrozbahîya jinê jî girêdayî bawerîya ola Zerdûştîyê dike. Anter di nivîsa xwe de behsa jinên ku seroktî ji eşîrên xwe re kirine jî dike û ev yek jî girêdayî bandora jinê ya di nav civaka Kurdan de dike.

Di dema herba cihanê ya yekem de jinên Kurd ji bo li xwedîderketa Kurdên ku di bêkesî û xizanîyê de mane komeleyên avakirine jî di nivîsa Anter de cih girtîye.

Musa Anter bi avabûna Komeleya Tirkîyeyê û şûn de jinên kurd li hember neheqîyê çawa bi mêran re di serhildanan de cih girtîye jî behs dike. Weke mînak behsa xanima Seyît Riza, Besê Xanim û li Bexdê jî behsa Leyla Xanimê dike (Anter, 2013d: 92-94). Di vê nivîsa Musa Anter de ya herî balkêş bandora çandê ya li ser jinên Kurd bêtir derdikeve pêş.

Musa Anter, li gor jinên neteweyên din, jinên Kurd di jîyanê de bi mêran re bêtir wekhevîyê di navbera wan de dibîne û cudahîyek mezin di navbera jin û mêran de nayê xuyakirin, dibêje.

Em bi saya vê nivîsê cihê jinên Kurd him di nav civaka neteweyên wê de û him jî muqayeseya bi civak û neteweyên dîndar û cîranên wê re di kîjan astê de ye bêtir dibînin.

Di nivîsên Anter de agahîyên wî yên li ser ziman û çanda Kurdî li ser folklora Kurdî bêtirîn xwe derdixin pêş. Di nivîsa xwe ya bi Kürt Tarihi’nde Kadının Yeri “Di Dîroka Kurdan de Cihê Jinê” de bi cureyê ceribandinê jî folklor û çanda jinên Kurd û bandora wê ya di nav civakê de bi mînakên têr û tije bala xwendekar dikêşîne ser mijarê. Di cureya ceribandinê de nivîsên Anter bi saya berhevkirinê weke berhem niha di nav gel de cih girtîye. Ji wan berheman ya duyem jî berhema Anter ya *Çinara Min* e. Di nav berhemên Anter ya herî dawîn ya li ber destê me *Çinara Min* e.

## 2.7. ÇINARA MIN

Berhema *Çinara Min* piştî qetilkirina Musa Anter bi berhevkirina nivîsên wî yên di kovar û rojnameyan de tê amadekirin. Çapa yekemîn ji alîyê weşanxaneya Avestayê ve di sala 1999an de tê çapkirin. Paşê ji alîyê weşanxaneya Aramê ve weke çapa yekemîn di meha Îlonê ya sala 2008an, çapa duyemîn meha Îlonê ya sala 2011an û çapa sêyemîn jî di meha Adarê ya sala 2013an de hatîye çapkirin.

Çapa herî dawîn di sala 2021an de ji alîyê weşanxaneya Aramê ve di bin serenavê *Tüm Eserleri* "Hemû Berhemên Wî" de tê çapkirin. Pirtûka *Çinara min* ji nivîsên Musa Anter yên di sala 1992yan de di rojname û kovaran de hatibûn nivîsîn û nivîsên ku di paş qetilkirina wî ve hatine çapkirin bi awayekî rêkûpêk tên berhevkirin. Ev pirtûk ji 138 rûpelan pêk tê. Deh rûpelên dawîya pirtûkê ji wêneyên Musa Anter re hatîye veqetandin.

Wêneyên arşîva *Rojnameya Welatê* ye û eqleb wêneyên dema qetilkirina wî vedihewîne. Şêst û şeş nivîsên wî di vê pirtûkê de tên bicihkirin.

Pirtûka *Çinara Min* navê xwe ji dara çinarê ya ku Musa Anter li ber mala xwe, di sala 1951an de bi deste xwe çandibû digire. Di 7-13 meha Adarê ya 1992yan de di serenavê nivîsa xwe ya bi navê *Çinara Min* de wisa bahs kirîye:

"Di sala 1951ê de ez çûm gund, min çinarek çand. Niha du metre û nîv stûr û 50-60 metre jî bilind bûye. Ji xwe min dibe ez tirba xwe di bin wê de çêkim" (Anter, 2013b: 11). Li ser wasiyeta wî tirba wî niha li bin wê çinara ku bi destê xwe çandibû hatîye kolan û li wê derê hatîye binaxkirin. Wasîyetdanîn him ji alîyê çandê ve û him jî ji alîyê bawerîya dîn ve di nav gel de cihek girîng digire. Kesên ku wasîyet kiribe eqlep ji alîyê merivên wî ve wasîyeta wî bicih tînin. Lewra kesên ku li welatekî din biçe ser dilovanîya xwe jî bi gelemperî daxwaza cihê ji dayîkbûyînê dike û dixwaza li wê derê binax bibe, dike. Ev jî fikra bawerîya dîn û çandê bêtir eşkere dike. Gelek roşenbîrên di qada derûnîyê de pispor in daxwaza vegerîna mirovan ya li cihê ji dayîkbûyînê weke aramîyeke derûnî dibînin. Lewra mirov cihê ku herî xwe di parastinê de dibîne malzarok e. Ayhan Tek wisa behsa girîngîya vegerîna malzarokê kirîye:

> *Psîkiyatrê Siwîsrî û sazkerê ekola psîkolojiya analîtîk Carl Gustav Jung (1875-1961) di xebata xwe ya bi navê "Çar Arketîp " (Die Archetypen und das kollektive Unbewusste; Ingilîziya wê: Four Archetypes) de ewil li ser "arketîpa*

*dayik"ê radiwestit û ji bo bingeha gelek kompleksan jî her dîsa vê arketîpê nîşan didet. Yanî li gor wî "arketîpa dayik"ê bi serê xwe kompleksek psîkolojîk/ pasîkanalîtîk nîne; ligel wê, rihên mîtolojîk di bingeha wê kompleksê de hene. Bi dîtina Jungî wekî her arketîpê, arketîpa dayikê jî tezahurên cuda cuda hene û di hinek insanan de nîşana wê dibite "dayika rastî, dapîr, xwesû, dayin, Meryem, Demeter, Sophîa"; yan jî wek ji bo arzû û îştiyaqa hedefa xilasbûnê "beheşt, bajar, welat, esman, ax"; yan jî wek cihê zayin û ber-dariyê "zevî, baxçe, zinar, şikeft, dar, çal, rehma dayikê/malzarok. (Tek, 2018, r: 60)*

Me, wasîyet û daxwazîya Musa Anter him ji alîyê çandê ve û him jî ji alîyê derûnîya mirovan ve analîz kir. Musa Anter bi çandina dara çinarê cihê xwe yê bê dawî dîyar kiribû û vegerîn li malzarokê kiribû. Musa Anter û vegerîna wî ya li malzarokê ji alîyê bedena wî ya şênber û derûnîyê ye. Anter bi fikr û ramanên xwe bi saya berhemên xwe piştî 30 sal çûye ser dilovanîya xwe jî di nav civakê de zindî maye.

Berhemên Musa Anter yên ku bi ti awayî me bi dest nexistîye lê di lêkolîna me ya ku me li ser jîyana wî kiribû em bi navê wan haydar bûn. Em dê li ser navên berhemên wî û agahîyên ku di derheqê berhemên Anter yên wendayî de me bi dest xistîye, bisekinin. Em dê li ser bersiva pirsa çima berhem ne li ber dastan e, bisekinin.

## 2.8. PIRTÛKÊN MUSA ANTER YÊN KU ME BI DEST NEXISTÎNE

Di bin vî serenavî de em dê li ser pirtûkên Musa Anter yên ku me bi dest nexistîne bisekinin.

Di dema ku me lekolîn li ser berhemên Musa Anter kir navê hinek berhêmên wî li ber çavê me ketin lê bi ti awayî weke berhemên çapkirî heta niha li ber destan rastî me nehatin. Li ser vê mijarê di 19 meha Adarê ya sala 2022yan de bi hevpeyvînek me û Rahşan Yorozlu (Anter), (keça Musa Anter) de me pirsa van berhemên ku ne li ber destan e ji Rahşan Xanimê re kir. Li ser pirsa me, Rahşan Xanimê bersiva vê pirsa me wisa da:

*Piştî ku bavê min hate kuştin me zarên wî hemû hatiratên bavê xwe kom kirin. Di nav wan hatiratan de gelek nivîsên bavê min yên ku bi destan hatibûn nivîsîn hebûn. Ji ber ku em her tim di taqîba dewletê de bûn me zarên Musa Anter biryara ku nivîsên wî em ji dest xwe derxin, da. Me nivîsên bavê xwe teslîmî hevalekî xwe kirin da ku tiştek bi wan nebe. Lê di wê demê de polisan her tim êrîşî ser malan dikirin û kesên ku me nivîsînên bavê xwe bi mabesta veşartinê dabûnê, ji tirsa polîsan wî jî ew nivîs şewitandibûn.*

*Ji me re wisa hate gotin. Rahşan Xanim dibêje ku heta niha me jî ew nivîs bi dest nexistîne (Yorozlu, 2022).*

Em hêvî dikin ku ev xizmet bibe sedema dîtina van berhemên ku em dê behsa wan bikin. Lewra him ji bo edebîyata Kurdî çavkanîyên nû dê derkevin holê û him jî keda nivîskar dê wenda nebe. Pirtûka Musa Anter ya yekem ku di lêkolînê de em jê haydar bûn *Yarasalar* "Bêçemkan" bû.

### 2.8.1. Yarasalar (Bêçemkan)

Ev berhem wek berhemek çapkirî di pirtûka Musa Anter ya bi navê *Ferhenga Khurdî û Tirkî* de derbas dibe. Di pirtûka *Ferhenga Khurdî û Tirkî* de ji xeynî pirtûka *Yarasalar* "Bêçemkan" wek pirtûkên çapkirî behsa du pirtûkên din jî tête kirin, ew her du pirtûk *Qimil û Birîna Reş* "Kara Yara" ye. Berhemên Musa Anter *Qimil û Birîna Reş* "Kara Yara" li ber destê me hene û bi her awayî jî tête dîtin. Lê pirtûka *Yarasalar* "Bêçemkan" wenda ye. Ji ber ku navê her sê pirtûkan weke hatîye çapkirin hatîye nivîsîn, ixtimalek mezin e ku pirtûka wenda *Yarasalar* "Bêçemkan" jî hatibe çapkirin. Musa Anter di nivîsînek xwe ya bi navê "Baytar mıyım?" de bi van gotinan behsa vê berhemê kirîye: "Bila navê mirov dernekeve, lê derket jî bila derkeve. Min çûkek nivîst nebû, min kêzikek nivîst hîç nebû. Niha ez ji kûçik û çêlekê jî ditirsim. Xwedê neke lê min mirov binivîsanda!.." (Anter, 2013c: 50).

Musa Anter behsa nivîsandina serenavê bi Çûkê dike û ew çûk jî çîrokên ku di bin serenavê *Yarasalar* "Bêçemkan" de cih girtîye anîtîye ziman. Ji xeynî Çûkê behsa Kêzikê jî dike û ew Kêzik jî Qimil e. Lewra di bin wê nivîsa ku bi navê "Baytar mıyım?" de wateya Çûk û Kêzikê weke *Yarasalar* "Bêçemkan" *û Qimil* dîyar kirîye. Di hevpeyvîneke Fırat Cewerî ya bi Musa Anter re jî Fırat Cewerî bi vî awayî weke pirsê ji Musa Anter re pirsîye: "Ji xeynî xebatên we yên polîtîk, ez we bi berhemên we yên weke *Qimil, Birîna Reş- Kara Yara, Yarasalar* "Bêçemkan" û ferhenga ku we amade kirîye nas dikim" (Uzun, 2007: 303). Dema ku me ev hevpeyvîna Fırat Cewerî ya bi Musa Anter re dît fikra me ya ku berhema *Yarasalar* (Bêçemkan) hatîye çapkirin zêdetir çêbû. Lewra Fırat Cewerî behsa berhemê wek ku hatîye çapkirin kirîye.

Dema ku me di derheqê berhema Musa Anter ya *Yarasalar* "Bêçemkan" de lêkolîna xwe zêdetir kir, di çavkanîyekê de hevalê Musa Anter, Yaşar Kaya wisa behsa berhema *Yarasalar* "Bêçemkan" kirîye: "Berhema *Yarasalar* "Bêçemkan" rêze-çîrokên ku Musa Anter di rojnameya *İleri Yurt*ê de nivîsandibû û li ser wan çîrokên bi bandor, mirov dikare pirtûkek felsefeyê binivîsîne. Mixabin ew çîrok hîn wek pirtûkekê

nehatîne berhevkirin (Kaya, 1993: 10). Di derheqê berhema *Yarasalar* "Bêçemkan" de her çi qas gotinên alozî hebin jî heta ku wek berhem bi dest nekeve em dê vê berhemê di beşa berhemên wendabûyî de qebûl bikin. Di nav berhemên Musa Anter de berhema duyemîn ya ku me bi dest nexistîye *Gramatîko Zimanê Khrdî* "Kürt dil bilgisi" ye. Di derheqê vê berhemê de agahîyên ku me kom kirine em dê di bin serenavê wê de parve bikin.

### 2.8.2. Gramatîko Zimanê Khurdî (Kürt dil bilgisi)

Berhema *Gramatîko Zimanê Khurdî* "Kürt dil bilgisi" di nav berhemên Musa Anter de yên ku ne li ber destan e, yanê wendayîne yek ji wan berheman jî *Gramatîko Zimanê Khurdî* (Kürt dil bilgisi) ye.

Navê vê pirtûkê jî di nivîsîna paş pirtûka *Ferhenga Khurdî û Tirkî* de derbas dibe. Dema ku behsa vê berhemê tête kirin weke wê hînê bête çapkirin hatîyê nivîsîn. Di bin serenavê pirtûkên ku dê bête çapkirin ji xeynî berhema *Gramatîko Zimanê Khurdî* "Kürt dil bilgisi" behsa berhema *Ferhenga Khurdî û Tirkî* û *38 Nolu Hücre* "Kunca 38" jî tête kirin (Anter, 1967: 176). Ji van berheman ya ku li ber destê me *Ferhenga Kurdî û Tirkî* tenê heye. ji xeynî çavkanîya ku di pirtûka *Ferhenga Khurdî û Tirkî* de di derheqê berhema *Gramatîko Zimanê Khurdî* (Kürt dil bilgisi) de ti agahî di dest me de nîn in.

Ji ber ku behsa weke berhemek li ber çapkirinê ye hatîye nivîsîn û bi ti awayî li ber destan hîn jî nehatîye dîtin. Em dê vê berhema Musa Anter ya bi navê *Gramatîko Zimanê Khurdî (Kürt dil bilgisi)* weke berhemek wendayî bipejirînin.

Ji xeynî berhema Anter ya bi navê *Gramatîko Zimanê Khurdî* "Kürt dil bilgisi" berhema *38 Nolu Hücre* "Kunca 38an" jî di lêkolîna ku me kiribû em jê haydar bûn. Em dê behsa vê berhemê jî bikin.

### 2.8.3. 38 Nolu Hücre (Kunca 38an)

Ev berhema Musa Anter jî wek berhemek dê bête çapkirin di paş berhama *Ferhenga Khurdî û Tirkî* de derbas dibe. Lê berhem bi ti awayî heta niha li ber destan nehatîye tespîtkirin.

Dema ku bi armanca em vê berhemê bi dest bixin û li ser berhemê me lêkolîn kir, lêkolîna ku me kir me gihand vê encamê. Di bîranînên Musa Anter de navê berhema *38 Nolu Hücre* "Kunca 38an" bi van gotinan derbas dibe: Kunca 38an dema ku di doza

49an de Musa Anter têde girtî mabû. Anter, di nav şert û mercên jîyaneke bi zehmet de behsa Kunca 38an kiribû. Lê ew zehmetîya ku Musa Anter û hevalên wî tê de dijîyan, wan ji fikr û ramanên wan dûr nexistîye. Musa Anter dibêje ji ber ku axaftina di navbera me de qedexe bû, me û hevalên xwe alfabeya Mors ya zimanê Kurdî bi çarde tîpan ji xwe re kiribû rêya ragihandinê. Musa Anter rave kiribû ku berhema *38 Nolu Hücre* "Kunca 38an" serpêhatîyên wî yên wê demê ye. Dibêje ku min wan bîranînên xwe bi navê *38 Nolu Hücre* "Kunca 38an" ji bo çapkirinê amade kiribû. Lê di sala 1972yan de polîsan dest da ser arşîva min û ew pertûka min ya ku li ber çapkirinê jî bi vî awayî wenda bû (Anter, 2016f: 149-151).

Her çi qas nivîskar li ser hebûna berhema xwe ya *38 Nolu Hücre* "Kunca 38an" axiftîye û serpêhatîya berhemê gihiştîye encamek çawa dîyar kiribe jî dixuye ku berhem ji alîyê polîsan ve hatîye wendakirin. Bi ti awayî behsa vê berhemê û çapbûyîna wê di lêkolîna ku me kirîye bi dest me neketîye. Ji ber ku berhem li ber destan nîn e, em dê berhema *38 Nolu Hücre* "Kunca 38an" jî weke berhemeke wendabûyî qebûl bikin.

Berhema Musa Anter ya çaremîn ku me tesbît kirîye bi navê *Wê Şevê Reş Bû* ye. Em dê di bin serenavê pirtûkê de behsa agahîyên ku me di derheqê wê de kom kirine bikin.

### 2.8.4. Wê Şevê Reş Bû

Me di derheqê vê berhemê de hew çavkanîyek peyda kir. Ew çavkanî jî di sala 1978an de hevpeyvînek Fırat Cewerî ya bi Musa Anter re çêkirîye navê berhema *Wê Şevê Reş Bû* di wê hevpeyvînê de derbas dibe. Di hevpeyvîna di navbera F. Cewerî û Musa Anter de li ser vê pirsê û di ancama bersiva pirsê de em bi van gotinan ji encama berhemê agahdar dibin:

F. Cewerî di pirsa xwe de ji Musa Anter re dibêje ku "heta demekê we di kovar û rojnameyan da gelek caran nivîsên xwe parve kir, lê demek dirêj e ku nivîsên we li ber destan nîn e, çima? We dest ji nivîsê berdaye?"

Musa Anter jî di bersiva vê pirsê de dibêje ku weke ku kesên derdora min jî dizanin min qet dest ji nivîsandinê bernedaye. Min çar berhem nivîsand û ji bo çapkirinê amade kirin. Ji wan çar berheman yek jê jî berhema *Wê Şevê Reş Bû* ye. Musa Anter tîne ziman ku ev berhem jî polîsan dest daye ser (Uzun, 2007: 304). İxtimalek wisa dide dest me ku pirtûka *Wê Şevê Reş Bû* di dest polîsan de maye û negihiştîye ber destê Musa

Anter. Ji ber ku weke berhemek çapkirî heta niha li ber destan bi ti awayî nehatîye dîtin û heta ku bi dest bikeve jî em dê berhema Musa Anter ya bi navê *Wê Şevê Reş Bû* weke berhemek wendayî qebûl bikin.

Musa Anter di jîyana xwe ya nêzî 80 salî de li gor lêkolîna ku me kirîye yazdeh berhem li edebîyata Kurdî zêde kirine. Anter ji xeynî fêda wî ya li edebîyata Kurdî bûye, ji alîyê çapemenîya Kurdî ve jî kedek mezin daye. Em dê di bin serenavê Musa Anter û Çapemenî de li ser girîngîya ragihandinê û behsa keda Anter ya li ser çapemenîya kurdî bi berfirehî bisekinin.

### 2.9. MUSA ANTER Û ÇAPEMENÎ

Cureyên ragihandinê gelek in. Ragihandin rêya ku daxwaza gotinê ya bigihêje cihekî yan jî bi kêmasî bigihêje kesan dike. Bi pêşketina teknolojîyê ve di rê û rêbazên ragihandinê de jî guherîn çêbûye. Ji ber ku mijara ragihandinê berfireh e û ixtimala çarçoveya mijara me derbas bike em dê li gor mijara xwe li ser ragihandinê bisekinin.

Di dema dewleta Osmanî de ragihandin bi gelemperî bi rêya nivîsandina nameyan, rojname û kovaran, paşê jî bi dîtina alfabeya Morsê ragihandin bi rêya telgrafan çêdibû.

Ji ber ku bajarê Stenbolê paytextî ji gelek dewletan re kiribû û ji alîyê zêdehîya mirovan jî danûstendin gelek lê çêdibû rêyên ragihandinê jî li gor bajarên din di bajarê Stenbolê de bêtir pêşketî bû. Piştî Komeleya Tirkîyeyê ava bû û paytexta Tirkîyeyê bû bajarê Enqerê jî statûya bajarê Stenbolê ji alîyê ragihandin û çapemenîyê ve kêmasî zêde çênebûye. Bi sedema Tirkîye di bin bandora yekpartîbûnê de bû û Kurd dihate înkarkirin, zimanê wan hatibû qedexekirin rêya ragihandinê jî li ber Kurdan asteng dibû. Roşenbîrên Kurd, piştî ku di Komeleya Tirkîyeyê de di qada sîyasetê de biryara ji yek-partîbûnê derkeve û derbasî pir-partîbûnê bibe daye wan jî giranî daye ser têkçûyîna partîya CHPyê.

Roşenbîrên Kurd bi fikr û ramanên xwe li derdora Demokrat Partîyê kom bûne. Kurdan, eqleb jî Kurdên ku li Stenbolê dijîyan, li gor şert û mercên xwe ragihandin bi rêya kovar û rojnameyan pêk dianîn. Rojname û kovarên ku weşandine û tê de nivîsên xwe parve kirine bi gelemperî rexne li sîyaseta ku partîya CHPyê kirine û bûne sedema ku gelê Kurd berê xwe bide DPyê. Yek ji wan roşenbîrên Kurd jî Musa Anter bû.

Musa Anter di sala 1948an de bi rojnameya *Dicle Kaynağı* dest bi çapemenîyê kirîye û heta ku çûye ser dilovanîya xwe jî di nav karê nivîsînê de jîyaye. Musa Anter ji bo ku fikr û ramanên xwe bigihîne kesan, wek gelek nivîskaran di rojname û kovaran de nivîsîye. Yavuz Çamlıbel rojname û kovarên ku Musa Anter tê de nivîsên xwe parve kirine wisa behsa navê wan kirîye:

"*Dicle Kaynağı, Barış Dünyası, İleri Yurt, Şark Postası, Deng (Doğunun Sesi), Dicle- Fırat, Sosyalist Dergisi, Tewlo, Yeni Ülke, Welat, Rewşen û Özgür Gündem*ê de nivîsandîye" (Çamlıbel, 2010: 90). Li gor lêkolîna ku me kirîye ji xeynî van navan çend rojname û kovarên din jî me tesbît kirine ku Musa Anter di wan de nivîsên xwe parve kirîye. Ji wan rojname û kovarên ku Musa Anter tê de nivîsandîye em dê bi awayekî kronolojîk li ser girîngîya wan bisekinin.

### 2.9.1. Dicle Kaynağı 1948 (Rojname)

Rojnameya *Dicle Kaynağı* di sala 1948an de ji alîyê Musa Anter û sê hevalên wî ve li bajarê Stenbolê hatîye weşandin. Musa Anter di derheqê girîngîya rojnameya *Dicle Kaynağı*yê da wisa gotîye: Me ji ber ku zilm û zordestîya li gelê Şerqê (Kurdan) dihate kirin bi armanca ku neheqîya li ser gel em derxin holê me dest bi derxistina vê rojnameyê kiribû.

Di dema Komeleya Tirkîyê de wek yekem rojname ye ku pirsgirêkên Kurdan eşkere di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de hatibûn ziman.

Bûyerên ku hatine serê Kurdan wek bûyera Zîlanê, bûyera Şêx Şeîd, Agirî, Sason, sî û sê gule û hwd. di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de derbas dibin.

Anter gotibû ku armanca rojnameyê, mirovahî çawa ye? wê şanî kesên ku desthilatdarîya dewletê bikin û wan ji mirovahîyê haydar bikin. Di dema weşandina rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de Musa Anter dibêje ku gelek matbayan bê dil rojnameya *Dicle Kaynağı* diweşandin.

Ji ber vê sedemê Musa Anter ji bo ku rojnameyê çap bike çapxaneyek kirîbû û rojnameya *Dicle Kaynağı*yê bi vê rêyê weşandibû (Anter, 2016f: 119-122).

Rojnameya *Dicle Kaynağı* hefteyê carekê derdiket û her derketina hejmara wê nêzî du hezarî bû. Musa Anter bi navê xwe yê yekem yanê Şexmûs Elmas di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de nivîsên xwe parve dike. Celal Temel bi van gotinan behsa

rojnameya *Dicle Kaynağı*yê kirîye: Di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de ji xeynî Musa Anter nivîsên kesên ku li "Dicle Talebe Yurdu"yê hevaltî bi Musa Anter re kiribûn, wan jî di vê rojnameyê de nivîsandine. Dema ku rojnameya *Dicle Kaynağı* tête çapkirin roşenbîrekî Kurd û bi navdar prof. Dr. Muhammed Mihri Hilav jî nivîsên wî di vê rojnameyê de tên parvekirin. Rojnameya *Dicle Kaynağı* di meha Tirmexê ya sala 1948an de dest bi weşanê dike û di sala 1950î de jî navber dide weşandina rojnameyê. Ji ber tengasîyan carîna rojname tê weşandin û carîna jî navber dide weşandinê.

Rojnameya *Dicle Kaynağı* di sala 1959an de tê girtin û venabe. Salên vê rojnameyê yên ku çalak di navbera salên 1948an-1950î de ye. Bi 40 hejmaran weşandina rojnameya *Dicle Kaynağı* diqede (Temel, 2020: 342). Rojnameya *Dicle Kaynağı* bi destpêkirina çapkirinê ve li ser majara asîmîlasyon û xeletîyên ku sîyasetmedaran yên ku li ser gel dikir, disekinî. Di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de mijar bêtir li ser kêmhiştina gelê şarqê bûye. Nivîskarên rojnameya *Dicle Kaynağı*yê sedema vê kemasîya ku gel tê de ye jî girêdayî yekpartîbûnê didîtin. Lewra ji avabûna Komeleya Tirkîyeyê û heta hilbijartina sala 1950î hikumet her tim di destê partîya CHPyê de bû. Zilm û zordestîya li Kurdan hatibû kirin jî ji alîyê roşenbîrên Kurdan ve sedem partîya CHPyê dihate dîtin.

Ji alîyê Komeleya Tirkîyeyê ve dema ku biryara di sîyasetê de pirpartîbûnê tê dayîn, roşenbîrên Kurdan jî bi gelemperî li hember partîya CHPyê alîkarî dide DPyê. Di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de roşenbîrên Kurd bi hêvîyek mezin behsa alternatîfa DPyê kirinin. Bi hatina demokrasîyê ve dê gelek tiştên xweş çêbibe û kesê ku xwedî merhamet dê derdê wan bêtir fêhm bike. Bi hêvîyek wisa roşenbîrên Kurd di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de behsa wê demê kirinin. Bilal Nergiz mabesta weşandina rojnameya *Dicle Kaynağı*yê bi van hevokan parve kirîye: "Musa Anter rewşa Kurdan di wê demê de wisa anîtîye ziman: Kurd mîna kerîyê bê şivan e û di nav guran de maye, ji ber vê yekê ji bo ku her kesî ji rewşa Kurdan haydar bike, Musa Anter dibêje me di sala 1948an de rojnameya *Dicle Kaynağı* derxist" (Nergiz, 2019: 81-155). Di gotinên Musa Anter de jî diyar dibe ku rewşa Kurdan bi awayekî dijwar didome. Ji bo ku hemû kes ji rewşa Kurdan haydar bikin derxistina rojnameya *Dicle Kaynağı* weke hewcedarîyekê dibîne. Piştî ku rojnameya *Dicle Kaynağı* dest bi weşandinê dike jî astengîya ji alîyê desthilatdaran bêtir li ser roşenbîrên Kurd xwe xuya kiribû. Musa Anter bi sernivîsa "Xwedîyê Malê êdî şîyar bû" di nivîsîneke xwe de bi van gotinan behsa zordestî û

zehmetîya dema weşandina rojnameya *Dicle Kaynağı*yê kirîye: Di sala 1948an de dema ku li Stenbolê rojnameya *Dicle Kaynağı* derxistîye him ji alîyê hikumetê ve û him jî bi balkişandina kesên li welêt ve bal kişandîye li ser xwe. Musa Anter behsa her meh çawa ku hatîye binçavkirin û eziyet û bêrûmetîya ku li wî hatîye kirin girêdayî sedema derxistina rojnameya *Dicle Kaynağı*yê kirîye (Anter, 2013b: 9-10). Zordestîya li ser rojnameyê û nivîskaran tê kirin girîngîya rojnameya *Dicle Kaynağıyê* bêtir watedar kirîye. Ronayi Önen Baykuşak jî girîngîya rojnameya *Dicle Kaynağı*yê bi van gotinan parve kirîye: “Di sala 1948an de dema ku rojnameya *Dicle Kaynağı* çap dibe gelekî bala gel dikêşîne ser xwe. Di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de pirsgirêkên gelê Kurd weke pirsgirêkên Rojhilat hatîye nivîsandin û wîsa di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de cih girtiye. Paşê ji alîyê gelek çavkanîyan dema ku behsa roşenbîrên Kurd kirine wan weke rojhilatî (doğucu) diyar dikin. Rojnameya *Dicle Kaynağı* bi mabesta ku Kurdan bi hemû kesan bide naskirin û zilma ku li gelê Kurd tê kirin hemû kesan ji vê zilmê haydar bike, derdikeve.

Piştî ku partîya CHPyê têk diçe û partîya DPyê bi ser dikeve rojname digihêje armanca xwe û weşandina xwe bi dawî kiribû (Baykuşak, 2020: 129-130). Li gor lêkolînên ku me kirinin piştî bi dawîbûyîna rojnameya *Dicle Kaynağı* hejmarên wê hemû bi dest neketîne. Di derheqê hejmarên rojnameya *Dicle Kaynağı* yên ku li ber destan e Malmîsanij û Mahmûd Lewendî wisa behsa hejmar û nivîsên Musa Anter ên ku di rojnameyê de derbas bûne, kirîye : Rojnameya *Dicle Kaynağı* çar hejmarên wê li ber destan e. Hejmarên ku li ber destan 20, 21, 28 û 30 ye. Hijmarên 20 û 21 di sala 1948an de û hijmarên 28 û 30î jî di sala 1949an de çap bûye. Di rojnameya *Dicle Kaynağı* de bi gelemperî ziman bi tirkî ye.

Di hejmara rojnameya *Dicle Kaynağı* ya 28an de sê nivîsên Musa Anter bi van serenavan û bi van mexlesan derbas bûye. “Qultek ji kanîyê: Ceza Peran (Anter), Mîzah (Rahşan), Hin Dîtin: Peters Familias (M. Anter)” (Malmîsanij, Lewendî, M 1992: 99-101). Bi gelemperî em li ser mabesta Musa Anter ya li ser derxistina rojnameya *Dicle Kaynağı* û girîngîya wê sekinîn, lewra di dema Komeleya Tirkîyeyê de rojnameya *Dicle Kaynağı* ji alîyê hişyarbûyîna Kurdan ve cihek girîng girtibû. Çapemênîya Kurdî piştî derketina rojnameya *Dicle Kaynağı* li gor şert û mercên li Tirkîyeyê pêş de dikeve. Anter, piştî ku rojnameya *Dicle Kaynağı* bi dawî kirîye, dest bi weşandina kovara *Şark Mecmuası* kirîye.

### 2.9.2. Şark Mecmuası 1950 (Kovar)

Musa Anter di sala 1950î de bi alîkarîya Kemal Sülker li bajarê Stenbolê dest bi weşandina kovara *Şark Mecmuası* kirîye. Li gor Musa Anter: rojnameya *Dicle Kaynağı* gihiştibû armanca xwe, lewra di sîyaseta Tirkîyeyê de DPyê di hilbijartinê de bi serketibû. Ji ber vê yekê jî dibêje me di şûna rojnameya *Dicle Kaynağı* de kovara *Şark Mecmuası* vekir. Nivîsînên di kovara *Şark Mecmuası* de li ser zilma ku bi destê partîya CHPyê li gel hatîye kirin sekinîye.

Ji xeynî rexneyên ku li polîtîkaya desthilatdaran dikir, kovara *Şark Mecmuası* li ser beyanameya mafê mirovan jî disekinî û ji bo neteweya Kurd ji beyanameya mafê mirovan haydar bibe bi vê armancê nivîsên li ser vê mijarê di kovarê de tên parvekirin. Kovara *Şark Mecmuası* du hejmar tête derketin û weşandina wê bi dawî dibe (Anter, 2016f: 130).

Ji ber ku bûyera sî û sê kesan di medyayê de belav dibe û gel jê haydar dibe dewlet ser bûyerê nagire. Bilal Nergiz bi van gotinan behs kirîye: Kesê ku emrê kuştina sî û sê kesên Kurd dabû bi navê Mustafa Muğlalı ji alîyê dozgehê ve cezayê îdamê digire lê ji ber ku temenê wî şêst û pênc derbas kirîye cezayê Mustafa Muğlalı tête bîst salan. Paşê jî dozgeh biryara xurifandina Mustafa Muğlalı dike mane û wî azad dike.

Di sala 1951an de jî dimire û doza sî û sê Kurdên ku hatin kuştin xilas dibe (Nergiz, 2019: 149). Kovara *Şark Mecmuası* ji ber ku li ser neheqîya li gel dihate kirin disekinî û gel ji her bûyerê haydar dikir, ji alîyê dewletê ve astengî kişandîye.

Li ser derketina kovara *Şark Mecmuası* û tengasîya ku Musa Anter kişandîye Celal Temel wisa behs kirîye: Musa Anter bi armanca ku weşanxanetîyê bike çapxaneyek kirîbû lê ji ber ku zext li karê wî dihate kirin nikarîbû çapxaneyê bikar bîne. Musa Anter difikire ku çûyîna wî ya welêt ji bo ku xebata xwe bike dê bêtir baştir dîtibû (Temel, 2020: 343). Zext û astengîyên ku li kovara *Şark Mecmuası* û nivîskarên wê hatibû kirin bi armanca ku xebata wan betal bibe. Malmîsanij û Mahmud Lewendî jî di derheqê girîngîya kovara *Şark Mecmuası* de û nivîsên Musa Aner de wisa behsa kovarê kirine: Hejmarek li ber desta ye nivîsandin bi zimanê Tirkî ye. Li ser kovarê armanca kovarê wisa anîtîye ziman: "Kovarek sîyasî, çandî û serbixwe ye." Xwedîyê kovarê û yên kar û barê nivîsan dike Şeyhmus Elmas e (Musa Anter) e. Nivîsên Musa Anter yên ku di kovara *Şark Mecmuası* de derbas dibin ev in: "Li bajarên Rojhilatê Ancax Piştî

125 salan Dê Hemû Zarok Bikarîbin Hînî Xwendin û Nivîsandinê Bibin (Musa Ander), Qultek ji Çavkanîyê: Du Rojhelat (Anter), Mîzaha Rojhilatê: Keştîya Nuh (Rahşan). di 31.01.1950î de hijmara yekem derdikeve (Malmîsanij, Lewendî, M 1992: 104-106). Anter piştî ku kovara *Şark Mecmuası* jî digire ji bajarê Stenbolê derdikeve û li welatê xwe vedigere. Li gundê Zivêngê yê ku gêrêdayî navçeya Nisêbînê demekê jîyana xwe didomîne. Musa Anter di dû demekê re ji gundê Zivingê derdikeve û li Amedê dest bi kuncenivîsa rojnameya *Şark Postası*yê dike.

### 2.9.3. Şark Postası 1952 (Rojname)

Rojnameya *Şark Postası* di 7ê Tebaxê ya sala 1952yan de li bajarê Amedê dest bi weşandinê dike. Musa Anter di sala 1954an de bi kuncenivîsînê tevlî rojnameya *Şark Postası* dibe.

Celal Temel bi van gotinan behsa rojnameya *Şark Postası* û Musa Anter kirîye: Musa Anter dema ku di vê rojnameyê de dest bi kuncenivîsê kirîye, hikumet di destê partîya DPyê de ye. Musa Anter di rojnameya *Şark Postası* de him rexneyan li partîya CHPyê dike û him jî di nivîsên xwe de behsa Kurdan dike. Ji ber vê sedemê bala gel dikeşîne û rojnameya *Şark Postası* di nav gel de bêtir belav dibe (Temel, 2020: 343). Musa Anter di nivîsên xwe de behsa xizmeta dewletê jî kirîye.

Hinek serenavên wek nûçeyan di rojnameya *Şark Postası* de derbas dibin xizmeta ku di wê demê de li wîlayetên ku Kurd lê dijîyan bêtir behs kirîye.

Lewra dema ku DP li Tirkîyeyê hikumetê bi dest dixe ji bo ku gelê Kurd girêdayî xwe bike û partîya CHPyê bêtir xerab xuya bike xizmet li rojhilatê Tirkîyeyê dikir. Bilal Nergiz wisa behsa hinek serenavên di rojnameya *Şark Postası* de derbas bûye dike: Wek mînakên ku di serenavên rojnameya *Şark Postası* de derbas dibin ev in. “ji bo ku petrola Ramanê bikarbîne xebatek dibe, li rojhilat santiralên ceryanê, li rojhilatê zanîngeh ava dibin, serokwezîrê me ji seyahata rojhilatê vegerîya û hwd” (Nergiz, 2019: 214). Di serenavan de jî dîyar dibe ku xebatên li rojhilat hatibûn kirin bêtir di rojnameyê de cih digire û di rojevê de dihêle. Xebatên ku hatibûn kirin gel ji wan haydar dibûn û bawerîya wan bi hikumetê bêtir çêdibû. Rojnameya *Şark Postası* ji ber ku behsa wan nûçeyan kiribû bala gel kişandibû ser xwe.

Musa Anter di pirtûka xwe ya *Hatıralarım* de wisa behsa rojnameya *Şark Postası* kirîye: Bi biryara hevalên wî bi navê rojnameya *Şark Postası* rojnameyek li wîlayeta

Amedê derdikeve û Musa Anter jî bi serenavê “Geciken Posta” (posteya derengmayî) di rojnameyê de dest bi kuncenivîsê dike.

Rojnameyên ku di rojevê de navê wan her tim bi cih digirtin jî di wê demê de li Amedê û wîlayetê derdora Amedê bi hejmara firotinê weke rojnameya *Şark Postası* nehatibûne firotin. Ji xeynî Tirkîyeyê rojnameya *Şark Postası* dişînin Sûrî û Ewropayê. Rojnameya *Şark Postası* bi gelemperî li ser zilma ku partîya CHPyê ya li gel kirîye sekinîye. Ji ber ku di hilbijartinê de partîya DPyê bi ser ketîye wek her mixalîfê CHPyê Musa Anter jî bêtirs rexneyên xwe li partîya CHPyê kiribû. Rojnameya *Şark Postası* ji du rûpelan pêk hatîye û nêzî salek û nîvan tête çapkirin. Li gor gotina Musa Anter polîtîkaya DPyê diguhere “DP bû wek CHP ya berê” paşê jî rojnameya *Şark Postası* tête girtin (Anter, 2016f: 136).

Piştî ku DPyê sîyaseta xwe li hember Kurdan diguherîne roşenbîrên Kurd, Musa Anter û kesên ku di fikra wî de ji partîya DPyê dûr dikevin û bertekên xwe li hember partîya DPyê dîyar dikin. Piştî ku weşandina rojnameya *Şark Postası* bi dawî dibe Anter di dû demekê kuncenivîsîyê nake. Musa Anter bi pêşnîyarîya hevalên xwe li Amedê dest bi kuncenivîsîya rojnameya *İleri Yurt*ê dike û li hember xeletîyên ku DPyê kirine nivîsên xwe di rojnameya *İleri Yurt*ê de parve dike.

### 2.9.4. İleri Yurt 1958 (Rojname)

Rojnameya *İleri Yurt* li Amedê derketîye. Girîngîya vê rojnameyê ew e ku ji sala 1938an û heta sala 1958an di Komelaye Tirkîyeyê de dengê Kurdan hatibû birîn, bi rojnameya *İleri Yurt*ê dengê Kurdan derketibû. Piştî bûyera Dersimê berhemên bi zimanê Kurdî an jî nivîsên bi zimanê Kurdî gelek kêm in. Musa Anter di rojnameya *İleri Yurt*ê de him bi nivîsên xwe yên hicwî û polîtîk û him jî bi nivîsên xwe yên bi zimanê Kurdî dibe sedem ku bala dewleta Tirkîyeyê û medyaya Tirkîyeyê bikeşîne ser Kurdan.

Musa Anter di berhema *Hatıralarım* de wisa behsa rojnameya *İleri Yurtê* kirîye: Xwedîyê rojnameya *İleri Yurt*ê Abdurrahman Efem Dolak e. Bi daxwaza Musa Anter û Canip Yıldırım xwedîyê rojnameya *İleri Yurtê* rojnameyê teslîmî her duyan dike û Canip Yıldırım dibe berpirsîyarê nivîsên rojnameyê, Musa Anter jî dest bi kuncenivîsîyê dike. Rojnameya *Îlerî Yurd* heta ku bikeve destê Musa Anter û Canip Yıldırım jî rojnameyek ne polîtîk e. Lê piştî destguherînê mijar bêtir li ser polîtîka û

rexneyên li kesên desthilatdar û hikumetê tête kirin, bêtir di rojnameyê de derdikeve pêş. Musa Anter di rojnameya *İleri Yurt*ê de bi serenavê “Aman Ne İleri Yurt” de bi gelemperî nivîsên xwe yên hicwî parve dike.

Nivîsîna wî ya di vê rojnameyê de yekem bi zimanê Kurdî hatîye nivîsîn “Ji bo Xwedê Sedeqakî” ye. Musa Anter ji ber ku bi zimanê Kurdî nivîsandîye dozek li wî vedibe û di encama dozê de sûcdar nayê dîtin. Musa Anter dest ji nivîsandina bi zimanê Kurdî bernade û li hember nivîsên wî li gor gotina wî doz li wî her tim vedibe. Kesên parêzer yên ku Musa Anter mafdar dibînin bi dil beşdarî dozên ku li wî vebûne dibin û Musa Anter diparêzin. Rojnameya *İleri Yurt*ê bala gel bêtir dikêşîne ser xwe û bêtir çap dibe, bi daxwaza kesên ku bi dest bixin aboneyî rojnameya *İleri Yurt*ê dibin. Musa Anter bi nivîsandina helbesta *Qimil* bala hikumetê û medyaya Tirkîyê bêtir dikêşîne ser rojnameya *İleri Yurt*ê.

Ji ber ku bi zimanê Kurdî di rojnameya *İleri Yurt*ê helbesta *Qimil* ji alîyê Musa Anter ve hatibû parvekirin bertekê vê bûyerê di rojnameyên Tirkîyeyê de bêtir derketin pêş. Musa Anter û berpirsîyarên rojnameya *İleri Yurt*ê tên girtin (Anter, 2016f: 140-145). Her çi qas nivîsên Musa Anter yên berîya di rojnameya *İleri Yurt*ê li ser zilm û zordestîya Kurdan hatibin nivîsîn jî weke nivîsên wî yên di rojnameya *İleri Yurt*ê de dixuye ku bêtir deng nedaye. Lewra nivîsandina helbesta *Qimil* û statûya Kurdên Iraqê ji alîyê dewlata Tirkîyeyê ve weke xeternek dihate dîtin. Li Tirkîyeyê di dema DPyê de roşenbîrên Kurd bêtir li ser pirsgirêkên ku gel tê de ye disekinîn û di rojevê de bicih dikirin. Lê di dû demekê de DPyê jî sîyaseta xwe guherandibû û astengî ji roşenbîrên Kurd yên ku wek Musa Anter re derdixistin. Piştî astengîyê jî rojnameya *İleri Yurt*ê tê girtin, Musa Anter û Canip Yıldırım tên binçavkirin. Bilal Nergiz di derheqê rojnameya *İleri Yurt*ê de û girtina wê de wisa behs kirîye: Serokwezîrê Tirkîyeyê Celal Bayar daxwaza ku Musa Anter bêdeng bihêle bi walîyê Amedê re parve kiribû. Ew daxwaza ku Serokwezîr kiribû bi tenê jî guherîna sîyasetê ya li hember kurdan dîyar kiribû. Di encamê de bi sedema ku Musa Anter propagandeya Kurdîtîyê kirîye û statûya Kurdên li Iraqê dijîyan weke sedemek ji alîyê dadgehê ve tête dîtin. Musa Anter tête girtin û rojnameya *İleri Yurt*ê weşandina wê bi dawî dibe (Nergiz, 2009:156-171). Rojnameya *İleri Yurt*ê dibe sedema ku him roşenbîrên Kurd û him jî gel ji hebûna xwe haydar bibe û polîtîkaya hikumetê bibîne. Bi parvekirina helbesta *Qimil* û bertekên ku li hemberê Musa Anter ji alîyê medyaya Tirkîyeyê ve hatibûn dayîn bêtir bala gel kişandibû ser

bûyerê. Bi girtina Musa Anter û xistina wî ya zindanê jî bû sedema yekîtîya xwendekar û roşenbîrên Kurdan. Di encamê de Musa Anter sûcdar nayê dîtin lê dibe sedema hişyarbûyîna Kurdan. Di rojnameya *İleri Yurt*ê de di bin serenavê "Çima Em Derdikevin" de bi çend xalên girîng behsa mabesta vê rojnameyê hatîye kirin. Malmîsanij û Mahmud Lewendî wisa behsa wan xalên girîng kirinin: Hinek ji wan xalên girîng ev in: "Karmendên li rojhilatê Tirkîyeyê dixebitin hewce ye ku bi xebatên xwe fedakar bin. Her partîyeke sîyasî ya li Tirkîyeyê weke şîrketekê ye û wan partîyan rexne dikin. Bûyerên ku li rojhilatê Tirkîyeyê çêdibin ji alîyê kovar û rojnameyên derveyên Rojhilatê cih nagirin. Xwendekarîya li Rojhilatê kêm e û rojnameya *İleri Yurt*ê bi mabesta li ser pirsgirêk û kulên wan bisekine, derdikeve. Musa Anter bi van gotinên xwe yên girîng mabesta rojnameya *İleri Yurt*ê dîyar kiribû (Malmîsanij, Lewendî, M. 1992: 115). Rojnameya *İleri Yurt*ê di biryara derketina xwe de mabesta xwe bi wan xalan dîyar kiribû. Di dema lêkolîna me de dema rojnameya *İleri Yurt*ê dest bi weşanê kiribû Anter behsa kovarek bi navê *Mezopotamya* jî kiribû, rastî me hat. Ji ber ku Anter kovara *Mezopotamya* ji alîyê wî ve weke hatibû weşandin bahs kiribû, me jî daxilî xebata xwe kirîye.

### 2.9.5. Mezopotamya 1959 (Kovar)

Di derheqê kovara Mezopotamyayê de ji xeynî çavkanîyekê, me ti agahî bi dest nexist. Malmîsanij û Mahmûd Lewendî di berhema xwe ya bi navê "*Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Rojnamegerîya Kurdî (1908-1992)*" de bi van gotinan behsa kovara Mezopotamyayê kirîye: "Musa Anter di derheqê kovara *Mezopotamya* de weha gotîye:

> *Hetta çileya paşîn a 1958-59an karûbarê kovarê dewam kir. Çapxana ku kovar lê dihat çaxpkirin ne ya min bû, xwedîyê çapxanê ji ber zilm û zora dewletê û ji ber mahkeman mecbur ma çapxana xwe girt. Tam di wê wextê de Çapxana Îdarîya Xusûsî ya Elzîzê (Elazığ Mühasebe-i Husüsiye Matbaası) dihat firotin.*
>
> *Min ew çapxane kirrî û bir li Diyarbekirê dezgaha wê danî û min dest pê kir kovara Mezopotamyayê derxist. Ji ber ku kovar bi Kurdî bû piştî demek kurt hat girtin, em xebatkarên kovarê jî ketin hepsê (Malmîsanij, Lewendî, M 1992:291).*

Dema ku em bi baldarî li ser nivîsa di derheqê kovara *Mezopotamyay*ê de disekinin agahîyek wisa dikeve dest me: Kovara *Mezopotamyayê* li Amedê hatîye weşandin û ya herî girîng jî Musa Anter di dema komeleya Tirkîyeyê de yekem kes e ku kovara bi zimanê Kurdî derxistîye û ew kovar jî *Mezopotamya* ye. Piştî kovara

*Mezopotamya* tê girtin bûyara 49an dest pê dike û gelek roşenbîrên Kurd dikevin zindanê.

Roşenbîrên Kurd di dû demekê de hatibûn berdan û çapemenîya Kurdî bi weşandina kovar û rojnameyan karê ragihandinê domandibûn. Ji wan kovaran yek jî kovara *Barış Dünyası* ye. Kovara *Barış Dünyası* kovarek ne aîdê Kurdan e, ji ber ku nivîsên Musa Anter tê de hatibûn parvekirin me girîng dîtîye û daxilî mijara xwe kirîye.

**2.9.6. Barış Dünyası 1962 (Kovar)**

Kovara *Barış Dünyası* piştî îhtilala ku li Tirkîyeyê çêdibe tête weşandin. Li Tirkîyeyê piştî îhtilala sala 1960î de ji alîyê fikra azadî ve gel ji alîyê dewletê ve zêde nehatîye astengkirin. Roşenbîrên Kurd jî di wê demê de fikr û ramanên xwe bêtir bi rêya ragihandinên weke rojname û kovaran dianîn ziman.

Xwedîyê Kovara *Barış Dünyası* Ahmet Hamdi Başar e kesekî azadîxwaz bûye û hevaltî bi Atatürk re kiribûye. Ji ber ku xwedîyê kovara *Barış Dünyası* azadîxwaz bû astengî ji fikrê kesan re çênedikir. Ji ber vê sedemê Musa Anter bi fikr û ramanên xwe daxwazîya ku di kovara *Barış Dünyası* de binivîsîne, bi xwedîyê kovarê re parve dike û ew jî daxwaza Musa Anter erê dike. Musa Anter di hejmara duyem kovara *Barış Dünyası* ya meha Gulanê sala 1962yan de bi serenavê Doza me ya rojhilat, pêşketina rojhilat, pêşketina Tirkîyeyê ye dest bi nivîsên xwe kirîye.

David Mcdowall li ser kovara *Barış Dünyası* wisa gotîye: 24ê meha Awrelê ya sala 1962yan de dest bi weşandinê kirîye. Di meha gulanê de, di hejmara duyemîn de gotarek li ser mijarên ku di derheqê gelên Rojhilat de astengî û qedexekirina fikrên wan dê nehêle pêşketinekê çêbibe, hatibû nivîsandin. Di gotarê de li ser girîngîya hestên kesan û kesayeta wan hewce ye ku bête dîtin, hatibû ravekirin. Di hijmara kovarê de yên şûn de jî bi berfirehî li ser pirsgirêkên gelên Rojhilatê Tirkîyeyê hatibû sekinandin (Mcdowall, 2004: 539). Bi fikr û ramanên xwe kesekî wek Musa Anter di wê kovarê de nivîsên xwe parve dike, balê kişandîye ser kovara *Barış Dünyası*. Kovara *Barış Dünyası* ji alîyê navaroka xwe ve ji alîyê kesên roşenbîr ve weke kovarek fikrê wê bêtir li ser sîstema dewletê dihate dixuyakirin. Kesek mîna Musa Anter di kovarek girêdayî sîstema dewletê de nivîsên xwe ji ber ku parve kiribû bala MİTê dikêşe ser kovarê. Li bereksê Musa Anter hinek hevalên wî kesek mîna Saît Kırmızıtoprak jî di kovara *Yönê*

de dest bi nivîsandinê kiribû. Ji ber ku kovara *Yönê* kovarek li ser fikr û ramanê çepgirîyê dihate nasîn MİT dikeve şopandina kovara *Yönê* jî.

Kovara *Barış Dünyası* li gor fikrên Musa Anter nedihate dîtin û ne jî kovara *Yönê* ne li gor fikrên kesekî wek Saît Kırmızıtoprak bû. Lewra S. Kırmızıtoprak ne kesekî çepgir bû, rastparêz bû. MİT di derheqê vê nakokîyê de wek raporekê amade dike. Musa Anter wisa behsa rapora MİTê dike. "Li gor rapora MİTê Kurdên ku çepgir di kovarên rastparêz binivîsîne û kesên ku rastparêz jî di kovarên çepgir de binivîsîne weke taktîkekê xapandinê hatîye dîtin.

Di raporê de derbas dibe ku kesek wek Musa Anter û Saît Kırmızıtoprak dê çawa bereksê hev bin?" Musa Anter û Saît Kırmızıtoprak di kuncenivîsîn xwe de li bereksê hev nivîsên xwe parve kirine û hevdû rexne kirine. Di encama kovara *Barış Dünyası* de ji ber navaroka nivîsînê Musa Anter doz li wî û xwedîyê kovara *Barış Dünyası* vedibe (Anter, 2016f: 176-180). Musa Anter bi berfirehî behsa kovara *Barış Dünyası* kirîye lê me nexwest çarçoveya mijarê xirab bibe, ji ber vê yekê me agahîyên ku di derheqê kovara *Barış Dünyası* kurt girtîye.

Kovara *Barış Dünyası*, kovarek ne aydê Kurdan bû lê di vê kovarê de pirsgirêkên Kurdan ji alîyê roşenbîren Kurdan ve hatîye nivîsîn. Di kovara *Barış Dünyası* de kesên ku Kurd bûn û tê de nivîsen wan hatine parve kirin Musa Anter, A. Efem Dolak, Doğan Kılıç Şıhhesanalı, Bahri Koçkaya, Hüseyin Sağnıç, Kemal Badıllı û hwd. di kovara *Barış Dünyası* de nivîsên xwe him bi zimanê Kurdî him jî bi zimanê Tirkî parve kirine.

Celal Temel bi van gotinan behsa kovara *Barış Dünyası* kirîye: Li gor wê demê di kovarek weke kovara *Barış Dünyası* de nivîsandina bi zimanê Kurdî gelek girîng tête dîtin. Lê ji ber ku nivîsên bi zimanê Kurdî di kovara *Barış Dünyası* de tê parvekirin jî ji alîyê gelek kesên ku li hemberê nivîsandina bi zimanê Kurdî kovar tête rexnekirin. Ji ber wan sedeman di encamê de nivîsên Kurdî di kovarê de nayên parvekirin (Temel, 2020: 346). Ji ber roşenbîrên Kurd di kovara *Barış Dünyası* de nivîsên xwe parve kiribûn bala Kurdên li derveyî Tirkyeyê jî dikeşîne ser kovarê. Malmîsanij û Mahmud Lewendî wisa behsa kovara *Barış Dünyası* kirîye: Ji ber xebatên nivîskarên Kurd yên di vê kovarê de peyamek pîrozbahîyê ji alîyê Dr. Nûrî Dersîmî ji kovarê re tête şandin. Ji bo girîngîya kovarê em dê cih bidin peyama Dr. Nûrî Dersîmî, lewra Dr. Nûrî Dersîmî li Helebê dijîya û kêfxweşîya xwe wisa dîne ziman:

*ji Nivîskarên hêja yên Barış Dünyası yê ku xwedî fikrên bilind in, wek iksîra jiyanê tesîrek li dilê min ê birîndar kirin. Divê nivîsên we, wek tava rojê ya ronak bên qebûlkirin ku cara yekem di tarîxa Tirkiya me de diçirise.*

*Ez hêvîdar im ku hûn di vê armanca xwe ya însanî û bilind de biserkevin. Bi taybetî ez ber hîssên xwe yên millî we pîroz dikim ku di riya bextewarîya musteqbel a millete me de ne (Malmîsanij, Lewendî, M 1992:133-134).*

Peyama ku Dr. Nûrî Dersîmî ji kovara *Barış Dünyası* re şandîye girîngîya wê ew e ku roşenbîren Kurd yên ku li derveyî Tirkîyeyê dijîyan ji rewşa Tirkî û roşenbîrên li Tirîyeyê dijîyan haydar bûn. Ev jî ixtimala ragihandinek di navbera roşenbîrên Kurdên li Tirkîyeyê û roşenbîrên Kurd yên li derveyî Tirkîyeyê dijîyan çêbûye dide dest me. Kovara *Barış Dünyası* piştî salek û nîvan weşana xwe bi dawî kirîye. Dewlet astengîya ku li ser Kurdan ji ber ku kêm dike, roşenbîrên Kurd nivîsên xwe, fikr û ramanên xwe bi saya kovar û rojnameyan bêtir parve dikin. Di salên kovara *Barış Dünyası*yê de roşenbîrên Kurd ên ku nivîsên xwe parve dikirin di heman salê de di gelek rojname û kovarên din de jî parve kirine.

Ji wan roşenbîran yek jî jê Musa Anter e; him di kovara *Barış Dünyası*yê de û him jî di rojnameya *Dicle- Fırat*ê de nivîsên wî tên parvekirin. Rojnameya *Dicle- Fırat* bi beyankirina sedema derketina xwe ew jî bala dewletê dikêşîne ser xwe.

**2.9.7. Dicle-Fırat 1962-1963 (Rojname)**

Di 1ê Cotmeha sala 1962yan de bi berpirsyarîya Edîp Karahan rojnameya *Dicle – Fırat* li bajarê Stenbolê dest bi weşandinê kirîye.

Nivîskarên rojnameya *Dicle – Fırat*ê ji xeynî Edip Karahan Musa Anter, Canip Yildirim, Sait Elçî û gelek roşenbîrên Kurd nivîsên xwe parve kirine. Ev rojname jî ji mehê carekê derketîye. Di derketina rojnameyê de nivîsandina Edip Karahan ya “Em Ji Bo Çi Derdikevin” de mabesta derketina rojnameyê dîyar kirîye û bala dewletê kişandîye li ser rojnameyê. Edip Karahan di nivîsa xwe de desthilatdarên dewletê û polîtîkaya wan ya li ser gelê Kurd rexne kirîye. Rojnameya *Dicle – Firat* bi gelemperî li ser demokrasîyê û mafê Kurdan disekinî û li hember nijadperestîyê bertekên xwe dîyar kirîye. Di rojnameya *Dicle – Firatê* de li ser mijarên çanda Kurdî û edebîyata Kurdî jî hatinin sekinandin.

Musa Anter nivîsên xwe yên di rojnameya *Dicle – Firat*ê de parve kirine bi gelemperî li ser edebîyata Kurdî sekinîye. Di vê rojnameyê de Musa Anter bi gelemperî

mexlas bikar anîtîye. Em dê bi kurtasî li ser hinek nivîsên Musa Anter yên ku di rojnameya *Dicle – Firat*ê de nivîsîye bisekinin. Musa Anter, di rojnameya *Dicle – Firat*ê de bi maxlasên cuda nivîsên xwe parve kirîye. Bi maxlesa "Anter" di hijmara yekem ya rojnameya *Dicle – Firat*ê de bi serenavê *CAV PÎS* nivîsînek rexneyî li hember biryara midûrê Sumerbankê nivîsîye û di rojnameyê de parve kirîye. Midûrê Sumerbankê biryar daye ku axaftina kesên ku li Sumerbankê danûstendinê bike hewce ye bi bi zimanê Tirkî be.

Ji xeynî zimanê Tirkî kesên ku bi zimanekî din biaxive nikarin li Sumerbankê danûstendinê bike. Musa Anter li hember vê biryarê bi van beytên Melayê Cizîrî bersivê daye midûrê Sumerbankê: "Feyza me weke Nile, le em Dicle u Fıradın."

Musa Anter di nivîsa xwe de ji dîrokê mînakan dide ku çawa kesên weke Asûrîyan, Ereban û Eceman (Îranî) nikarîbûn zimanê Kurdî qedexe bikin, kesekî weke midûrê Sumerbankê jî nikare (Anter, 1997: 4). Dema ku em li nivîsandina bi zimanê Kurdî ya hatîye nivîsandin dinirxînin, em haydar dibin ku alfabeya Kurdî ya Celadet Elî Bedirxan ya di sala 1932yan de amade kiribû hînjî li nav roşenbîrên Kurdan yên ku li Tirkîyeyê dijîn cih negirtîye.

Di parvekirina beytên Melayê Cizîrî de tîpên "ı,u" wek "ı,u" di alfabeya ku Celadet amade kiribû li gor bikaranîna tîpan hewce ye ''i,û'' bihata nivîsandin. Di cihekî de jî tîpa "e" li şûna tîpa "ê" ve hatîye bikar anîn. Bi gelemperî dema ku em nivîsandina bi Kurdî ya di rojnameya *Dicle – Firat*ê de li gor alfabeya Celadet muqayese dikin hinek cudahî tên xuyakirin.

Ji ber ku Musa Anter nivîsên xwe yên di rojnameya *Dicle – Firat*ê de bi zimanê Kurdî jî parve kirine em dê bi kurtasî li ser bisekinin.

Di alfabeya ku Celadet amade dike tîpên mîna "I, Î, Ê, Û, U". Di nivîsên ku di rojnameya *Dicle – Firat*ê de yên ku bi zimanê Kurdî hatîye nivîsandin li hember alfabeya Celadet, tîpên weke "i, ı, ü, u, e" hatîye bikaranîn. Carîna li şina tîpa "Q" yê tîpa "K" li şûna tîpa "W" yê tîpa "V" hatîye bikaranîn. Di hijmara rojnameya *Dicle – Firat*ê de, di rûpela yekem de bi serenavê "Fezla Kurmanci" alfabeya ku Celadet amade kiribû cih hatîye danîn. Lê nivîsên hejmara heştemîn yên ku bi zimanê Kurmancî hatîye nivîsîn li gor bikaranîna berê hatîye nivîsandin. Yanê em dikarin bibêjin Musa Anter û kesên ku di rojnameya *Dicle – Firatê* de bi zimanê Kurmancî nivîsandîye û alfabeya ku

Celadet Elî Bedirxan ji bo zimanê Kurdî amade kirîye, zêde bikar neanîtîne. Musa Anter, di rojnameya *Dicle – Firat*ê de nivîsên xwe bi gelemperî li ser zordestîyên ku li Kurdan bûye, li ser edebîyata Kurdî û behsa helbestvanên edebîyata Kurdî ya klasîk nivîsîye.

Rojnameya *Dicle – Firat*ê heta heyşt hijmaran çap bûye û Musa Anter di her çar hijmarên ewil de nivîsên xwe parve kirine. Musa Anter, di rojnameya *Dicle – Firatê* de bi mexlasên wek “Anter, Rehşan, M. Anter û Dicle” bikar anîye.

Em dê serenavê nivîsên Musa Anter û mexlesên ku di rojnameya *Dicle–Firat*ê de bi kar anîne tevî rûpel û hijmara rojnameyê di tabloyê de parve bikin. Serenavên ku nivîsên Anter yên di rojnameya *Dicle–Firat*ê de parvekirine ev in:

**Tabloya 2.2. Dicle–Firatê de Parvekirine ev in**

| Hijmar Rojnameyê | Rûpela rojnameyê | Serenavên Nivîsê | Mexlesa Nivîskar |
|---|---|---|---|
| Hijmara yekem (1) | 1-3-4 | - Cav pîs<br>- Melle Ahmede Ciziri | - Anter<br>- Rahşan |
| Hijmara duyem (2) | 1-4-4 | - Doğunun Celladı<br>-Şex Ahmedé Xané | -M. Anter<br>-Rahşan |
| Hijmar (3) | 1-3-4 | -Zavallı Falih Rıfkı Atay<br>-Tebbet Yeda Ebi Lehebi<br>-Haci Kadir Koi | - Anter<br>- Dicle<br>- Rahşan |
| Hijmar (4) | 1-7<br>5-8 | - Uyanalım Ya<br>- Seçmeler | - Anter<br>-Rahşan |

Bi armanca zelalkirina mijarê, me xwest ku em tabloyek bi vî rengî amade bikin da ku mijar bêtirîn bête fêhmkirin. Di rojnameya *Dicle – Firatê* de li ser edebîyat, çand û folklora Kurdî jî xebat tên kirin û bi xebatên ku dikin jî bala Kurdên derveyî Tirkîyeyê jî dikêşîne serxwe. Malmîsanij û Mahmud Lewendî wisa behsa *Dicle – Firat* kirîye: Rojnameya *Dicle – Firat* li ser Folklorê jî lêkolînan dikin. Ji bo karê lokolînan jî komîteyekê pêk diînin. Kesên ku endamê vê komîteyê; Hüseyin Sağnıç, Bahri Koçkaya, İsa Şans, Zülküf Karahan, Mikayil Turan, Fevzi Yıldırım, Hüsamettin Aygören e. Bi

weşandina rojnameya *Dicle – Firat*ê bala roşenbîrên Kurd yên ku li dewleta Sûrî dijîyan dikêşîne. Roşenbîrên Kurd Osman Sebrî ji bo rojnameya *Dicle – Firat*ê helbestekê bi van hêvîyan dinivîsîne.

*"Min hêvî daye Dicle – Firat barê me rake*

*Di warê ziman li rojhilat xelkê me şa ke*

*Zimanê me yê paşde mayî pîçkî bide pêş,*

*Va ye ji bo wî sipasên xwe ez dikim pêşkeş." (Malmîsanij Lewendî, M 1992: 135-140)*

Helbesta Osman Sebri hêvîyên Kurdên ku li derveyî Tirkîyeyê bi weşandina berhemên li ser kurdîtîyê çawa geş dibe, derdixe ber çavan.

Piştî demekê astengî li ser roşenbîrên Kurd zêde dibe. Malmîsanij wisa behsa encama rojnameyê kirîye: Rojnameya *Dicle – Firat*ê jî bi destpêkirina bûyera 23yan ve piştî hijmara heştemîn tête girtin. Hijmarên rojnameya *Dicle – Firat*ê 2, 3, 4, 5 û 6 bi biryara dadgehê tên komkirin. Ji ber nivîsên ku di rojnameya *Dicle – Firat*ê de parve kirine, kesên weke Edip Karahan û Musa Anter têne girtin. Di sala 1963yan de rojname jî li ser pîya namîne, weke rojnameyên berîya xwe ew jî bi dawî dibe (Malmîsanij, 1997: 6). Piştî ku rojnameya *Dicle – Firat* tê girtin û bûyera 23yan jî di encamê de Musa Anter û roşenbîrên Kurd yên ku tên girtin carek din tên berdan. Musa Anter piştî berdana ji zindanê di kovara *Deng* de nivîsên xwe parve kirîye.

#### 2.9.8. Deng (Doğunun Sesi) 1963 Kovar

Kovara *Deng* di 15 meha Awrelê ya sala 1963yan de li Stenbolê dest bi weşanê kirîye. Kovara *Deng* ji mehê carekê tê weşandin û li ser mijarên pirsgirêkên gelê Kurd bêtirîn sekinîye. Celal Temel bi van gotinan li ser kovara *Deng* sekinîye: Girîngîya vê kovarê ew e ku di dema Komeleya Tirkîyeyê de yekem yek ji wan kovarên ku eşkere li ser zimanê Kurdî nivîs parve kirine.

Armanaca nivîsandina bi zimanê Kurdî û zimanê Tirkî di kovarê de dîyar kirine. "Di rûpela ewil de bi zimanê Tirkî "Doğunun Sesi" û bi zimanê Kurdî jî " Hêvîya Welat" hatîye nivîsîn" (Temel, 2020: 348-352). Di pêşgotina kovara *Deng*ê de nivîsandina ku hatîye nivîsandin di derheqê kovarê de weke delîlekî xirap tête dîtin. Lewra nivîsîna di pêşgotina kovarê de li ser zilm û zordestîya li gelê Rojhilat bi destê desthilatdaran ku hatîye kirin nivîsandîye. Nafise Varol Şener wisa behsa kovara *Deng*

kirîye: Ji ber astengîyên ku li gel tê kirin û xizanîya ku gel tê de ye, Rojhilat mîna cihekî mahrûmîyetê dibîne.

Sedema wan bûyerên ku tên nivîsandin jî kesên desthilatdar dibîne. Ji xeynî wan pirsgirêkên ku gel tê de ye di kovara *Deng*ê de astengîya ku li ser zimanê Kurdî jî behs dibe. Bi gelemperî nivîsên ku di kovara *Deng*ê de hatîne nivîsandin û nivîskarên kovarê bûnin sedema girtina kovara *Deng*ê (Şener, 2019: 118-119). Di pêşgotina kovara Dengê de bi serenavê " Niçin Çıkıyoruz"(Em çima derdikevin) bi mabesta çima em vê kovarê derdixin de nivîsandina li ser dema avakirina Komeleya Tirkîyê û fikrên Atatürk tê sekinandin.

Fikrên ku Atatürk di derheqê yekîtîya Komeleya Tirkîyeyê de dibêje di kovarê de jî cih digire û ji ber ku gotinên Atatürk nayên cih sedema wê jî kesên ku sîstema dewletê di dest wan de ye tête dîtin û rexne li wan tête kirin.

Di kovara *Deng*ê de nivîsa Ziya Gökalp ya ku li ser yekîtîya Kurd û Tirkan "Türkler ve Kürtler" jî di hejmara yekem ya kovara *Dengê* de tê parvekirin. Musa Anter bi van nivîs û mexlesan di kovara *Deng*ê de fikrên xwe parve kirîye: Musa Anter him bi navê xwe û him jî bi mexlesa Rehşan nivîsên xwe di kovara *Deng*ê de parve kirîye.

Nivîsa Musa Anter ya ku di kovara *Deng*ê de hatîye parvekirin *Kürtlerde Din* di hejmara kovarê ya yekem de û di rûpela 8an de hatîye parvekirin. Di hijmara yekem ya kovara *Deng*ê û rûpela 10-11 de jî Musa Anter bi mexlesa Rahşan bi serenavê "Varta Tarihi" nivîseke xwe parve kirîye û di rûpela 7-11 de jî îlana pirtûka Musa Anter ya bi navê *Qimil* jî hatîye kirin. Di hijmara duyem ya kovara *Deng*ê de Musa Anrter di rûpela 15an de *Kürtlerde Din* nivîsa xwe ya di hijmara yekemîn de domandîye. Di rûpela 12yan, ya hijmara duyemîn de jî bi mexlasa Rehşan, bi serenavê "Kürdün Kökü" nivîseke wî di kovara *Deng*ê de cih girtîye.

Musa Anter di nivîsa xwe ya bi navê "Kürdün Kökü" de rêxistina wê dema ku nerîna kesên Tirk ya li ser hebûna Kurdan kirîye mijar. (Anter, 1998: 1-11/ 12-15). Her çi qas nivîsa "Kürdün Kökü" weke laqirdî hatîye parvekirin jî dema ku em bi gelemperî nivîsên di wê demê de, yên li ser hebûna Kurdan hatîne nivîsandin didin ber çavan bi gelemperî hebûna Kurdan nayê pejirandin. Musa Anter jî li hember nepejirandina Kurdan sekinîye û hebûna Kurdan him ji alîyê ziman û him jî ji alîyê çandê ve yek ji wan neteweyeke serbixwe ye, di nivîsa xwe de parve kirîye (Anter, 1998: 1-11/ 12-15).

Di kovara *Deng*ê de li ser zimanê Kurdî û çanda Kurdî bi nivîsên balkêş li ser tê sekinandin.

Kovara *Deng* di 15 Awrelê ya 1963yan de hejmara yekem û di 15 Gulanê ya 1963yan de jî hijmara duyem çap bûye û weşandina wê jî ji alîyê dewletê ve bi dawî bûye. Piştî ku kovara *Deng* jî tête girtin Musa Anter bi daxwaza hevalê xwe di *Doğu Dergisiyê de* nivîsên xwe parve dike.

**2.9.9. Doğu Dergisi (Kovar) 1969**

Piştî sirgûnîya Musa Anter ya li Çanakkaleyê qedîyaye xwedîyê kovara *Doğu*yê Mehmet Güneş Şahiner fikra ku wê kovarekê li ser pirsgirêkên Rojhilatê Tirkîyeyê derxe, bi Musa Anter re parve kirîye da ku Musa Anter jî bi nivîsên xwe alîkarîyê bide kovarê.

Musa Anter jî gotîye ger ku kovar bi fikrên çepgir û ilmî be daxwaza nivîsên xwe dê parve bike, qebûl kirîye. Kovara *Doğu* di sala 1969an de li Stenbolê dest bi weşandinê kirîye. Musa Anter bi nivîsa xwe ya “li ser zimanê Kurdî” di kovara *Doğuyê* de parve kirîye. Di hijmara kovarê ya duyemîn de jî li ser mijara pirsgirêka Kurdan çawa ku Lenîn pirsgirêkên bi vî rengî bi çi rêyî çareser kirine, li gor fikra Lenîn çareserîya pirsgirêkê tê analîzkirin. Malmîsanij û Mahmut Lewendî wisa behsa vê kovarê kirîye: Ew kovar ji alîyê kesên ku xwedîyê fikrên çepgir nivîsên wan têde tê parvekirin. Li ser bergê kovara *Doğu*yê “Bijî biratîya Kurd û Tirkan û kovareke antî-faşist, antî-asîmîlasonîst, antî-emperyalist, antî-şovenîst û antî-feodal e ku bi ronahîya sosyalîzima ilmî li ser meseleya Rojhilatê disekine.” armanca derxistina kovarê bi van gotinan hatîye dîyarkirin.

Kovara *Doğuyê* ji 32 rûpelan pêk hatîye, ji mehê carekê derketîye û piştî du hijmaran weşandina wê bi dawî bûye. Nivîsên Musa Anter yên ku di kovara *Doğuyê* de derbas dibin ev in: “Li ser Zimanê Kurdî, Yekbûn / Kovara ku di 1914an de Derketîye (Malmîsanij, Lewendî, M. 1992: 196-197). *Doğu Dergisi* li ser fikra çepgirîyê û bi dawaza wekhevîyê dest bi weşana xwe kiribû.

Musa Anter wisa behsa girîngîya *Doğu Dergisiyê* kirîye: Ji ber karê me yê kovarê him jî alîyê gelê Kurd ve û him jî ji alîyê çepgirên Kurd û Tirk ve her tim peyamên pîrozbahîyê ji me re dihatin. Heta wê demê çepgirên li Tirkîyeyê kesek wek kovara *Doğuyê* li ser pirsgirêka Kurdan nesekinibûn, cara yekem kovara *Doğuyê* weke çepgir li

ser vê mijarê sekinîye. Lê ji ber ku li ser berga kovara *Doğu*yê bi slogana “Bijî biratîya Kurd û Tirkan” hatibû nivîsîn berteka hikumetê dereng nema û kovara *Doğuyê* piştî hijmara duyemîn tête girtin. Xwedîyê kovarê Mehmet Güneş Şahiner têtê girtin û paşê jî Musa Anter jî bi sedema tevgera xebatkaran ve ew jî têtê girtin (Anter, 2016f:212-214). Qedera kovara *Doğuyê* jî wek mîna yên berîya xwe digihêje encameke dîyarde, yanê bi dawî bûye. Piştî ku *Doğu Dergisi* ji alîyê dewletê ve têtê girtin, xwedîyê kovarê û kesên ku di kovarê de nivîsandibûn dozek li wan vedibe û ew têne binçavkirin. Di encama binçavkirinê de Musa Anter têtê berdan û heta salên nohdî jî di kovar û rojnemeyan de nivîsên wî zedê me bi dest nexistîne. Di navbera salên 1969-1992an de nivîsên Anter en ku di kovar û rojnameyan de derbas bûne sedema kêmasînîya wan dibe ku her tim vekirina dozen li Anter vebûne pêşîya nivîsên wî asteng kirine.

**2.9.10. Tewlo (Kovar)1992**

Kovara *Tewlo*, di sala 1992yan de, li Stenbolê dest bi weşanê dike. Malmîsanij û Mahmut Lewendî bi van gotinan behsa kovara *Tewlo*yê kirîye: *Tewlo*, kovareke mizahî ye û nivîsên bi zimanê Kurdî û Tirkî tê de, tê parvekirin. Li ser hijmara kovara *Tewlo*yê tê nivîsîn ku ev kovar kovareke pêkanîna hefteyî ye. Di hijmara duyemîn ya kovara *Tewloyê* de Musa Anter nivîsek bi serenavê “Îcar Karê Xwedê Ma Çi” parve kirîye. Her hijmareke kovara *Tewlo*yê ji 16 rûpelan pêk hatîye û kovar weşandina xwe hînjî didomîne tê gotin (Malmîsanij û Lewendî, 1992: 428-429). Di derheqê vê kovarê û nivîsa Anter hew ev agahî me bidist xistîye. Di kovara *Tewlo*yê ji xeynî wê nivîsa Anter nivîsek din me di vê kovarê de peyda nekirîye.

**2.9.11. Yeni Ülke (Rojname) 1990, Welat (Rojname) 1992, Rewşen (Kovar) 1992, Özgür Gündem (Rojname) 1992**

Musa Anter ji xeynî rojname û kovarên ku me bi kurtasî behsa wan kirine di *Yeni Ülke, Welat, Rewşen û Özgür Gündem* de nivîsên xwe parve kirine. Yaşar kaya di derheqê van rojname û kovaran de wisa agahî dane: Di 20 meha Cotmehê ya sala 1990î de bi weşandina rojnameya *Yeni Ülke* her hefte nivîsên Musa Anter di rojnameyê de parve dibûn.

Ji xeynî rojnameya *Yeni Ülke* jî Musa Anter di kovar û rojnameyên weke *Welat, Rewşen, Özgür Gündem û Tewlo* de nivîsên xwe parve dikirin. Heta ku hate kuştin jî Musa Anter nivîskarî di *Yeni Ülke, Welat û Özgür Gündem* de kirîye û nivîsên xwe

parve kirine (Kaya, 1993: 8). Malmîsanij û Mahmut Lewendî behsa kovareke bi navê *Dengê Sêrek* kirîye ku Musa Anter jî di wê kovarê de nivîsandîye. Kovara *Dengê Sêrek* di sala 1969an li bajarê Stenbolê dest bi weşandinê kirîye. Kovareke bi zimanê Kurdî û Tirkî nivîs tê de tên parvekirin. Kovara *Dengê Sêrek* ji alîyê Komela xortên Siwêregî, yên ku xwendina bilind dikirin tê derxistin. Di kovara *Dengê Sêrek* de nivîsek bi navê "Nameyek ji bo Parlementerên Rojhilatê" tête parvekirin, ev name bala gelek kesan dikêşîne ser kovara *Dengê Sêrekê.* Di nameyê de daxwaza bertekdayîna li hember qanûna parastina nizama qanûna esasî dike. Piştî ku qanûn derdikeve jî li Rojhilatê Tirkîyeyê miting çêdibin li hember derketina qanûnê. Musa Anter jî bi nivîsa xwe ya "Li Dinyê Grûbên Zimanê Sereke" di kovara *Dengê Sêrek* de parve kirîye (Malmîsanij, Lewendî, M 1992:198-203). Di vê beşê de jî weke ku me behs kirîye nivîskar Musa Anter ger bi nivîsên xwe yên di kovar û rojnameyan de û ger ku bi çapkirina kovar û rojnameyan ji alîyê çapemenîya Kurdî ve kedek mezin daye. Ew keda ku hatîye dayîn, Anter di nav civakê de kirîye kesekî nemir, lewra ger ku li kolan û sikakên bajarên rojhilatê Tirkîyeyê û ger ku li yên bajarên rojavayê Tirkîyeyê navê Musa Anter hatîye bi cihkirin.

Nemirbûyîna navê Musa Anter bi berhemên ku li ser navê wî û gotinên wî yên ku di nav gel de bi hertim wî zindî dikin. Di beşa xebata me ya sêyem de em bi awayekî berfireh li ser bandora Anter ya di nav civakê de bi hûrgilî sekinin. Ev lêkolîn bandora Anter ya di nav civakê de megihiştan encameke gelek gering.

# BEŞA SÊYEM

## BANDORA MUSA ANTER

Jîyan û mirin di xwezaya her xwedî rihanîyetekî de heye. Çawa ku di Qur'ana pîroz de di sureya Ankebûtê û ayeta 282yan de hatîye nivîsîn "Her kesên xwedî nefs dê mirinê bitamîne." Ev gotin jîyan û mirinê bi her awayî tesdîq dike. Musa Anter jî yek ji wan xwedî rihanîtîyekî bû, mir û çû ser dilovanîya xwe. Ji bo kesên roşenbîr û xwedî berhem mirina şênber ne girîng e. Lewra mabesta wan kesên ku di jîyana xwe de tiştên ku bikin û her tim tiştên wan ji alîyê kesan ve bête xwendin an jî li ser bête lêkolîn wan wek kesên nemir di jîyanê de bi cih dike. Firat Ceweri li ser girîngîya nivîskar û roşenbîran wisa bahs kirîye: Ji bo ku nivîskarek an jî roşenbîrek çêbibe hewceyî demek dirêj heye. Di her sedsalî de çend nav derdikevin pêş, ew jî ji bo ku bibin neynika civaka xwe, xîret dikin. Civak bi saya wan çend kesên nivîskar û roşenbîr bawerîyê tînin û bi hêvî li pêşerojê dinhêrin. Mabesta wan kesên ku pêşenktîyê dikin ne ji bo desthilatgirîyê ye. Mabesta wan, desthilatdar bi rêya demokrasîyê jîyaneke xweş bide gel û bi vê hişmendîyê tekoşînekê li hember wan desthilatdaran datînin.

Li cihên ku demokrasî pêk hatîye, wan kesên ku di wê rêyê de tekoşîn kirine qîymet didin wan û wan pîroz dikin. Lê cihên ku nesîbê xwe ji demokrasîyê negirtîne jî ji kesên roşenbîr û nivîskar re zindan û lêdan û mirinê layiqî wan dibînin. Di vê sedsala ku çûye di nav Kurdan de jî yekî wek Musa Anter û Edîp Karahan min navê wan bihîstîye (Ceweri, 2015).

Bandora kesên nivîskar û roşenbîr jî ji naskirina wan ya di nav civakê de dîyar dibe. Musa Anter ger bi berhemên xwe, ger bi gotinên xwe û ger jî bi roşenbîr û nivîskarîya xwe di nav civakê de kesekî nemir têtе dîtin. Anter nêzî sî sal bûye çûye ser dilovanîya xwe, lê hîn jî berhemên wî di nav gel de tên xwendin, gotinên wî di civakê de derbas dibin û rojname, kowar behsa wî dikin. Gotar û berhem li ser fikr û ramanên wî tên nivîsîn, helbestvan di nava helbestên xwe de bi şewq weke Apê Musa behs dikin. Gotinên wî her tim li hember zilmê ji kesên bindest re dibe sper. Kesên ku di civakê de pêşeng têtе dîtin ji gelek alîyan ve bandorê li wê civakê dikin. Civak li gor fikr û ramanên xwe kesên pêşeng kategorîze dikin û bi kîjan alî ve nêzî xwe bibînin ew alî di civakê de derdikeve pêş. Ji bo ku cihên wan kesên di nav civakê de bi girîngî bête tesbîtkirin jî rêya herî baş jî hewce ye hay ji civakê hebe.

Bi saya anketa ku me bi vê armancê çêkirî rewşa nivîskar Musa Anter ya di nav civakê de encamekê dide dest me. Anketa ku me amade kirî bi mabesta kesekî mîna Musa Anter di civaka xwe de pêşeng hatibû dîtin, bandora wî ji kîjan alîyan ve li ser civakê çêbûye em dê tesbît bikin. 450 kes beşdarî anketê bûn û bersivên pirsan işaret kirin. Li gor encama anketa ku me bi dest xistîye em dê li ser bandora Anter ya li ser civakê li gor bersivên beşdervanên anketê yek bi yek binirxînin. Di beşa xebata me ya çarem de jî em dê bi gelemperî pirs û bersivên anketê analîz bikin.

### 3.1. BANDORA MUSA ANTER YA POLÎTÎK

Musa Anter, bi fikr û ramanên xwe her tim mirovahî derdixiste pêş. Her tim xwe li ba kesên bindest, xizan û mihtacî alîkarîyê didît. Zilm û neheqî li ku derê baya, ji alîyê kî yan baya her tim bertek li hemberê wan didan. Xwe bêtir aîdên fikrên çepgir didît lê qet xwe di ser kesî re û di bin kesî re jî nedidît. Ji ber ku Kurd bû û zilm li Kurdan bêtir dihate kirin nivîsên wî jî her tim li hemberê kesên zilimkar bû. Çawa ku hevalên wî yên Kurd hebûn, ên ku Tirk jî ew qas hebûn. Berteka wî her tim li hember desthilatdaran bû û her tim zilma bi destê wan ya li ser gelên Tirkîyeyê bi çi awayî dibû dianî ziman.

Di jîyana Musa Anter de fikrên polîtîk bêtir dernakeve pêş me, lewra Musa Anter bêtir li ser nivîskarîyê sekinîye. Binçavkirina wî û zindankişandina wî herweke ji ber fikrên polîtîk bête dîtin jî lê wek me berê jî behs kiribû, fikr û ramanên Musa Anter li hember zilmê bêtir dixuye. Fikr û ramanên Musa Anter bêtirîn bi alîyê çepgirîyê dîyar kirine. Em dikarin di çarçoveya fikrên çepgirîyê de fikra Musa Anter ya polîtîk bibînin. Ji bo ku em bandora Anter bi çi awayî li ser civakê çêbûye tesbît bikin, bandora wî ji kîjan alî ve li ser civakê bûye em bibînin, me anketek amade kir. 450 kes beşdarî anketê bûn. Di anketê de me ji beşdarvanên anketê re pirsa “Li gor we Musa Anter xwedîyê fikr û ramanên çawa bûn?” Li gor van vebijarkan; “Aştîperest, Humanîst, Welatparêz, Nijadperest, Polîtîk, Azadîperest, Nizanim” beşdervanan bersivên pirsê wisa dabûn. Kesên ku Anter Aştîperest dibînin: 135 kes, humanîst dibîne 145, welatparêz dibîne 135, Nijadperest dibîne1, polîtîk dibîne 60, azadîperest dibîne 156 û kesên weke nizanim bersivandîne 103 kes in. Di pirsek me ya anketê de jî me pirsî bû: “Li gor we di kîjan civînan de navê Musa Anter bêtir derdikeve pêş?” 126 kes bersivandibûn ku di

civînên polîtîk de navê Anter derdikeve pêş. Di beşa xebata me ya çaremîn de di tabloya yazdemîn û çardemîn de me pirs û bersivên van pirsan dîyar kirine.

Di encama anketê de jî diyar dibe kesên ku Anter polîtîk dibînin 60 kes in. Li gor bersivên beşdervanan dema ku em analîz dikin bondora Anter ya polîtîk li ser civakê zêde xuya nabe. Di civînên polîtîk de navê wî derbas bibe jî di encamê de Anter kesekî polîtîk nehatîye dîtin. Musa Anter di jîyana xwe de bi nivîsên xwe bala dewletê û bala civakê her dem dikêşand ser xwe. Rola wî ya li ser edebîyata Kurdî û çapemenîya Kurdî di civaka Kurdan de her wext dîyar bûye. Hinek berhemên wî rê li ber şaxên edebîyata Kurdî û zimanê Kurdî vedike. Bandora wî ya li ser edebîyata Kurdî piştî 30 sal dilovanîya wî jî di nav civakê de cih digire.

## 3.2. BANDORA MUSA ANTER YA LI SER EDEBÎYATA KURDÎ

Musa Anter di jîyana xwe de berhemên bi bandor nivîsîne. Anter ji ber şert û mercên dema ku tê de ye, gelek astengî ji ber nivîsên xwe kişandine. Em dê li ser girîngîya berhemên wî yên bandor li edebîyata Kurdî kirine bisekinin. Berhema wî ya yekemîn *Qimil* e. Navê berhemê ji helbasta *Qimil* ya di sala 1959an de di rojnemaya *İleri Yurt*ê de bi zimanê Kurdî/ Kurmancî parve kirîye, girtîye.

Di sala 1962an de weke pirtûk hatîye çapkirin. Ji ber ku di wê demê de nivîsandina Kurdî qedexe bû, kesên ku bi zimanê Kurdî dinivîsandin ji alîyê dewletê ve weke xayîn dihate dîtin. Ji ber ku Musa Anter bi Kurdî dinivîse, dewlet gelek astengîyan ji Musa Anter re derdixe. Bandora berhema *Qimil* ya li ser berhemên bi zimanê Kurdî hatîne nivîsandin jî gelek çêbûye. Ji ber ku berîya berhema *Qimil* li Komeleya Tirkîyeyê astengî gelek li ser ziman û edebîyata Kurdî hebûn. Di destpêkê de helbesta *Qimil* û paşê jî berhema *Qimil* astengîyê bi bedelên mezin dişikîne. Bertekên ku ji alîyê rojname û nivîskarên Tirk ve li hember nivîsandina bi Kurdî hatîye kirin gelek bûn. Ew bertekdayîna nivîskarên Tirk, bû sedema ku roşenbîr û nivîskarên Kurd ji alîyê ziman ve bêtir hişyar bibin. Lewra berhem û nivîsên bi zimanê Kurdî di rojname û kovaran de li gor salên berîya berhema *Qimil* zêdetir nehatîne nivîsandin. Ji alîyê ziman û edebîyata Kurdî ve berhema *Qimil*, di dema KT “Komeleya Tirkîye”yê de hişyarbûyînek nivîsandina bi zimanê Kurdî bi gelê Kurd û roşenbîrên Kurd re çêdike.

Di bin helbesta *Qimil* de Musa Anter bi zimanê Tirkî “Üzülme bacı, seni kurtaracak kardeşlerin yetişiyor...” yanê (Xemgîn nebe xwişkê, xwişk û birayên te dê te ji vê rewşê xilas bikin mezin dibin) dinivîse.

Musa Anter di sala 1989an de di pêşgotina pirtûka Günay Aslan ya bi navê “Yas Tutan Tarih 33 Kurşun” de encama ku hişyarbûyîna Kurdan serkeftî dibîne û di gotina xwe ya di paş helbesta *Qimil* de dibêje: “Xemgîn nebe xwişkê, xwişk û birayên te dê te ji vê rewşê xilas bikin, mezin dibin” niha gotina wî pêk hatibû û ji dîtina vê pêkhatinê jî xwe aram dibîne (Anter, 2013c: 11). Nîvîsên Anter bi girîngîya xwe di her demê de bala kesên bi çapemenîyê û edebîyata Kurdî re têkildar in, dikêşand.

Musa Anter di sala 1948an de di rojnameya *Dicle Kaynağı*yê de li ser bûyera 33 gule disekine û daxwaza eşkerekirina kesên ku bûne sedema kuştina wan 33 kesan di rojnameyê de dinivîse. Di sala 1989an de yanê piştî 41 sal Günay Aslan jî li ser vê bûyerê disekine û berhema Günay Aslan ya “Yas Tutan Tarih 33 Kurşun” xelata Yunus Nadi Armağan distîne. Musa Anter, bi nivîs û berhemên xwe bandora ku li ser kesên Kurd in û bi edebîyatê re mijûl dibe bêtir derdixe pêş me. Musa Anter bi dîtina ew kesên ku di helbasta *Qimil* de bahsa wan dike û dê xwişka xwe ji xemgînîyê xilas bike aram bûye. Lewra dibe şahidê Kurdên ku li doza wî dipejirand xwedî derbikeve dibîne (Aslan, 1989: 7-9). Anter, di qada şanoyê de jî bi xebata xwe rê li ber edebîyata Kurdî û şanogerên Kurd vedike.

Berhema wî ya duyem *Birîna Reş* e. Cureyê berhema *Birîna Reş*, şano ye. Ji damezarandina Komeleya Tirkîyeyê û heta wê demê berhemeke şanoyê ji bo Kurdan heta niha nehatîye tespîtkirin. Musa Anter berhema *Birîna Reş* di sala 1959an de dema ku di zindina leşkerîyê ya bi navê Harbîyeyê de bû dinivîse. Lê di sala 1965an de weke pirtûk tê çapkirin. Berhem bi zimanê Kurdî tê nivîsîn. Ji ber ku zimanê Kurdî ji alîyê dewleta Tirkîyeyê ve tê qedexekirin, dozek li Musa Anter vedibe û berhem li Tirkîyeyê tête qedexekirin. Navaroka berhemê li ser Kurdên ku ji nezanî û xizanîyê ve tengasî dikêşîne sekinîye. Derd û kulên ku Kurd ji ber sîyaseta desthilatdaran dikêşîne û nexweşîya di nav gel de bi navê *Birîna Reş* belav dibe di berhemê de jî cih digire.

Şanoya *Birîna Reş* ji çar perdan pêk tê. Girîngîya vê berhemê him edebîyata Kurdî û him jî zimanê Kurdî bi gelek dewletan re daye nasîn. Yavuz Çamlibel di derheqê berhema *Birîna Reş* de wisa dibêje:

> *Dema ku berhema Birîna Reş tête çapkirin hikumeta Tirkîyê di destpêkê de berhemê qedexe dike. Bi saya roşenbîrên Kurd berhema Birîna Reş li gelek dewletên Ewropayê ve belav dibe û wergerî zimanê wan dewletan dibe. Li dewleta Belçîqa, Holanda, Çekoslovakya, Danîmarka, Îsveçê ve him di televîzyonên wan de û him jî li hember temaşevanan ve ji alîyê lîstekvanan ve şanoya Birîna Reş hatîye lîstin (Çamlıbel, 2010: 82,83).*

Berhema *Birîna Reş* çawa ku li Tirkîyeyê tête çapkirin, herwisa tête qedexekirin. Ji ber ku li Tirkîyeyê berhema *Birîna Reş* tê qedexekirin li derveyê Tirkîyeyê, li hinek welatên Ewropayê belav dibe. Yek ji wan dewleta Ewropayê jî Îsveç e. Berhema *Birîna Reş* bi zimanê Îsveçê tête wergerandin û li wî welatî derdikeve. Ercan Gün bi van gotinan behsa berhema *Birîna Reş* dike: Dema ku şanoya *Birîna Reş* li welatê Ewropayê balê dikêşîne ser xwe wênesazekî Îsveçî şanoya *Birîna Reş* weke wêne saz dike. Ji ber ku mafê telîfê ya berhema *Birîna Reş* heye, wênesazê ku wê şanoya weke wêne saz dike mafê telîfa berhemê ji Musa Anter re dişîne. Ev bûyer di dema ku ji bo wekîltîyê de ji alîyê aborîyê ve ji Musa Anter re dibe alîkarê hilbijartinê (Gün, 2011: 43). Ji alîyê edebîyata Kurdî ve girîngîya berhema *Birîna Reş* ev e. Ev berhem berhemek şanoyê ye û di dema KTyê de bi zimanê Kurdî di qada şanoyê de yekem berhem e. Ji ber vê sedemê berhema *Birîna Reş* di edebîyata Kurdî de cihek girîng digire. Bandora Anter ya li ser Edebîyta Kurdî bêtir şênber bûye.

Berhema Musa Anter ya li ser edebîyata Kurdî bandor kirî ya sêyem *Hatıralarım* “Bîranên Min” e. *Hatıralarım* “Bîranînên Min” çapa yekem di sala 1990î ji alîyê weşanxaneya Dozê ve û çapa duyem jî di sala 1991an de ji alîyê weşanxaneya Yönê ve tê çapkirin.

Di pirtûka *Hatıralarım* de Musa Anter li ser bûyerên ku di jîyana wî de derbas bûne kûr disekine. Di nav gel de pirtûka Musa Anter ya herî tête naskirin ev pirtûk e. Pirtûka *Hatıralarım* ji ber ku nivîskar jîyana xwe bi destê xwe nivîsandîye cureyê pirtûkê bîrname ye. Ji dema avabûna KTyê û heta sala 1990î nivîskarekî ew qas bi kurdbûyîna xwe derketîye pêş û pirtûkek bi cureyê bîrnameyê nivîsandîye ji xeynî Anter me tesbît nekirîye.

Heta ku berhemek bi cureya bîrnameyê neyê dîtin di nav nivîskarên Kurd de bi cureya bîrnameyê berhema yekem em dê *Hatıralarım* qebûl bikin. Girîngiya pirtûka Musa Anter *Hatıralarım* li edebîyata Kurdî cureyê bîrnameyê derxistîye pêş. Ji ber ku naveroka pirtûka *Hatıralarım* behsa her çar perçeyê Kurdistanê dike û di naveroka xwe

de gelek bûyerên dîrokî yên li Kurdistanê çêbûne jî vedihewîne û bala gelek kesan dikêşîne ser xwe. Berhema *Hatıralarım* girîngîya wê ya di nav gel de bala Kurdên li derveyî Tirkîyeyê jî kişandîye ser xwe. Yek ji wan kesên ku bala wî dikêşîne, nivîskar Muhammed İzeddin e. Pirtûka *Hatıralarım* di sala 2021an de ji alîyê nivîskar Muhammed İzeddin wergerî zaravayê Kurdî yê Soranî kirîye. Wergerîna berhema *Hatıralarım* bi zimanê Kurdî / Soranî piştî 31 sal di ser çapkirina wê ya yekem çûbû jî tesîra wê ya li ser gel û edebîyatê dîyarde kirîye. Ji bo ku em bandora Musa Anter ya li ser edebîyata Kurdî bi çi awayî çêbûye tesbît bikin me di anketê de ev pirse pêşkêşî beşdervanên anketê kirine: "Li gor we di kîjan civînan de navê Musa Anter bêtir derdikeve pêş?" Beşdervanên anketê herî zêde 146 kes di civînên ku behsa edebîyatê de hatîye kirin navê Anter derketîyê pêş işaret kirine. Di pirsek me ya anketê de jî me pirsîbû: "Li gor we Musa Anter ji alîyê edebîyata Kurdî ve nivîskarekî çawa bû? Serkeftî ye, ne serkeftî ye? Kesên ku ev pirse bersivandine 375 kesan işaret kirine ku Anter serkeftî ye. Pirsek me ya anketê jî li ser berhemên Musa Anter bû, me wisa pirsîbû: We herî dawî kîjan pirtûka wî xwendîye? Kesên ku beşdarî anketê bûne di bersivên xwe de 141 kesan pirtûka *Hatıralarım*, 78 kesan *Birîna Reş* û 43 kesan jî berhema *Kımıl* işaret kiribû. Di beşa xebata me ya çaremîn de, di tabloya dozdemîn, sêzdemîn û çardemîn de me pirs û bersivên van pirsan dîyar kirine. Musa Anter bi hebûna xwe ya di nav civakê de çawa ku di saxbûyîna xwe de dîyarde bû piştî ku çûbû ser dilovanîya xwe jî di nav civakê de bandora wî xuya dibe.

## 3.3. BANDORA MUSA ANTER YA LI SER CIVAKÊ

Musa Anter ger ku bi berhemên xwe û ger ku bi nivîsên xwe yên hicwî her tim bandora wî li ser civakê çêbûye. Girîngîya wî ya herî taybet him zimanê wî û him jî xwe yekî ji gel dîtibû. Di salvegerên roja kuştina Musa Anter de her tim ji alîyê gel û kesên roşenbîr, nivîskar, parlementer, helbestvan û hwd. ve kuştina Musa Anter tête şermezarkirin. Di sala 1993yan de çalakîyek bi navê Musa Anter û şehîdê çapamenîyê ji alîyê rojnameya *Özgür Gündemê* ve hatîye lidarxistin. Her sal di dîroka ku Musa Anter hatîye kuştin de li ser navê Musa Anter kesên ku bixwazin bi nivîsên xwe daxilî wê çalekîyê dibin.

Nivîsên li ser Anter tên parvekirin roj bi roj zêde bûne. Ji alîyê edebîyatê ve jî, ji alîyê sinema û şanoyê ve jî fikr û ramanên Anter di civakê de zindîbûna xwe derxistîye pêş.

Ji alîyê derhêner Aydin Orak bi navê *Araf* weke tîyatroyê jîyana Musa Anter derket dika sînemayê. *Araf* li gelek bajar û navçeyê Tirkîyeyê û paşê jî li dewletê Ewropa û Avustiralya weke tîyatro hatîye pêşkêşkirin. Paşê ji alîyê derhêner ve weke flîmek sînemayê bi navê *Asasız Musa* "Musayê Bê Asa" weke yekemîn Flîmek sînemayê li edebîyata kurdî zêde bû (Emre, 2014). Di 3yê Cotmeha sala 2014an de li ser navê Musa Anter ev flîm daxilî sînemayê bûye. Anter, bi berhemên xwe û gotinên xwe gelek astengî bi bedelên mezin li ser zimanê Kurdî rakirine. Helbesta *Qimil* bi nivîsîna bi zimanê Kurdî ve tarîya li ser zimanê Kurdî rohnî kirîye û bandora pêşketinê li hember asîmîlasyonê li ser zimanê Kurdî kirîye. Helbesta *Qimil* jî bi girîngîya xwe bandorek li civakê jî kirîye. Dema ku zimanê Kurdî qedexe bû, dewlet bi ti awayî nedixwest ji xeynî zimanê Tirkî kesek bi zimanekî din binivîse. Helbesta Qimil ji alîyê Musa Anter ve di wê demê de bi zimanê Kurdî tê nivîsîn. Helbesta *Qimil* niha jî di nav gel de bi awayekî helbestî û musîqalî tête guhdarkirin. Di sedsalîya rojbûna Anter de stranbêj Pervin Chakar li ser vê helbestê wisa diaxive:

> *"Min wê hîsa kûr û giran di paş kovarekê de bi wêneyek reş û spî û tabûtek li ser milên sê kesan ve dît. Ew kesê di wê tabûtê de di zaroktîya min de weke zanayek behsa wî dibû, zanayê Kurdan Musa Anter bû. Lê ew tiştên di tabuta Musa Anter de li ser milan bû ji trajedîya Kurdan bêtir ne tiştekî din bû. Di dû vê bûyerê, bêwate hatim ser pîyanoya xwe û min helbesta Qimil xwend.*
>
> *Ew hêsirên ku ji çavên min hatin desten wî mirovê wêrek yê li hemberê koletî û binpîyê bû. Bi vê besteya helbesta wî ya Qimil min xwest ku xwe bigihînim dilê wî û bibêjim tu ne tenêyî, bi te re me. Min xwest biçim ser pîyonêyê û beste bikim. Lewra helbestek him klasik û him jî folklorik e (Chakar, 2020).*

Musa Anter, berîya ku bête kuştin, di sala 1991an de di flîmê *Mem û Zîn* de jî weke kesekî rûspî cih girtîye. Dema ku em girîngîya *Mem û Zînê* bidin ber çavan di wî flîmî de rola ku girtîye ser xwe girîngîya Musa Anter ya di nav civakê de bêtir derdixe pêş. Fikr û ramanên Musa Anter hew ji alîyê Kurdan ve nedihat pejirandin, lewra dema ku hate qetilkirin kesên ku bertek dan roşenbîrên Tirk jî bûn. Em dê bi kurtasî li ser nivîsên wan kesên ku bi gotinên xwe deng daye Musa Anter bisekinin da ku bandora Musa Anter ya li ser civakê bêtirîn zelal bibe.

Di 21 meha Îlonê ya sala 1992an de Oktay Ekşi di rojnameya *Hürriyet*ê de "Bi kuştina Musa Anter kêmasîya ku dewleta Tirkan di nav dewletên dinyayê de çawa kêm dibe, dibêje" bertekê li gotinên Süleyman Demirel yên ku rojnamegerên ku têne kuştin wan weke milîtanan nişan daye, dide.

Sedema kuştina Musa Anter û ya rojnamegerên ku hatine kuştin kêmasîya hikumeta Demîrel dibîne. Kuştina Musa Anter jî bi destê çeteyên di nav dewletê de hatîye kirin anîbû ziman. Yazgülü Aldoğan jî di 22 dê Îlonê ya sala 1992yan de di rojnameya *Günaydın*ê de behsa kuştina Musa Anter bi van gotinan kirîye: "Musa Anter di heftê salîya xwe de li ser parastina biratîya Kurd û Tirkan sekinîye û kesekî xwedî berhem bû." Gotina Süleyman Demirel ya "ew ne rojnamevan bûn" rexne dike û dibêje hewce ye ku kesekî wekî Musa Anter bi fikrê xwe nebûya hedefa vê gotinê.

Di wê demê de telgrafa ku ji alîyê serokê çapemenîyê ve ji Süleyman Demirel re şandîye û di telgrafê de rojnamevanên ku hatine kuştin ji xeynî hikumetê ve her kes dizane ku faîlên kuştîyan kî ne? Rexneyan li hikumetê dike û li ser xeletîyên ku bi destê dewletê hatîye kirin disekine.

Uğur Mumcu di 22 meha Îlonê ya sala 1992yan de di rojnameya Cumhuriyetê de li ser kuştina Musa Anter van gotinan bilêv dike: Musa Anter ne ji wan kesên ku li gor demê fikr û ramanên xwe biguherîne. Wî jîyana xwe fedayî doza xwe kirîye û roşenbîrekî Kurd e. Dibe ku hûn tevlî fikrên wî bibin an jî nebin. Lê hewce ye ku hûn ji fikrên kesên ku weke Musa Anter rêz bigirin. Kesên ku dawaza kuştina wî kirine, xwestine ku Tirkîyê bikin gola xwînê û gelên weke Kurd û Tirk, sunî û elewî li hember hev bikin neyar. Niha li Tirkîyeyê daxwaz li ser vê rêxistinê dimeşe û hikumet jî bi bêdengî li van bûyeran temaşe dike" (Tüleylioğlu, 2008: 324-337). Musa Anter bi fikr û ramanên xwe him ji alîyê çepgiran ve û him jî ji alîyê rastparêzan ve bi bandor bû. Piştî kuştina Anter deng ji kesên ku xwe bêtir dindar didîtin jî derdikeve û kuştina Anter tête rexnekirin. Ji wan kesên ku bi fikr û ramanên xwe hişmendîya Osmanî diparastin, bertekên xwe her tim li ber rêxistina KTyê dîyar dikirin. Kadir Mısırlıoğlu jî li hember qetilkirina Musa Anter bertekên xwe bi van gotinan dîyar dike: Dewlet kesekî wek Musa Anter di heştê û yeksalîya wî de bi navê kurdîtîyê û qominîstîyê bi dûv wî xistin û ew qetilkirin. Bîst hezar însan hatîye kuştin û faîlê wan ne dîyar kirine di nava dewletê

de” (Mısırlıoğlu, 2014). Rexneyên ku têne kirin girîngîya Musa Anter ya di nav civakê de bêtir dîyar dike.

Çend mînakên ku kesên di derheqê Musa Anter de nivîsên xwe, fikr û ramanên xwe di dema qetilkirina wî de parve kiribûn me xwest ku bandora Musa Anter ya li ser civakê bi çi rengî bûye zelal bikin. Musa Anter bi fikr û ramanên xwe û bi bawerîya doza ku dipejirand dijîya. Kesên ku ne di fikrên wî de bûn jî li hember kuştina wî bertekên xwe dîyar kirine. Lewra kesên weke Musa Anter ji civakê re û ji bo wekhevî û biratîya gelan jî hebûna wan betir bi bandor tête dîtin. Bandora Musa Anter li ser roşenbîr û helbestvanên Tirk jî xwe dîyar kiribû. Ji wan helbestvanan yek jê Can Yücel bû. Hüseyin Akyol di berhema bi navê “*Apê Musa 100 yaşında*” de helbesta Can Yücel ya bi navê “ MUSA BEĞ İÇİN” parve dike (Akyol, 2002: 341). Em dê kurtasî behsa helbesta “MUSA BEĞ İÇİN” bikin. Piştî kuştina Anter, Can Yücel bi van rêzikên helbestê ve tarîfa Anter dike: “Çawa ku Nebî Musa di nav pêlên behra sor de derbas bûye, Anter jî bi biratîyê, bi biratîya dinyayê derbasî qeraxa hember bûye.” Bi sedema ku helbest dirêj e, me nexwest em hemû werger bikin û çarçoveya mijarê derbas bikin. Di rêzikên helbestê de jî fikr û ramana Anter ji alîyê helbestvan ve bi çi bandorê girîngîya xwe xuya kirîye eşkere dike.

Ji dema kuştina Musa Anter û heta niha nêzî 30 sal çêbûye, lê Musa Anter him bi navê xwe û him jî bi berhemên xwe li ser civakê kesekî bi bandor e. Him di qada sînemayê, edebîyatê de û him jî di şanoyê de ji kesên derhêner û ji kesên helbestvan re bûye mijarek sereke.

Sînemager Metin Ewr jî yek ji wan kesan e ku kurteflîmek bi navê *Çerx* li sînemaya Kurdî zêde kirîye. Di derheqê flîma *Çerx* de û Musa Anter de Metin Ewr bi van gotinan rave dike: Kurteflîma *Çerx* mijara xwe ji berhema bi navê *Musa Anter’in Küçük Generalleri* stendîye. Flîma *Çerx* “di cîhanê de heta niha di 50 festîvalan de hatîye nişandan û 13 xelat girtîye.” Metin Ewr ji bo sînemageran bandora Musa Anter bi van gotinan rave kirîye:

> *Apê Musa bi heyîna xwe, bi sekna xwe, bi zimanê xwe, bi nivîsên xwe heqîqeta axa Kurdistanê bû. Û li ser vê axê wekî çinareke şîn hatiye. Dîsa dibêjim; “dibe ku we şaxên vê 'Çinarê' birîbin, lê rihên wê di axê de ne”. Apê Musa dîmenek, wêneyek, framek e. Çîrok e, di çîrokê de leheng e, dîroka lehengî û berxwedariyê ye. Apê Musa dirêjiya fîlmekî 72 salan domiya ye. Ne ji bo me*

*sînemageran tenê, ji bîra Apê Musa îro sînemager jî, şanoger jî stranbêj jî tasên xwe dadigirin (Barış, 2022).*

Musa Anter berîya ku bête kuştin jî ji ber ku tesîrek wî li ser gel hebû di saxîya wî de jî ji alîyên helbestvanan û piştî mirina wî jî gelek hunermendan ew di nav hunerên xwe de bi cih kiribûn. Yek ji wan helbestvanan jî di hevpeyvîneke Musa Anter de navê helbestvan yê rastîn weke Zekî hatîye bilêvkirin û maxlesa helbestvan jî Jîr e. Musa Anter wisa behsa helbesta ku li ser navê wî hatîye nivîsîn dike: Helbestvan dibihîze ku Musa Anter hatîye binçavkirin û di encama binçavkirinê de jî hatîye kuştin. Em dê bi çend hevokan behsa wê helbestê bikin. Helbesta bi navê Apê Şêxo Musa Anter bi van gotinan hatîye nivîsîn:

*Îro xûz im pir melûl im*

*Lewr min bihîst ev reş xeber*

*Bîranînên te mijûl im*

*Tu ji bîr nabî ey xweş rêber*

*Tu namirî, li her der Apê Şêxo Musa Anter (Anter, 2021).*

Dema ku em vê helbestê dinirxînin tişta herî girîng li ber çavên me dikeve di hişmendîya gel û ya helbestvan de Musa Anter ne bi şêmberîya xwe tenê di nav civakê de cih girtîye. Berîya ku bimre û piştî ku bimre, Anter bi sekna xwe, bi nivîsîn û gotinên xwe hew ne di nav civaka xwe de, di nav civakên ku bindest û aştîxwaz jî de cihê xwe bi gotinên xwe dîyar kirîye. Gotinên Anter yên ku li ser zilm û zordestîya li gel hatibûn anîye ziman û di berhemên xwe de bi cih kirîye, piştî mirina wî jî di nav civakên bindest de her tim cih girtîye. Dema ku li ser medyaya civakî me lêkolîn kirî, gotinên Anter li gelek zimanan hatîye wergerandin û hatîne parvekirin derketin pêşberî me. Musa Anter ger bi berhemên xwe, ger bi gotinên xwe û fikr û ramanên xwe bandora wî li ser him civaka ku lê mezin bûye û civakên cur be cur tesîrek wî dîyarde ye. Berhemên Anter li Kurdistana Başûr bi wergerandina zimanê Soranî bêtirîn derdikeve pêşberî me û girîngîya fikr û ramanên wî li perçeyên Kurdistanê him di nav gel de û him jî di civaka hunermendan de xwe bi şênberî xuya dikin. Hunermendekî wênesaz li başûrê Kurdistanê bi navê Rebwar Kalid wêneyê Musa Anter bi balkêşî xêz kirîye. Balkêşîya wêneyê Anter bi wêneyê helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî re hatîye xêzkirin. Girîngîya

Ehmedê Xanî çawa ku di nav civaka Kurdan de bi qîymet be hunermend bi vê balkêşîyê Anter jî di wê astê de dîtîyê (Kalid, 2019).

Li gor lêkolîna ku me kirîye, Anter her dem di nav civakê de cih girtîye û her tim jî li nav gel bi hunera xwe rê li ber hunermendan vekirîye, bi belgeyan me ev girîngîya wî tesbît kir.

Me xwest ku di bin vî serenavî de ger ku di qada nivîskarîyê de û ger ku di qada sînemayê, wêjeyê de girîngîya roşenbîr Musa Anter ya li ser gel kirîye em rave bikin. Bi saya mînakên ku me dane, hev me xwest ku em mijarê zelal bikin û bandora Musa Anter ya li ser civakê ji alîyê dîtinê ve şênber bikin. Tesîra Musa Anter ya li ser civakê ji bo ku em bi dest bixin me hewcedarî bi anketekê anîbû û li nav civakê belav kiribû, da ku em girîngîya Anter di nav civakê de bêtir tesbît bikin.

Anketa ku me amade kiribû di pirsa dawîn de me ji beşdarvanên anketê re “Li gor we bandora Musa Anter li ser civakê bi awayekî erênî çêbûye?” pirsek pirsîbû. Kesên ku beşdarî anketê bûne 450 kes in û ji 450 kesan kesên ku di bersiva xwe de erê işaret kiribûn 295, kesên na işaret kiribûn 9, kesên ku nizanim işaret kiribûn 83 û kesên ku naxwazim bibersivînim 45 kesan bersiva vê pirsê dabûn. Di beşa anketê de li ser tabloya pazdemîn em li ser bersiv û analîza vê pirsê sekinîne. Çawa ku bandora Anter li ser civakê çêbûye, Musa Anter jî di fikr û ramanên xwe de di bin bandora kesan de mabû. Kesên ku bandora wan li ser Musa Anter çêbûye sînorên çarçoveya felsefeya fikrên wî yên nivîskarîyê û xwedîderketina wî ya li gel dîyar kiribûn.

### 3.4. BANDORA KESÊN KU LI MUSA ANTER KIRINE

Musa Anter bi fikr û ramanên xwe, bi nivîsên xwe, bi nerînên wî yên li jîyanê çawa ku bandor li gelek kesan kirine, wî jî di vê rêyê de bandor ji kesan girtîye.

Li gor Musa Anter kesên ku li ser fikra wî ya polîtîk û edebî bandor kirine ya herî ewil dêya wî Fesla Xanim e. Lewra her tim mertbûyîn û xwedîderketina li gelê xwe li bîra wî anîye (Anter, 2016f: 40-41). Di jîyana xwe de kesê ku herî nêzî xwe dibîne Saîdê Kurdî ye. Lewra tekoşîna wî ji xwe re dike mînak. Gelek fikrên xwe û yên Saîdê Kurdî jî nêzî hev dibîne. Anter bi van gotinan xwe û Saîdê Kurdî mûqayese dike: Dibêje ku çavê me jî gelek kes wek hev dibînin, yanê çavek wî li gor yê din piçûktir dixuye, yê min jî wisa ye. Temenê wî nod derbas kir, ez bi heftê salîya xwe di şopa wî de diçim.

Wî di dadgehan de eşkere gotinên xwe digot, ez jî xwe di wê rêyê de nêzî wî dibînim. Herweke qet çawa ew bi dû malê dinyayê neket, min jî qet guh neda malê dinyayê.

Çi qas pere teklîfî wî kirine ku ji ser doza xwe vegere, gelek mevkî û bi kûzan zêr xwestin bidin min lê min ji bo fikr û ramanên xwe eziyet, îşkence û zindan li hember wan perêyên wan tercîh kir.

Ew senbolê rêya Kurdistanê bû, lê navê dînîtîyê bi dûv wî xistin û ew avêtin timarxaneyê, ez jî di tekoşîna xwe ya pêncî salî de ji alîyê gelê xwe ve nehatim fêhmkirin û wek kesekî beredayî hatim naskirin. Çawa ku ew her tim welatparêz bû, ji bo ku gelê Kurd ji xizanîyê xilas bibe çi ji destên wî hatîye wî kirîye, Musa Anter jî xwe kesekî di wê rêyê de dibîne (Anter, 2016f: 78-80). Musa Anter ji gelek terefî ve Saîdê Kurdî ji xwe re weke rêberekî dibîne. Bi van gotinên wî, dixwest ku bibe yekî wek Saîdê Kurdî. Êş û kederên di vê rêyê de jî li hember asîmîlasyon û înkarkirinê dikêşîne. Lê her tim bi serbilindayî her duyan jî gotibûn em Kurd in. Ji xeynî Saîdê Kurdî kesên ku di jîyana Musa Anter de bi bandor cih girtine Faik Bucak, Abdurrahman Qasimlu û Kamûran Bedîrxan e. Dema ku Musa Anter ji bo xwendinê diçe Stenbolê hevaltîya wî bi Faik Bucak re çêdibe û bi pêşniyarîya Faik Bucak, Musa Anter qeyda xwe derbasî beşa hiqûqê dike. Hogirtîya di navbera her duyan jî heta ku Faik Bucak tête kuştin jî dewam dike. Musa Anter wisa behsa Faik Bucak dike: Anter di sala 1941an de dema ku diçe Stenbolê, gotibû min Faik nas kiribû. Ji ber ku mirina wî qebûl nake gotibû naxwazim di derheqê mirina wî de binivîsim. Faik Bucak ew qas di bîrnameyên Anter de cih girtîye ku Anter parve kiribû ez deh cild bîrnameyan binivîsînîm jî Faik di wan bîrnameyan de sereke ye, taca serê wan e (Anter, 2016: 336). Girîngîya Faik Bucak bi gotinên Anter jî diyar dibe ku di jîyana wî de cihek girîng girtîye. Yavuz Çamlıbel di derheqê kesên ku bandor li ser Anter kirine wisa bilêv dike:

> *Min dema ku hemû nivîsên Anter analîz kirin kuştina du kesan em dikarin bibêjin ku tesîrek mezin li ser wî kiribû. Ji wan kesan yek jê Abdurrahman Qasimlu bû. Anter gotibû: Ger ku sixûda min hebe ez jî mîna wî di rêya gelê xwe de şehîd bikevim lewra ew mîna alekê di nav gelê xwe de diheje. Kesê duyemîn jî Faik Bucak e. Anter di gotinek xwe de parve kiribû: Faik Bucak şerefa ku li jîyana xwe bar kiribû ji ya min bêtir e lewra ew bi guleya neyarê xwe şehit ketibû. Ez jî gelek dixwazim mîna Faik bi destên neyarê xwe şehit bibim. (Çamlıbel, 2010:137-155).*

Daxwaza Anter ew bû ku li ser doza xwe bi dawîbûyîna jîyana wî dê ji wî re bi şerefek mezin be. Musa Anter yek ji wan kesên ku bandora wî li ser jîyana Anter çêbûye jî Kamûran Bedirxan e.

Kamûran Bedirxan him ji ber xebatên edebîyatê têkilîya wî û Musa Anter bi hev re hebûye û him jî malxezûranê Anter bû, lewra xanima Anter jî digihişt malbata Bedirxanîyan.

Musa Anter wisa behsa Kamûran Bedirxan dike: Abdurrahman Qasimlu dema ku daxawaza çûyîna Ewropa dike, Musa Anter ji wî re alîkarîyê dike û wî dişîne cem Kamûran Bedirxan. Ji ber ku zarok ji Kamûran Bedirxan û Xanima wî re çênebûye ew jî Abdurrahman Qasimlu mîna zarokê xwe qebûl dikin. "Kamûran Bedirxan dema ku bi Anter re parve dike ku ji ber ku zarokê me nîn bû em xemgîn dibûn lê niha tu û Abdurrahman we her du kêmanîya bêzaroktîya di jîyana min û xanima min de xilas kirîye." Kamûran Bedirxan her duyan jî mîna kurê xwe dibîne û bi Musa Anter re parve dike. Anter dema vê ji Kamûran Bedirxan dibihîze dibêje ku di jîyana min de şerefa herî mezin dabû min. Anter gotibû ku piştî wê xweşgotina ku Kamûran Bedirxan, min xwe tim wek kurê Kamûran Bedirxan dihesiband. Ji bo ku wê şerefa ku Kamûran Bedirxan dabû wî biparêze hemû tişt kiribû. Anter dibêje ku ew şeref di jîyana min de her tim ji min re rêber e. Anter hebûna xwe ya polîtîk û ji hêla ehlaqê ve girêdayî hesta ku Kamûran Bedirxan bi wî re çêkiribû dike (Anter, 2016f: 114-115). Kamûran Bedirxan kesekî ji malbata Bedirxanî bû û xebatên wî li ser çand, folklor û edebîyata Kurdî gelek bûye. Anter bandora ku ji wî stendibû bi baldarî di nivîsên xwe de, di axaftinên xwe de, di hestên xwe de xuya kiribû.

Berhem û nivîsên Anter ji girîngîya hestên wî bû. Bi wan hestan daxwaza wekhevî û biratîya gelan kirîye, bi wan hestan li hember zilimkarîyê bi nivîsên xwe serî radike û bi saya wan hestan bandora wî li ser civakê şênber dibe. Di beşa mijara me ya çaremîn de, bi alîkarîya encama anketa ku me amade kirîye em dê bandora Musa Anter ya li ser civakê analîz bikin.

# BEŞA ÇAREMÎN

# ANKET

Anket di derheqê mijarekê de kesên ku fikrên xwe li ser wê mijarê li gor pirsan bersivên xwe parve dikin û encamek bi rêya wan bersivan ve derdixe holê. Anket, bi mabesta zelalkirina mijarê û pirsên girêdayî mijarê li gor qaîdeyan tête amdekirin. Bi saya anketê gelek fikrên cuda têne tespîtkirin û girîngîya mijarê jî bêtir derdixe berçavan. Bi saya anketê hem dema lêkolînê kurt dibe û him jî ji alîyê aborîyê ve jî avantajek erênî dide dest kesên ku anketê amade dikin. Yanê bi saya anketê gelek bersiv di demek nêz de bi dest dikeve û gelek kes ji bo di demek kurt de bigihêjin encama pirsên xwe anketan bi kar tînin.

Di anketan de ji ber ku tespîtkirina kesan nîn e, kesên ku pirsan dibersivîne bêtir azad û bi dilxweşî bersivên xwe dîyar dikin. Ji bo ku anketek bête amadekirin hewce ye zêde materyalan nîn e, ji ber vê yekê jî ji alîyê aborîyê ve tercîha kesan bêtir dikêşîne. Anket li gor her mijar, her kes û her fikrî dikare bête amadekirin. Yanê çarçoveya wê di destê kesên amadekar de ye. Lêkolîner ji bo ku encamekê ji xebata xwe derxe, pirsên ku amade kirine ji kesên cuda re dipirse û li gor bersivên wan kesan agahîyan kom dike û analîz dike. Di encamê de bi saya agahîyên kom dibe girîngîya anketê bêtir derdixe pêş.

## 4.1. AMADEKIRINA ANKETÊ Û GIRÎNGÎYA WÊ

Armanca vê anketê ev e: Musa Anter di nav gel de çi qas tête naskirin û bandora wî ya li ser gel bi kîjan alî ve bêtir derdikeve pêş. Bi saya pirsên ku me pirsîye û bersivên ku kesên beşdarî anketê bûne, me digihîne encameke girîng. Di amadekirina anketê de me pirs li gor çarçoveya mijarê amade kirin da ku em bigihêjin encamek serkeftî, lewra her anket bi mabesta serkeftinê tête amadekirin. Me analîza anketê li gor bernameya SPSSyê nirxand û encamên bersivên pirsên anketê li gor wê rêbazê me di xebata xwe de bi cih kir.

Di anketa ku me amade kirîye encamek serkeftî daye destê me. Musa Anter kesekî di civakê de tête naskirin û bandora wî li ser gel bi saya bersivên beşdarvanan bêtir derdixe pêş me. Bi saya bersivên beşdarvanan mijar zelal bûye.

Me ji bo mijara xwe anketa ku me amade kirîye bi du zimanan nivîsandîye. Bi zimanê Kurdî/Kurmancî û zimanê Tirkî heman pirs hatîne amadekirin.

Sedema ku me bi du zimanan amade kirine bi armanca ku anketa me bigihêje destên gelek kesan û em bigihêjin encamek serkeftî.

Me anket bi rêya rûbirû gihandibû beşdarvanan. Em dê li paş analîzkirina pirsên anketê ve anketa ku me amade kirîye weke “Anket tablo - I û Anket tablo – II” bi zimanê Kurdî / Kurmancî û bi zimanê Tirkî parve bikin.

## 4.2. RÊ Û RÊBAZÊN BERSIVÊN PIRSÊN ANKETÊ

Me berîya ku beşdarvan pirsên anketê bibersivînin wek pêşgotinek nivîsand. Armanca pêşgotinê ew e ku beşdarvan dê li gor çi qaîdeyan bersivên pirsan çawa işaret bikin. Mabesta wê pêşgotinê ew bû ku him cîdîyeta anketê derbixe pêş û him jî beşdarvanan ji alîyê rê û rêbazên dagirtina ankatê ve agahdar bikin.

## 4.3. PIRS Û ANALÎZA BERSIVÊN PIRSÊN ANKETÊ

Dema ku me pirsên anketê dîyar kirin, me xwest ku beşdarvanên ku dê pirsan bixwînin û bibersivînin hewce ye ku ji alîye fêhmkirina pirsan ve tengasîyekê nekêşînin. Me pirsên anketê kurt û zelal pirs kirin, da ku xeletîyek di bersivan de çênebe. Ji ber ku nav, navnîşan an jî destnişan di anketê de cih nagire, beşdarvanên ku beşdarî anketê dibin bi aramî dikarin pirsan bibersivînin, yanê îşaret bikin.

Me pirs li gor rê û rêbazekê amade kirin. Mabesta me ya anketê ew bû ku em bandora Musa Anter ya li ser civakê bi bersivên gel tespît bikin. Ji pirsa heftemîn û pêş ve kesên ku Musa Anter nas nakin an qet ne bihîstine ji xwe nikarin bersiva pirsan bidin. Wek me berê jî gotibû, li gor armanca anketê me pirsên xwe dîyar kiribûn. Em dê li gor rêzikên pirsan û bersivên beşdarvanan, pirsan yek bi yek binirxînin. Bi saya nirxandina pirsan em dê girîngîya anketê ji bo vê xebatê bêtir bibînin.


### 4.3.1. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Yekemîn

Me di pirsa yekemîn de ji kesên ku dê bersiva pirsan bide zayenda wan pirsî. Mabesta me ew e ku di nav civakê de kesên ji Musa Anter haydar in çend jin û çend mêr hene, em tespît bikin. Him bi saya vê pirsê em dikarin rola jinan ya di civakê de bêtir fêhm bikin. Bersiva vê pirsê beşdarvan bi sê rêya dikarîbûn bibersivînin: Yek ji wan rêyan ya yekemîn naxwazim zayenda xwe dîyar bikim bû, ya duyemîn zayenda min jin e û ya sêyemîn jî zayenda min mêr e.

Me di pirsa yekemîn de ev her sê vebijark pêşkêşî beşdarvanên anketê kirin û bi saya bersivên beşdarvanan me gihandibû encamekê. Em dê bi saya bersivên vê pirsê dîyar bikin ku beşdarvanên dixilî anketê bûne çend kes jin û çend kes jî mêr in.

**Tabloya 4.1. Zayenda xwe naxazim dîyar bikim: JIN: MÊR:**

| | | |
|---|---|---|
| **34** | **233** | **183** |





Di encama bersiva pirsa yekemîn de hejmara kesên ku beşdarî anketê bûne 450 kes in. Ji wan kesan 233 kes jin e û 183 kes jî mêr in. Beşdarvanên anketê 34 kes jî nexwestîne ku zayenda xwe dîyar bikin. Di encama bersiva pirsa yekem de tête dîtin ku jin bêtir beşdarî anketê bûne. Bandora çalaktîya jinê ya di nav civakê de bi saya vê pirsê derxistîye pêş me.

#### 4.3.2. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Duyemîn

Pirsa me ya duyemîn jî me ji beşdervanên anketê re temen pirsîye. Mabesta vê pirsê ew e ku em fêhm bikin di nava civakê de Musa Anter bêtir tesîr li ser ciwanan kirîye yan nekirîye. Lewra dilovanîya Anter 30 sal çêbûye, ger ku kesek bi bandor be dibe ku bala ciwanan kişandibe. Pirsa me bi vî rengî ye: Temenê we? “18-30: 31- 45: 46- 55: 56” û mezintir. Li gor beşdarvanên anketê û bersivên wan bandora Musa Anter li ser kesên çend salî bêtir kirîye em dê bi dest bixin.

**Tabloya 4.2. Temenê we? 18-30: 31- 45: 46- 55: 56 û mezintir**

| | | | |
|---|---|---|---|
| 314 | 74 | 29 | 28 |




Di encama bersiva vê pirsê de kesên ku temenê wan di navbera 18-30yî de 314 kes in, kesên ku temenê wan di navbera 31-45an de 74 kes in, kesên ku temenê wan di navbera 46-55an de 29 kes û kesên ku temenê wan 55 û mezintir jî 28 kes beşdarî anketê bûne.

Di vê pirsê de ya herî girîng kesên ku beşdarî anketê bûne bi piranî temenê wan di navbera 18-30yî de ye. Ji ber ku kuştina Musa Anter 30 sal çêbûye dibe ku bandora Musa Anter ya li ser civakê bi saya beşdarvanên temenê wan di navbera 18 û 30 salî de em bêtir bi dest bixin. Lewra rê û rêbazên ragihandinê bi saya pêşketina teknolojîyê ve bêtir çêbûye û kesên ciwan amûrên teknolojîyê bêtirîn bikar tînin. Di encama bersiva pirsê de jî dîyar bûye ku kesên temenê wan di navbera 18-30 salî de bêtir beşdarî anketê bûne.


### 4.3.3. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Sêyemîn

Di vê pirsê de kesên ku anketê dadigirin tahsîla xwe dîyar dikin. Pirsa sêyemîn wisa hatîye amadekirin. Tehsîla we çî ye? “Xwendin û nivîsîn nîne, dibistana seretayî, dibistana navendî, lîse, zanîngeh.”

Armanca ku me vê pirsê ji beşdarvanan pirsî jî ev e: Bandora Musa Anter bêtir li ser kesên ku tehsîla wan çî ye bêtir çêbûye? Me xwest ku bi saya vê pirsê em wê tespît bikin.

**Tabloya 4.3. Tehsîla we? Xwendin û nivîsîn nîn e: Dibistana seretayî: Dibistana navendî: Lîse: Zanîngeh**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 14 | 44 | 34 | 50 | 298 |




Kesên ku beşdarî vê pirsê bûne ji wan 14 kes xwendin û nivîsandin nîn e, îşaret kirine, 44 kes dibistana seretayî, 34 kes dibistana navendî, 50 kes lîse û 298 kes jî tehsîla xwe zanîngeh îşaret kirine.

Beşdarvanên anketê yên herî zêde kesên ku tehsîla wan zanîngeh e. Ji ber ku kesên xwendina wan heye an jî tehsîla wan di qadeke bilind de ye haydarbûna wan ya ji civakê jî bêtir çêdibe. Kesên ku tahsîla wan heye ji bo lêkolînê û rêbazên ragihandinê bêtir bikartînin û ji alîyê ziman ve jî li gor kesên ku tahsîla wan kêm be bêtir ji agahîyan haydar dibin.


### 4.3.4. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Çaremîn

Pirsa me ya çaremîn bi armanca kesên ku beşdarvanên anketê bi kîjan zimanan dizanin, em tespît bikin. Bi saya tespîtkirina vê bersivê ve em dê bizanibin kesên ku ji vê mijarê haydar in bi gelemperî bi kîjan zimanan dizanin. Pirsa me bi vî rengî hatîye pirsin: “Hûn kîjan zimanan dizanin?”

"Kurdî, Tirkî, Farisî, Erebî, Ingilîzî, Almanî, Zimanekî din. Nîşe: Ger bersiva we zimanekî din be ji kerema xwe wî zimanî dîyar bikin: (.........................)."

**Tabloya 4.4. Hûn kîjan zimanan dizanin? Kurdî: Tirkî: Farisî: Erebî: Ingilîzî: Almanî: Zimanekî din**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 374 | 399 | 21 | 45 | 70 | 12 | 12 |




Kesên ku beşdarî anketê bûne 374 kes zimanê Kurdî, 399 kes bi zimanê Tirkî, 21 kes bi zimanê Farisî, 45 kes zimanê Erebî, 68 kes bi zimanê Ingilîzî, 12 kes bi zamnê Almanî û 11 kes jî di bersiva vê pirsê de gotine ku em bi zimanekî ji xeynî van zimanan dizanin. Li gor bersiva vê pirsê em dibînin ku beşdarvanên anketê her çi qas bi gelemperî bi zimanê Kurdî û Tirkî dizanin jî ji xeynî van her du zimanan bi çend zimanên din jî dizanin. Pirzimanîya beşdarvanan anketê bêtir dewlemend dike û ixtîmala ji haydarbyîna Musa Anter jî bêtêr qewî dike. Pirzimanîya beşdervanan û haydarbûyîna wan ya ji ziman bala me kişandibû li ser zaravayên Kurdî. Me pirsa xwe ya pêncemîn jî li gor vê hişmendîyê pirsîbû.


### 4.3.5. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Pêncemîn

Di vê pirsê de me xwest ku beşdarvanên anketê kîjan zaravayê Kurdî dizanin tespît bikin. Ji bo em bigihêjin encamekê jî me pirsa xwe ya pêncemîn bi vî şiklî amade kir: "Hûn kîjan zaravayên Kurdî dizanin?"

“Kurmancî, Kirmanckî (zazakî), Soranî, Goranî, Lekî, Lorî, Bi yekî jî nizanim .” Dibe ku beşdarvanê anketê Kurd be û bi ti zaravayên Kurdî nizanîbe, dibe ku jî ne Kurd be û ji ber vê sedemê jî bi zaravayên Kurdî nizanîbe. Me xwest ku li ser vê pirsê tespît bikin. Girîngîya vê pirsê jî kesên ku zimanê Kurdî zanîbin an nizanîbin, Kurd bin an ne Kurd bin ji Musa Anter çawa haydar bûne, wek encamekê dê bide dest me.

**Tabloya 4.5. Hûn kîjan Zaravayên Kurdî dizanin? Kurmancî: Kirmanckî (zazakî): Soranî: Goranî: Lekî: Lorî: Bi yekî jî nizanim**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 374 | 92 | 23 | 8 | 1 | 2 | 36 |




Kesên ku beşdarî anketê bûne 374 kes di bersiva vê pirsê de zaravayê Kurmancî, 92 kes Kirmanckî (Zazakî), 23 kes Soranî, 8 kes Goranî, 1 Lekî, 2 kes Lorî û 36 kes jî di bersiva vê pirsê de bi yekî jî nizanim işaret kirine. Beşdarvanên anketê herî zêde zaravayê Kurmancî işaret kirine. Ji ber ku anket bi du zimanan hatibû amadekirin “ Kurmanckî û Tirkî” bû yek sedem ew e ku zaravayê Kurmancî bêtirîn derxistîye pêş. Sedema duyem jî ji ber ku anket li cihên ku Kurmanc bi hejmara xwe gelek bûn, rûbirû li beşdarvanan hatibûn belavkirin encamek wisa bi dest me xistîye. Piştî vê pirsê me xwest ku gel çi qas ji kesên ku Kurd in bi zimanê Kurdî yan jî Tirkî nivîsandine haydar in, em wê derxin holê. Bi wê armancê me pirsa şeşemîn amade kiribû.


### 4.3.6. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Şeşemîn

Pirsa anketê ya şeşemîn jî bi mabesta ku gel ji kesên ku Kurd in û berhemên wan bi çi zimanî hatibe weşandin, ji wan çend kesan nas dikin? Me xwest ku bi rêya vê pirsê em tespît bikin. Me pirsa xwe bi vî şiklî pêşkêşî beşdarvanên anketê kir:

“Hûn ji nivîskarên ku Kurd in û bi Kurdî yan jî tirtkî dinivîsînin an nivîsandine ji wan çend kesan nas dikin? 1-3, 4-6, 7-9, 10-12, 13-15, 16 - …” Girîngiya vê pirsê ya li ser mijara me bi vî şiklî ye: Ji ber ku astengîyeke mezin li ser zimanê Kurdî hebû, Musa Anter jî ji mecbûrî fikr û ramanên xwe bi Tirkî nivîsandibû. Gelek nivîskarên ku ji ber vê sedemê bi vî awayî nivîsandine hene. Me xwest ku gel ji vê yekê û ji wan nivîskaran çi qas haydar in, em tespît bikin.

**Tabloya 4.6. Hûn ji nivîskarên ku Kurd in û bi Kurdî yan jî Tirkî dinivîsinin an nivîsandine ji wan çend kesan nas dikin?**

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| **1-3: 179** | **4-6: 87** | **7-9: 40** | **10-12: 25** | **13-15: 17** | **16 - …: 63** |




Di encama bersiva vê pirsî de beşdarvanên anketê 179 kes ji yekê û heta sê kesan nas dikim işaret kirine, 87 kes ji çar û heta şeş kesan, 40 kes ji heft û heta neh kesan, 25 kes ji deh û heta dozdeh kesan, 17 kes sêzdeh û heta pazdeh kesan, 63 kes jî şazdeh û zêdetir nas dikim işaret kirine. Beşdarvanên anketê herî zede, yanê 179 kes di bersiva vê pirsê de di navbera yek û sê kesan nas dikim de işaret kirine.

Dema ku em bi gelemperî bersivên beşdarvanan kom dikin jî 411 kes bersiv daye ku nivîskarên ku Kurd in û bi zimanê Kurdî an jî bi zimanê Tirkî dinivîsine yan nivîsandine ji wan haydar in. Me li gor vê pirsê pirsa anketê ya heftemîn dîyar kiribû. Me xwest ku em tesbît bikin gel ji navê Musa anter çi qas haydar e. Bi wê armancê ve me bihîstina navê Musa Anter ji gel pirsîbû.

### 4.3.7. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Heftemîn


Di vê pirsê de me navê nivîskar da ber beşdarvanên anketê û me xwest ku em tespît bikin nivîskar Musa Anter di nav gel de tête nasîn an nayê nasîn? Navê wî qet bihîstine yan ne bihîstine? Girîngîya vê pirsê ji bo lêkolîna me ev e: Ger ku beşdarvan bi ti awayî Musa Anter nas nake yan jî nebihîstibe nikare derbasî pirsên din jî bibe. Lewra ji ber ku pirs hemû girêdayî hev in û ji bo armancekê ye, me ev ankete li gor vê armancê amade kiribû. Ev pirsa heftemîn wek kilîta anketê hatibû amadekirin.

Me pirsa xwe bi vî şiklî amade kiribû: “We navê Musa Anter an jî Apê Musa qet bihîstîye? Erê, Na”

“Nîşe: Ger bersiva we erê be ji kerema xwe dakevin pirsa 8an.” Li gor encama vê pirsê beşdarvan an derbasî pirsa pêş dibe yan jî anketê diqedîne.”

**Tabloya 4.7. We Navê Musa Anter an jî Apê Musa Qet Bihîstîye? Erê - Na**

| | |
|---|---|
| 368 | 78 |



Di encama bersiva vê pirsê de beşdarvanên anketê 368 kes işaret kirine ku ji Musa Anter haydar in. 78 beşdarvan jî îşaret kirine ku bi ti awayî navê Musa Anter nebihistîne û wî nas nakin.

Mabesta me di vê pirsê de ew bû ku em tesbît bikin Musa Anter di nav gel de tête naskirin an nayê naskirin. Bi saya bersivên beşdarvanên anketê, di encamê de navê Musa Anter di nav gel de bi piranî hatîye bihîstîn daye dest me.

Bi saya vê pirsê me ev yeke tesbît kir: Em dê di pirsên din de jî ji kesên ku ji Musa Anter haydar in an wî nas kirine, bi kîjan rêyê pênasîna wî pêk hatîye em dê tesbît bikin û bandora Musa Anter ya di nav civakê de em dê bêtirîn bi dest bixin.


**4.3.8. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Heştemîn**

Armanca amadekirina vê pirsê ev e: Beşdarvanê anketê Musa Anter çawa nas kirîye? Bandora nivîskar bi çi rengî li ser wan çêbûye? Me xwest em tespît bikin. Da ku bandora wî ya li ser civakê bi çi rêyê çêbûye, em fêhm bikin.

Pirsa me bi vî şeklî ye: "Hevnasîna we an jî naskirina we bi Musa Anter çawa çêbûye? Li ser medyaya civakî, bi saya nivîsên wî, di nava civakê de, min hevaltî bi wî re kirîye, wekî din." Bi saya van bersivan Musa Anter di nav civakê de bi kîjan hêla xwe hatîye naskirin dê wek encamekê bide dest me.

**Tabloya 4.8. Hevnasîna we yan jî naskirina bi Musa Anter re çawa çêbûye? Li ser medyaya civakî: Bi saya nivîsên wî: Di nava civakê de: Min hevaltî bi wî re kirîye: Wekî din**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 160 | 150 | 192 | 9 | 66 |



Di vê pirsê de beşdarvanên anketê Musa Anter bi kîjan rêyan nas kirine bersivandîne. Beşdarvanan bi çend rêyan ji Musa Anter haydar bûne bersivên xwe bi vî awayî dane. Yanê kesek dibe ku hevaltî jî bi Musa Anter kiribe û dibe jî ku li ser medyayê yan jî bi saya nivîsên wî jî ji wî haydar bûye.

Di encama komkirina bersivên beşdarvanan de me ev yeke daye ber çavan û wisa hejmaran bersivan anîye ber hev. Yanê kesên ku ev pirse bersivandine hejmara wan 368 kes in. Lewra 368 kes di bersiva xwe ya berîya vê pirsê de îşaret kirine ku bi awayekî navê Musa Anter bihîstine. Beşdarvanên anketê bi çend rêyan ji Musa Anter haydar bûne li gor bersiva xwe işaret kirine. Yanê beşdarvan dibe ku him li ser medyayê û him jî dibe bi saya nivîsên nivîskarî ew nas kiribin.

Di encama bersivên vê pirsê de 160 kesan îşaret kirîye ku Musa Anter bi rêya tora (medyaya) civakî nas kirîye, 150 kes jî bi saya nivîsên wî, 192 kesan işaret kirîye ku nav û gotinên Musa Anter di nav civakê de ji ber ku derbas bûne ji wî haydar bûne, 9 kesan jî di bersiva xwe de hevaltî bi Musa Anter kirîye îşaret kirîye, 66 kesan jî di bersiva xwe de îşaret kirîye ku em bi rêyek ji xeynî van rêyan ji navê Musa Anter haydar bûne. Di encamê de herî zêde beşdarvanan îşaret kirine ku di nav civakê de navê Musa Anter bihîstine. Ev bersiv di encamê de Musa Anter di nav civakê de cihek girtîye, dide dest me. Me xwest ku em bizanibin Anter bi kîjan alîyên xwe ve di nav civakê de cih girtîye li gor wê me pirsa nehemîn amade kiribû. Pirsa nehemîn bi vê armancê me pirsîbû.

#### 4.3.9. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Nehemîn


Di vê pirsê de me xwest ku Musa Anter di nav civakê de bi kîjan alîyê xwe ve tête naskirin, tespît bikin. Yanê civak wî bêtir bi kîjan alîyê wî ve nas dike? Me pirsa xwe ya nehemîn bi vî şiklî pirsî:

Li gor nêrîna we di nava civakê de Musa Anter (Apê Musa) bi kîjan alîyê xwe ve derdikeve pêş an jî tête nasîn? “Sîyasetmedar, roşenbîr, nivîskar, helbestvan, rojnameger, hemû, ne yek jî” Li gor bersivên beşdarvanan em dê bêtir bandora Musa Anter ya li ser civakê bi çi awayî çêbûye û di civakê de kîjan alîyê wî bêtir derketîye pêş fêhm bikin.

**Li gor nêrîna we di nava civakê de Musa Anter (Apê Musa) bi kîjan alîyê xwe ve derdikeve pêş an jî tête nasîn?**

**Tabloya 4.9. Sîyasetmedar: Roşenbîr: Nivîskar: Helbestvan: Rojnameger: Hemû: Ne yek**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 118 | 142 | 203 | 118 | 141 | 34 | 41 |




Di bersiva vê pirsê de me ji beşdarvanên ku ji Musa Anter haydar bûne xwest ku bi kîjan alî Musa Anter nas kirine em fêhm bikin. Beşdarvanên anketê 118 kesan Musa Anter weke sîyasetmedarekî dîtîye, 142 kesan jî Musa Anter weke roşenbîrekî dîtîye, 203 kesan ew nivîskar dîtîye, 118 kesan helbestvan îşaret kirîye, 141 kesan Musa Anter rojnameger dîtîye, 34 kesan jî hemû îşaret kirîye, yanê Musa Anter weke sîyasetmedar, roşenbîr, nivîskar, helbestvan, rojnameger dîtîye.

41 kesan jî ji van vebijarkan ne yek jî ye îşaret kirîye. Di encama bersivan de yên ku herî zêde Musa Anter wek nivîskar dîtîne 203 kes in. Li gor encama ku me bi dest xistîye em dikarin bibêjin ku nivîskarîya Musa Anter di nav civakê de bêtêr derdikeve pêş ve. Di encamê de girîngîya nivîsîn û berhemên Anter bêtir derketîye pêş. Di pirsa dehemîn de me xwest ku civak ji çend berhemên Anter haydar in, em wê tesbît bikin. Me pirsa anketê ya dehemîn wisa pêşkêşî beşdarvanan kiribû.


#### 4.3.10. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Dehemîn

Armanca pirsa dehemîn ew e ku civak ji berhemên Musa Anter çi qas haydar in? Bi saya bersivên beşdarvanên anketê, em dê xwendina berhemên wî yên di nav civakê

de bêtir fêhm bikin. Me pirsa xwe bi vî şeklî ji beşdarvanan re pirsî? "We heta niha çend pirtûkên Musa Anter xwendîye? 1, 2, 3, 4, 5, 6, Zêdetir." Li gor bersivên beşdarvanan û hijmara xwendina berhemên wî yên di nav civakê de naskirina wî di nav gel de çi qas çêbûye em dê bêtir fêhm bikin.

**Tabloya 4.10. We heta niha çend pirtûkên Musa Anter xwendîye?**

| Pirtûkek 76 | Du p. 64 | Sê p.48 | ÇarP.9 | Pênc P.4 | Şeş P.6 | Zêdetir 23 | MinNex weny165 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|




Di vê pirsê de me xwest ku beşdarvanên anketê çend pirtûkên Musa Anter xwendine em tesbît bikin. Di encama bersiva pirsê de 76 kesan xwendina pirtûkek Musa Anter îşaret kirîye, 64 kesan xwendina du pirtûken Musa Anter îşaret kirîye, 48 kesan sê pirtûk îşaret kirîye, 9 kesan çar pirtûk işaret kirîye, 4 kesan pênc pirtûk îşaret kirîye, 6 kesan şeş pirtûk îşaret kirîye, 23 kesan jî zêdetirîn wan hijmaran îşaret kirîye û 165 kes jî bi ti awayî pirtûkên Musa Anter nexwendîye îşaret kirîye. Dema ku em bersiva vê pirsê analîz dikin di encamê de 230 kesan berhemên Anter xwendine û 165 kesan jî di bersivên xwe de bi ti awayî berhemên Anter nexwendine derdikeve pêş me. Ev encam jî girîngîya berhemên Anter di nav civakê de çi qas tête naskirin dide dest me. Pirsa yazdemîn jî Anter di nav civakê de xwedîyê fikr û ramanên çawa bû me ji beşdarvanan re pirsîbû.


### 4.3.11. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Yazdemîn

Di vê pirsê de me xwest ku Musa Anter ji alîyê fikr û ramanên wî ve di nav civakê de bêtir kîjan alîyên wî derdikevin pêş ve? Gel bi kîjan fikr û ramanên wî ve nas dikin? Ji bo em encamekê bi dest bixin me pirsa xwe bi vî rengî pirsî:

“Li gor we Musa Anter xwedîyê fikr û ramanên çawa bû? Aştîperest, humanîst, welatparêz, nijadperest, polîtîk, azadîperest, nizanim.” Li gor bersivênbeşdervanên ankete encamek wisa gihişt dest me.

**Tabloya 4.11. Li gor we Musa Anter xwedîyê fikr û ramanên çawa bû: Aştîperest: Humanîst: Welatparêz: Nijadperest: Polîtîk: Azadîperest: Nizanim**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 135 | 145 | 135 | 1 | 60 | 156 | 103 |




Di encama bersiva pirsa yazemîn de kesên ku beşdarî anketê bûne Musa Anter ji alîyê fikr û ramanên wî ve di kîjan çarçoveyê de dibîne bersiv dane. Di bersivên beşdarvanan de 135 kesan Musa Anter aştîperest îşaret kirîye, 145 kesan jî humanîst, 135 kesan welatparêz îşaret kirîye, yek kesî gotîye ku Musa Anter nijadperest e, 60 kesan polîtîk îşaret kirîye, 156 kesan azadîperest îşaret kirîye, 103 kesan jî di derheqê fikr û ramanên Musa Anter de nizanim îşaret kirîye. Di encama bersivên beşdarvanan de herî zêde 156 kesan Musa Anter yekî azadîperest dîtîye. Pirsa dozdemîn jî me navê berhemên Anter ji beşdarvanan re pirsî. Armanca me ew e ku kîjan berhema Anter di nav civakê de bêtir hatîye xwendin, em wê tesbît bikin.

### 4.3.12. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Dozdemîn


Pirsa me ya dozdemîn li ser berhemên Musa Anter e. Armance me ew e ku di nav gel de kîjan berhema wî bêtir derdikeve pêş? Bi saya bersivên vê pirsê ew dê bêtir bête fêhmkirin ku berhemên wî di nav civakê de bi çi rengî tesîr li gel kirine bête fêhmkirin.

Me pirsa xwe bi vî şiklî ji gel pirsî: We herî dawî kîjan pirtûka wî(Musa Anter) xwendîye? *Hatıralarım, Kara Yara* "Birîna Reş", *Kimil, Ülke ve Gündem Yazıları, Vakayiname, Çinara Min*, Yeke Din, Min nexwendiye. Bi saya bersivên beşdarvanan em gihiştin encamekê û bandora berhemên wî yên di nav gel de me bêtir tespît kir.

**We herî dawî kîjan pirtûka wî xwendîye:**

**Tabloya 4.12. Hatıralarım: Kara Yara (Birîna Reş): Kimil: Ülke ve Gündem Yazıları: Vakayiname: Çinara Min: Yeke Din: Min nexwendiye**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 141 | 78 | 43 | 51 | 22 | 31 | 19 | 167 |




Di encama bersiva pirsa dozdemîn de kesên ku beşdarî ankatê bûne kîjan pirtûkên Musa Anter xwendîne îşaret kirine. Encama bersivên beşdarvanan wisa ye:

141 kesan pirtûka Musa Anter ya bi navê *Hatıralarım* "Bîranînên Min" îşaret kirîye, 78 kesan pirtûka *Kara Yara* (Birîna Reş) îşaret kirîye, 43 kesan pirtûka *Kimil* îşaret kirîye, 51 kesan *Ülke ve Gündem Yazıları* îşaret kirîye, 22 kesan *Vakayiname*, 31 kesan *Çinara Min* û 19 kesan jî di bersiva vê pirsê de min pirtûkek ji xeynî wan pirtûkan xwendîye îşaret kirîye. 167 kesan jî di bersiva vê pirsê de îşaret kirîye ku qet pirtûkên wî nexwendine. Beşdarvanên anketê herî zêde pirtûka Musa Anter ya bi navê


*Hatıralarım* “Bîranînên Min” xwendîye îşaret kirîye. Me di pirsa sêzdemîn de xwest ku bandora Anter li ser edebîyata Kurdî çêbûye yan çênebûye tesbît bikin. Pirsa sêzdemîn bi mabesta gel Anter kesekî serkeftî dibîne yan nabîne, me pirsa xwe wisa pirsîbû.

### 4.3.13. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Sêzdemîn

Di pirsa anketê ya sêzdemîn de me xwest ku em fêhm bikin bandora Musa Anter li ser edebîyata Kurdî bi awayekî çawa çêbûye? Ji bo ku em bigihêjin encama bersivan, me pirsa xwe ji beşdarvanên anketê re bi vî awayî pirsîbû: “Li gor we Musa Anter ji alîyê edebîyata Kurdî ve nivîskarekî çawa bû? Serkeftî ye? Ne Serkeftî ye?” Bi saya bersiva beşdarvanan encamek ket dest me û di edebîyata kurdî de asta ku nivîskar tê de ye me fêhm kir. Encama ku me bi dest xistîye em dê li ser tabloya sêzdemîn binirxînin.

**Tabloya 4.13. Li gor we Musa Anter ji alîyê edebîyata Kurdî ve nivîskarekî çawa bû? Serkeftî ye: Ne Serkeftî ye:**

| | |
|---|---|
| 375 | 25 |




Me di vê pirsê de ji alîyê edebîyata Kurdî ve Musa Anter kesekî serkeftî ye yan jî ne serkeftî ye pirsîbû.


Di encama bersivên beşdarvanan de Musa Anter kesekî serkeftî hatîye dîtin. Beşdarvanên anketê 375 kes di bersiva vê pirsê de Musa Anter serkeftî ye îşaret kirîye, 25 kesan jî ne serkeftî ye îşaret kirîye. Di encama vê bersiva pirsa anketa ku me li nav civakê belav kirîye Musa Anter ji alîyê edebîyata Kurdî ve kesekî serkeftî hatîye dîtin. Di pirsa çardemîn de me xwest ku navê Anter di kîjan civînan de derketîyê pêş, em wê tesbît bikin.

### 4.3.14. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Çardemîn

Mabesta pirsa me ya çardemîn ew e ku navê Musa Anter bêtir di civînên çawa de derdikeve pêş? Di encama bersiva vê pirsê de em dê bigihêjin, civak dema ku li hev kom dibe yan behsa mijarekê dikin lo gor çi qaîdeyê sohbeta xwe didomîne. Di sohbetê de kesekî pêşeng dibîne, gotinên wî li sohbeta xwe çawa bar dike, em dê tespît bikin. Pirsa me ya rêzika çardemîn me wisa pirsîye: “Li gor we di kîjan civînan de navê Musa Anter bêtir derdikeve pêş? Civînên xwendekaran, civînên polîtîk, civînên edebîyatê, civînên medyayê, weke din.” Bi vê rêyê navê nivîskar bêtir di nav kîjan civînan de derbas dibe em dê tespît bikin.

**Tabloya 4.14. Li gor we di kîjan civînan de navê Musa Anter bêtir derdikeve pêş?**

| C. Xwendekaran: | C. Polîtîk: | C. Edebîyatê: | C. Medyayê: | Weke din: |
|---|---|---|---|---|
| 112 | 126 | 146 | 118 | 57 |




Di encama bersiva pirsa çardemîn de beşdarvanên anketê di kîjan civînan de navê Musa Anter bihîstîye bersivandine. 112 kesan di bersiva vê pirsê de di civînên xwendekaran de îşaret kirîye, 126 kesan di civînên ku mijarên polîtîk de îşaret kirîye, 146 kesan di civînên ku behsa edebîyatê de îşaret kirîye, 118 kesan di civînên ku li ser medyayê îşaret kirîye, 57 kesan jî ji xeynî van civînan bi rêyek din navê Musa Anter derketîyê pêş îşaret kirîye. Di encama bersivên beşdarvanan de jî wek dîyar dibe ku navê Anter di civînên ku mijar li ser edebîyatê de derdikeve pêş. Ev encam girîngîya


Anter ya ji alîyê edebîyatê ve bêtir derdixe pêş me. Di pirsa pazdemîn de girîngîya Anter ya di nav civakê de me ji beşdarvanên anketê re pirsîbû.

### 4.3.15. Pirs û Analîza Bersiva Pirsa Pazdemîn

Pirsa me ya anketê ya herî dawîn me wisa ji gel pirsîye: "Li gor we bandora Musa Anter li ser civakê bi awayekî erênî çêbûye? Erê, na, nizanim, naxwazim bibersivînim. Bi saya bersiva vê pirsê em dê fêhm bikin Musa Anter bandora wî li ser civakê bi çi awayî çêbûye yan jî çênebûye encamek rastî wê bide destê me.

**Tabloya 4.15. Li gor we bandora Musa Anter li ser civakê bi awayekî erênî çêbûye? Erê: Na: Nizanim: Naxwazim bibersivînim**

| | | | |
|---|---|---|---|
| 295 | 9 | 83 | 45 |




Di encama bersiva pirsa pazdemîn de kesên ku beşdarî anketê bûne bandora Musa Anter ya li ser civakê bersivandine. 295 kesan di bersiva vê pirsê de bandora Musa Anter ya li ser civakê erê îşaret kirîye, 9 kesan di bersiva vê pirsê de bandora Musa Anter çênebûye yanê na îşaret kirîye, 83 kesan di bersiva xwe de nizanim îşaret kirîye, 45 kesan jî bersiva xwe nexwestîye dîyar bike û naxwazim bibersivînim îşaret kirîye. Di encama bersivên beşdarvanan de jî dîyar dibe ku Anter kesekî di civakê de xwedî bandor e û bandora wî ya li ser civakê erênî çêbûye.

## 4.4. ENCAMA ANKETÊ

Me pirsên anketê li gor rê û rêbazekê amade kiribû. Hemû pirs li gor pirsa berîya wê çarçoveya wê hatibû dîyarkirin. Bi mabesta encamek serkeftî me rêbazek wisa bikar anîbû. Di encamê de dema ku me bersivên beşdarvanan analîz kirin bandora Musa Anter ya li ser gel bêtirîn dîyar bûye. Armanca me ew bû ku em anketê rûbirû bigihînin gelek kesan da ku em bandora Anter ya di civakê de bêtir bi dest bixin. Ji ber şert û mercan anketa me ya rûbirû me negîhand gelek kesan. Dema ku ji bo beşdarbûyîna anketê me pêşnîyarî li beşdarvanan kir gelek ji wan beşdarvanan nexwestin ku anketê dagirin, sedema vê yeke jî navê Musa Anter wek xeternek didîtin. Hedefa me ya hejmarên beşdarvanên anketê herî kêm 500 kes bû lê di encamê de 450 kes beşdarî anketê bûne. Me jî analîza xwe li gor bersivên 450 kesan kirîye. Kesên ku bersivên pirsen anketê vala berdabûn me ew bersiv daxilî hejmara bersivan nekirîye. Kesên ku di hinek pirsan de ji yek vebijarkê bêtir îşaret kiribûn ji ber ku di pêşgotina anketê de me gotibû ku beşdarvan dikarin vê yekê bi kar bînin me qebûl kirîye û me li gor wê analîza bersivan kiriyê.

Li gor pirsên ku me di anketê de ji gel pirsîbû û bersivên ku me stendibûn ji me re dibe delîlek ku bandora nivîskarekî li ser civakê çawa çêbûye. Di bersivên beşdervanan de em dibînin ku Musa Anter ger bi fikr û ramanên xwe ger ku bi gotinên xwe, bi berhemên xwe di nav civakê de zindî maye. Ev zindîbûyîna wî ya di nav civakê de ji bandora wî ya li ser gel bêtir şênber dibe. Musa anter hew ne li ser civaka ku tê de jîyabû bandorek çêkiribû, li gor lêkolîna ku me bi dest xistibû çarçoveya civaka xwe derbas kiribû. Berhemên wî her yek bi serê xwe di qada hunerê de bûye xaçerêyek balkêş û derketîye pêş gel. Anter hew ne bi yekalîyê xwe tête naskirin li gor hinek kesan sîysetmedar, li gor hinek kesan nivîskar û li gor hinek kesan di rêya wekhevîyê de aştîperest bû û hwd. Li gor encama anketê yek jê ya girîng jî Anter hew wek kesek wî wek nijadperest daye nasîn. Anter bi sekna xwe û bi fikr û ramanên xwe her çi qas wî wek kurdewarekî xuya bike jî hew Kurd tenê ji wî sûd wernegirtine. Ger ku di dema kuştina Anter de û ger ku piştî kuştina wî jî çalakîyên ji bo wî çêbûne û nivîsên li ser wî hatine nivîsîn bi serê xwe mijareke gelek berfireh e. Anter hew ne di nav sînorên Tirkîyeyê de, li ser gelek erdnîgarîyan bi gotinên xwe yên li hember zilmê di nav gelên mazlûm de wek sloganan hatîye lidarxistin.

Berhemên Anter teqes jî berhema wî ya Bîranên wî wek rûpelên dîrokê şehadetîyê dike ji kesên aştîperest re. Piştî mirina wî berhemên wî yên wergerî zimanê soranî bûye di civaka başûrê Kurdîstanê de bi nerînek balkêş xwe xwîya dike. Musa Anter bi girînya xwe bi her awayê li swer gel bandora xwe eşkere kirîye û nemirbûyîna wî her tim di nav gel de zindî ye. Dema ku di vê çaroveyê de em li ser Anter bi saya lêkolînek bi vî rengî tesbît dikin ku nivîskarek wek Anter hew ne di dema jîyane xwe de pîştî jîyana xwe jî di nav civaka xwe de û di nav gelek civakan de çawa nemir mane tesbît dikin. Ev anket jî li ser vê armancê ji me re bûye xaçerêyek û alîkarîyek girîng daye mijara me.

### 4.5. ANKETA BI ZIMANÊ KURDÎ

Armanca amadekirina vê anketê ev e: di nav civakê de nivîskar Musa Anter çi qas tête naskirin û bandora wî li ser civakê bi çi awayî çê bûye? Ji bo ku bête tespîtkirin e. Ji kerema xwe dema ku bersiva pirsan didin şeklê 'x' bikar bînin. Ger bersivên we ji yekê zêdetir hebin, qutiyên li binê wan bersivan bi nîşana 'x' nîşan bikin. Em spasiya we dikin.

**Zayenda we? Naxwazim Dîyar bikim: Jin: Mêr:**

| | | |
|---|---|---|

**1) Temenê we? 18-30: 31- 45: 46- 55: 56 û mezintir:**

| | | | |
|---|---|---|---|

**2) Tehsîla we?**

**Xwendin û nivîsîn nîn e: Dibistana seretayî: Dibistana navendî: Lîse: Zanîngeh:**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|

**3) Hûn bi kîjan zimanan dizanin?**

**Kurdî: Tirkî: Farisî: Erebî: Ingilîzî: Almanî: Zimanekî din:**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|

**Nîşe: Ger bersiva we zimanekî din be ji kerema xwe wî zimanî dîyar bikin: (..........................)**

**4) Hûn bi kîjan zaravayên Kurdî dizanin?**

**Kurmancî: Kirmancî (zazakî): Soranî: Goranî: Lekî: Lorî: Bi yekî jî nizanim:**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | |

**5) Hûn ji nivîskarên ku Kurd in û bi Kurdî an jî bi Tirkî dinivîsinin an nivîsandine ji wan çend kesan nas dikin?**

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| **1-3** | **4-6** | **7-9** | **10-12** | **13-15** | **16 - ….** |

**6) We navê Musa Anter an jî Apê Musa qet bihîstîye?**

**Erê** **Na**

| | |
|---|---|
| | |

**Nîşe: Ger bersiva we erê be ji kerema xwe dakevin pirsa 8an.**

**7) Hevnasîna we an jî nasikirina we ya bi Musa Anter çawa çêbû?**

**Li ser medyaya civakî: Bi saya nivîsînê wî: Di nava civakê de: Min hevaltî bi wî re kirine: Wekî din**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

**8) Li gor nerîna we di nava civakê de Musa Anet (Apê Musa) bi kîjan alîyê xwe ve derdikeve pêş an tête nasîn?**

**Sîyasetmedar: Roşenbîr: Nivîskar: Helbestvan: Rojnameger:**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

**9) We heta niha çend pirtûkên Musa Anter xwendîye:**

**1 2 3 4 5 6 zêdetir:**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | |

**10) Li gor we Musa Anter xwedîyê fikir û ramanên çawa bû:**

**Aştîperest: Humanîst: Welatparêz: Nijadperest: Polîtîk: Azadîperest: Nizanim:**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | |

**11) We herî dawî kîjan pirtûka wî xwendîye:**

***Hatıralarım* - *Kara Yara (Birîna Reş)* – *Kimil* - *Ülke ve Gündem Yazıları* – *Vakayiname* - *Çinara Min* - Yeke Din - Min nexwendîye**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | |

**12) Li gor we Musa Anter ji alîyê edebîyata Kurdî ve nivîskarekî çawa bû:?**
**Serkeftî ye: ne Serkeftî ye:**

| | |
|---|---|
| | |

**13) Li gor we di kîjan civînan de navê Musa Anter bêtir derkive pêş ?**
**C. Xwendekaran: C. Polîtîk: C. Edebîyatê: C. Medyayê: Weke din:**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

**14) Li gor we bandora Musa Anter li ser civakê bi awayekî erênî çê bûye?**
**Erê- Na-Nizanim- Naxwazim bibersivînim**

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | |

**"Tabloya Anketa Kurdî"**

**Anket xelasbû, gelek spas**

## 4.6. TURKÇE YAZILAN ANKET

Bu anketin hazarılanmasındaki amaç yazar Musa Anter'in ne kadar tanınıyor olduğunu gözlemek ve onun topluma etkisini tespit etmektir.
Soruları cevaplarken lütfen 'x' şeklini kulanınız. Vereceğiniz cevaplar birden fazla ise o cevapların altındaki kutucukları 'x' işareti ile işaretleyiniz. Teşekkür ederiz.

1) **Cinsiyetiniz? Belirtmek istemiyorum: Kadın: Erkek:**

| | | |
|---|---|---|
| | | |

2) **Yaşınız? 18-30: 31- 45: 46- 55: 56 ve üstü:**

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | | |

3) **Tahsiliniz?**
**Okuma ve yazmam yok: İlk Okul: Orta Okul: Lise: Üniversite:**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

4) **Hangi dilleri biliyorsunuz?**
**Kürtçe: Türkçe: Farsça: Arapça: İngilizce: Almanca: Başka bir dil:**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | |

**Not: Eğer cevabınız başka bir dil ise lütfen belirtiniz: (..........................)**

5) **Kürtçenin hangi lehçelerini biliyorsunuz?**
**Kurmanci: Kirmanci (zazaki): Sorani: Gorani: Leki: Lori: Hiçbirini bilmiyorum:**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | |

6) **Kurd olup kurtçe yada türkçe yazan veya yazmış olan kaç yazar tanıyorsunuz?**

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| **1-3** | **4-6** | **7-9** | **10-12-** | **13-15** | **16…-** |

7) **Musa Anter (Ape Musa) ismini hiç duydunuz mu?**
**Evet Hayır**

| | |
|---|---|
| | |

**Not: Eğer cevabınız evet ise lütfen 8. Soruya geçiniz.**

**8) Musa Anter'i nasıl tanıdınız ya da nasıl tanıştınız?**

**Sosyal Medyadan: Yazdıklarından : Toplum içindeki konuşmalardan: Arkadaşlık ettik: Başka bir yoldan**

**9) Size göre Musa Anter (Ape Musa) toplumda hangi yönüyle tanınıyor.**

**Siyasetçi: Entelektüel (Aydın): Yazar: Şair: Gazeteci: Hepsi: Hiç biri:**

**10) Bu zamana kadar Musa Anter'in kaç kitabını okudunuz:**

**1 2 3 4 5 6 Daha fazla: Hiç okumadım:**

**11) Size göre Musa Anter nasıl bir düşünce yapısına sahipti?**

**Barışçıl: Hümanist: Vatan sever: Irkçı: Politik: Özgürlükçü: Bilmiyorum:**

**12) En son Musa Anter'in hangi kitabını okudunuz**

**Hatiralarim: Kara Yara (Birîna Reş): Kımıl: Ülke ve Gündem Yazıları: Vakayiname: Çinara Min: Başka kitap:Hiçbiri**

**13) Size göre Musa Anter Kürt edebiyatı açısından nasıl bir yazar dı:?**

**Başarılı : Başarısız:**

**14) Size göre hangi ortamlarda Musa Anter'in ismi öne çıkıyor ?**

**Öğrenci (Okuyan) kişilerin ortamında: Politik ort: Edebiyat ort: Medyada: Bunların harici:**

**15) Size göre Musa Anter'in topluma olumlu bir etkisi olmuşmudur?**

**Evet- Hayır- Bilmiyorum- Cevaplamak istemiyorum**

**"Tabloya anketa Tirkî"**

**Anket bitti teşekkür ederiz.**

## ENCAM

Nivîskar Musa Anter di nêzî 80ê salîya temenê xwe de di jîyana xwe de gelek berhemên giranbuha hiştîye. Tekoşîna xwe ya li hember asîmîlasyona gel û ziman her tim zindî girtîye. Jîyana wî her tim beşek ji êş û derdan derdikeve pêş me. Di jîyana xwe de nêzî yazde sal û nîvan zindan, işkence û sirguntî kişandîye. Di temenekî piçûk de di dema xwendakarîyê de nerînên neyînî yên ku ji ber Kurd bû li wî hatîye kirin û weke biçûkxistinê, heqaret û binçavkirin ji ber ku hatîye serê wî dibe sedema xwenaskirin û parastina netewperwerîya wî. Felsefeya wî her tim li ser mirovahîyê bûye. Ji wî re ya herî girîng mirovahî û jîyaneke wekhevî bû. Li gor fikra wî ti kes ji kesî ne serdestir e, hemû netew bi deng, çand, ziman û jîyana xwe rengekî girîng e.

Musa Anter di jîyana xwe de bi gelemperî her tim li hemberê neheqîyê sekinîye. Tekoşîna wî ya herî mezin li hemberê zilma serdestan bû. Kıvanç Koçak ji di derheqê fikrên Anter ên ku li hember neheqîyê wisa behs kirîye: Musa Anter kesekî daxwazdarîya wekhevîyê dikir. Anter dixwest ku Kurd û Tirk bi biratîye jîyana xwe bi hev re bidomînin. Her çi qas dozên li ser Kurdîtîyên li Anter hatinin vekirin jî Anter, vê yekê girêdayî asîmîlasyona gelê Kurd dike. Lewra berteka Anter, çi Kurd be çi Tirk be daxwaza mafên mirovan dike û dibêje ger ku di şûna Kurdan de Tirk jî di bin zordestîyê de bana dê ji bo Tirkan jî ev tekoşîn pêk bianîta (Koçak, 2023). Musa Anter di temenê xwe yê nivîskarîyê de di nivîsînên xwe de jî dîyar dike ku kesên siyaset di dest wan de bû çi Kurd be û çi Tirk be ger ku gel ji bo kesayeta xwe binpê dike her tim rexneyê wî li wan kesan bû. Her tim li hemberê wan kesên ku li ser bawerîya dîn li gor kesayeta xwe tiştên ne li rê dikirin. Musa Anter ger bi berhemên xwe û ger jî bi fikr û ramanên xwe bandorek mezin li ser gel kirîye. Tekoşîna ku li hember asîmîlasyona ziman danîye di pêşerojê de ji kesan re bûyek mînakek şênber.

Musa Anter di edebîyata Kurdî de bi nivîs û berhemên xwe cihek taybet girtîye. Di encama lokolîna ku me kirîye pirtûka wî ya *Ferhenga Khurdî-Tirkî* di dema Komeleya Tirkîyeyê de yek ji wan berhemên li ser zimanê Kurdî hatîye nivîsîn yekemîn e. Berhema Anter ya *Birîna Reş* di alîyê şano yê de di dema Komeleya Tirkîyeyê de bi zimanê Kurdî hatîye nivîsandin û yekemîn e. Ev berhem li Tirkîyeyê pêşî li ber xebatê bi vî rengî vekirîye.

Berhema Musa Anter ya *Hatıralarım* jî li gor dema xwe berhemek sereke ye lewra li gor ku lêkolîna me kirîye di wê demê de nivîskarên Kurd bi wî rengî kesek biberfirehî behsa bîranînên xwe nekîye. Musa Anter xeynî berhemên wî yên ku me bi dest nexistinin li edebîyata Kurdî heft pirtûk zêde kirîye. Bi saya vê xebatê, berhemên Anter yên ku ne li ber destan e û mîna hatîye çapkirin an jî dê bên çapkirin di lêkolîna me de em rastî wan hatin. Me ew berhem wek berhemên wendayî daxilî xebata xwe kirin û agahîyên ku me kom kirine me parve kirîye.

Roşenbîrê Kurd Musa Anter hew ni bi berhemên xwe di civaka Kurdan de derketîye pêş. Musa Anter ji alîyê çapemenîya Kurdan ve jî xebatên gelek giranbuha kirîye. Anter bi kirîna amûrên çapxaneyê pêşî li ber tengasîyên ku çapkirina kovar û rojnameyên wan bênin weşandin girtîye. Di her tengasîyê de parastina fikrên kirîye û nivîsên xwe ji bo ku bigihîne encamê tekoşîna xwe her tim domandîye. Weke ku me di xebata xwe de bi kûrahî li ser sekinîbû û bi dest xistibû ku mohra Musa Anter li ser gelek kovar û rojnameyan de cih girtîye. Li gor lêkolîna me kirîye û di encamê de kovara bi navê *Mezopotamya* ji alîyê Musa Anter hatîye derxistin û di dema Komeleya Tirkîyeyê de yekemîn kovar e ku bi zimanê Kurdî hatîye nivîsîn. Ev xebat bêtir girîngîya Anter ya li ser ziman û çapemenîya Kurdî derdixe pêş me. Musa Anter 30 sal bûye ku hatîye kuştin lê her sal di roja kuştina wî de çalekîyên çapemenîyê li ser navê wî tênin li darxistin û bê navber hîn jî didome. Girîngîya Musa Anter ya li ser çapemenîya Kurdî ji ked û xebatên wî tên.

Roşenbîrê Kurd Musa Anter him bi xebatên xwe yên li ser ziman û edebîyata Kurdî û him jî keda wî ya li ser çapemenîya kurdî wî di civaka Kurdan de kirîyê kesekî pêşeng. Musa Anter bi paşnavê xwe bêtir, di nav civaka Kurdan de wek Apê Musa bêtir tête naskirin. Ev yek jî ji ber ku civaka Kurd wî bêtir nêzî xwe û yekî ji xwe dîtîye peyva Apo an Apê li navê wî zêde kirîye. Ji bo ku di nav civaka Kurd de Apê Musa bi çi awayî tête nasîn em derxin holê û bandora wî ya li ser civakê bi kîjan alîyan ve çêbûye tesbît bikin me anketek amade kiribû û li gel belav kiribû.

Kesên ku beşdarî anketê bûne 450 kes in. Ji wan 450 kesan zêdeyî nêvîyên wan jin bûn û herî zêde temenên wan di navbera 18-30 salî de bûn. Me pirsên xwe yên anketê bi hûrgulî pejiran da ku em bandora Anter ya li ser civakê çawa çê bûye û Musa Anter ji kîjan alîve di civakê de tête nasîn tesbît bikin.

Di encama anketê de derket holê ku ji alîyê gel ve Musa Anter di nav civakê de wek kesekî bi bandor hatîye dîtin. Musa Anter bi navê xwe, berhemên xwe û eqleb jî bi gotinên xwe di nav civaka Kurd de wek yekî roşenbîr, rûsp, rêzan û hwd. di nav gel de Apê Musa tim bi zindîbûna xwe derket pêş me.

Musa Anter, di temenê xwe yî nêzî 80 salî de di 20 Îlona sala 1992yan de, li gor çavkanîyên ku me bi dest xistîye û cih daye wan li Amedê ji alîyê kesên ku ne dîyar ve hatîye qetilkirin. Di ser qetilkiran wî de 30 sal derbas bûne ku hîn jî kesên ku bûne sedema qetilkirina wî nehatîne bidestxistin.

## ÇAVKANÎ


Akyol, H. (Ed.) (2021). *Apê Musa Musa Anter 100 Yaşında*. Diyarbakır: Aram.

Algül, A. ve A. Aydemir ûyd. (2019). *Türkiye Siyasal Hayatından Portreler*. İstanbul: Türk Tarih Vakfı.

Alış, A. (20 Eylül 2010). "Üç Devrin Tanığı: Modern Kürt Siyasi Tarihinin İçinden Musa Anter'i Okumak." *Birikim*. https://birikimdergisi.com/guncel/882/uc-devrin-tanigi-modern-kurt-siyasi-tarihinin-icinden-musa-anter-i-okumak, (Tarîxa Xwegihandinê: 10 Kanun 2021)

Anter, M. (1962). "Cav Pis." *Dicle-Fırat*. Sayı 1. (APEC Tıpkı Basım1997)., Stockholm.

Anter, M. (1963). "Kürtlerde Din." *Deng*. Sayı 1. (APEC Tıpkı Basım, 1998). Stockholm.

Anter, M. (1967). *Ferhenga Khurdî-Tirkî*. İstanbul: Yeni Matbaa.

Anter, M. (1989). "Genç Olsaydım Dağa Çıkardım." *Toplumsal Kurtuluş*, 23-24, 56-57.

Anter, M. (1990). "Kamplardaki Kürtler." *Halepçe'den Kamplara Kürtler*. İstanbul: İHD.

Anter, M. (20 Eylül 2021). "Îro Salvegera 29an a Şehadeta Apê Musa ye." *Youtube*: https://youtu.be/y7ydu3r0ZcE?si=fpI2peEb6HLrSrVo (Tarîxa Xwegihandinê: 22.10.2023).

Anter, M. (2013a). *Birîna Reş-Kara Yara*. (Baskı: 3). Diyarbakır: Aram.

Anter, M. (2013b). *Çinara Min*. (Çap: 3). Diyarbakır: Aram.

Anter, M. (2013c). *Kimil*. (Baskı: 3). Diyarbakır: Aram.

Anter, M. (2013d). *Ülke ve Gündem Yazıları*. (Baskı: 3). Diyarbakır: Aram.

Anter, M. (2013e). *Vakayiname*. (Baskı: 3). Diyarbakır: Aram.

Anter, M. (2016f). *Hatıralarım*. (Baskı: 4). Diyarbakır: Aram.

Aslan, G. (1989). *Yas Tutan Tarih 33 Kurşun*. İstanbul: Pencere.

Barış, S. (13 Haziran 2022). “Metîn Ewr: Apê Musa dirêjiya fîlmekî 72 sal domiya ye.” *Duvar*. https://www.gazeteduvar.com.tr/metin-ewr-ape-musa-direjiya-filmeki-72-sal-domiya-ye-haber-1568956, (Tarîxa Xwegihandinê: 15.06.2024).

Baykuşak, Ö, R. (2020). *Türkiye’de Hâkim ve Muhalif Politikanın Gerilim Alanlarından Biri Olarak Kürtçe Dil Meselesi*. (Yayımlamamış Doktora Tezi). Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi, SBE.

Baykuşak, T. (2022). "Osmanlı ve Cumhuriyet Dönemi Kürt Aydınları Arasında Bir Köprü: Musa Anter." *Kürt Tarihi ve Siyasetinden Portreler*. Yalçın Çakmak ve Tuncay Şur (ed). (çapa 3.) İstanbul: İletişim Yayınları.

Bedîrxan, C. A. (2010). *Bingehên Giramera Kurdmancî*. İstanbul: Avesta.

Bildirici, H. (2011). “İsmail Beşikçi’yi Anlatmak” *İsmail Beşikçi.* (Derleyenler: Barış Ünlü, Ozan Değer). İstanbul: İletişim.

Bir Cinayet”. (30 Eylül 1992). *Kurdistan Press*. r. 3.

Birand, M.A. (2003). “Bu Güne Kadar Kaç Kürd İsyanı Oldu?” *Hürriyet.* https://www.hurriyet.com.tr/bugune-kadar-kac-kurt-isyani-oldu-7957402. (Tarîxa Xwegihandinê: 20.01.2024).

Çamlibel, Y. (2010). *Dostlarının Gözüyle Musa Anter*. Ankara: Kurgu Kültür Merkezi.

Çetin, V. (13 Ağustos 2020). “Birîna Reş'ten Korona Virüsüne Değişen Bir Şey Yok.” *Duvar*. https://www.gazeteduvar.com.tr/konuk-yazar/2020/08/13/birina-resten-korona-virusune-degisen-bir-sey-yok. (Tarîxa Xwegihandinê: 24.02.2024).

Ceweri, F. (2020). “Musa Anter Karanlığa Gömülmüş Toplumumuzda Bir Işık Huzmesiydi.” *Oggito.* https://oggito.com/icerikler/musa-anter-karanliga-gomulmus-toplumumuzda-bir-isik-huzmesiydi/65414. (Tarîxa Xwegihandinê: 10.10.2024).

Chakar, P. (2020). “İlham Bir Uyanıştır: Qimil’’ *Evrensel*. https://www.evrensel.net/haber/414460/ilham-bir-uyanistir-qimil, (Tarîxa Xwegihandinê: 10.12.2024).

Değirmenci, B. (2020). “Kuro Musaaa!” *Gazetekarınca*. https://gazetekarinca.com/ 2020/09/ kuro-musaaa-bircan-degirmenci/, (Tarîxa Xwegihandinê: 15.12.2024).

Dinçer, V. (2015). “Koskoca Bir Topluluğun Amcası: 16 Maddede Ape Musa”, *Lîstelîst*. https://listelist.com/ape-musa/, (Tarîxa Xwegihandinê: 09.12.2024).

Emre, A. (6 Ekîm 2004). “Asasız Musa gösterimde: Musa Anter'i tüm ülke bilmeli”, *Habersol*.https://haber.sol.org.tr/kultur-sanat/asasiz-musa-gosterimde-musa-anteri-tum-ulke-bilmeli-haberi-98166, (Tarîxa Xwegihandinê: 09.11.2024).

Ersanlı, B. ve N. Uçarlar ûyd. (2012). *Türkiye Siyasetinde Kürtler*. İstanbul: İletişim.

Gün, E. (2011). *Ape Musa Faili Bilindik Meçhul*. İstanbul: Karakutu.

Hekimoğlu, İ. (2000). *Vatan Yahut Susurluk*. İstanbul: Papirüs.

Instîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist. (2010). **“**Li Ser 112 Saliya Rojnamegeriya Kurdî”, *Lêkolîn Kovara Înstîtûta Kurdî*, hejmar 14, Havîn, r: 38.

Kalid, R. (2019). “Musa was a Kurdish dissident writer and activist.” *Dijital sanat*, https://images.app.goo.gl/unQq4d5WxEzG5uZZA, (Tarîxa Xwegihandinê: 23.10.2023).

Kalkan, E. (2006). *Katille Buluşma*. İstanbul: Güncel.

Kamer, H. (2022). *Reşê: Kızının Gözünden Musa Anter*. İstanbul: İletişim.

Kaya, Y. (1993). *Koca Çınar Kürt Bilgesi Musa Anter*: Ankara: Yurt Kitap-Yay.

Kemal, Y. (1994). *Zulmün Artsın*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Kılıç, A. (2012). “Türkiye’de Kürt Milliyetçiliğinin Dört Dönemi ve Musa Anter.” *Berfin Bahar*. Sayı 175, Yıl 18, 9.

Koçak, K.; Bora, T. (2023). *Cumhuriyet Tarihinden 100 Portre*. İstanbul: İletişim.

Kürkçüler Tevkif Edildi.” (*Toprak*, 1963: 4). Temmuz 1963 sayı: 19, s: 4.

Malmîsanij (1997). *Dicle-Fırat.* (Birinci Tıpkıbasım). Stockholm: Apec.

Malmîsanij,; Lewendî, M. (1992). *Li Kurdistana bakur û li Tirkiyê Rojnamegerîya Kurdî*. Ankara: Öz-Ge.

Mcdowall, M. (2009). *Modern Kürt Tarihi.* (Çev. Neşenur Domaniç). Ankara: Doruk.

Miroğlu, O. (2012). *Kuşatmadan İnfaza Musa Anter Cinayeti*. İstanbul: Everest.

Mısırlıoğlu, K. (2014). “Musa Anter'in öldürülmesi ve faili meçhul cineyetler.” *Youtube,* https://www.youtube.com/watch?v=j0_aQ55y1y4, (Tarîxa Xwegihandinê: 03.01.2022).

Nergiz, B. (2019). *Devletin Kürt Politikası ve Kürt Hareketi (1945-1960).* (Yayımlanmamış Doktora Tezi). İstanbul Üniversitesi, SBE.

Savaş, K. (1998). *Kutlu Savaş’ın Hazırladığı Susurluk Raporu.* İstanbul: Radikal.

Şener, N. V. (2019). *27 Mayıs 1960 Askeri Darbesi Sonrasında Türkye’de İzlenen Kürt Politikası (1958- 1971).* (Yayımlanmamış Yuksek Lisans Tezi). Dokuz Eylül Üniversitesi, SBE.

Şenol, N, H. (2008). *Apê Musa’nın Küçük Generalleri*. İstanbul: Aram.

Sezer, A. (2012). *“Bir Aktivist Olarak Aydın ve Toplumsal Hareketlerdeki Rolü.”* (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Dokuz Eylül Üniversitesi, SBE.

Tek, A. (2018). “Vegerîna Malzarokê yan jî “Gaia”ya Ramanê: Zimanê Zikmakî.” *Nûbihar Akademî*, hejmar 10, Sal 5, r: 59-70.

Temel, C. (2020). *1984’ten Önceki 25 Yılda Türkiye’de Kürdlerin Silahsız Mücadelesi*: İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı.

Tüleylioğlu, O. (2010). *Neden Öldürüldüler? Dipsiz Kuyu*. Ankara: Um-ag.

Turan, Ö. (2020). *Türkiye’de Kürtçü Sol 1968-1984*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). İstanbul Üniversitesi, SBE.

Türkiye Yayıncılar Birliği. (2014). *Türkiye’de Yayınlama Özgürlüğü Mücadelesinin 20 Yılı Düşünce ve İfade Özgürlüğü Ödülleri ve Yayınlama Özgürlüğü Raporları 1994-2014*. İstanbul: Umut Matbaası

Uzun, M. (2007). *Kürt Edebiyatı Antolojisi*. İstanbul: İthaki.

Yavaşça, K. (2013). *Kürt Milliyetçiliği Tartışmaları Çerçevesinde Musa Anter*. (Yayımlanmamış Yuksek Lisans Tezi). Hacettepe Üniversitesi, SBE.

Yorozlu, R. (Ev Hanımı). 19 Adar 2022, “*Jîyana Musa Anter û Berhemên wî*” mijara hevpeyvînê, Tora Civakî – Whatsapp.

Zêdo, Ç. ve Y. Akkuzu (2016). *Kürt Tiyatro Tarihi*. İstanbul: Evrensel Yayınları.